

# DÎWAN

## GULZAR A XEMLANDÎ

### Bi Sirûdêñ Bê Deng

Hesenkêf




Qamişlo



Hewlîr



Mahabat



Mele Mistefayê Hilêliyê

# DÎWAN GULZAR A XEMLANDÎ

Bi Sirûdêñ Bê Deng

Mele Mistefayê Hilêliyê

**Nivîskar  
Mele Mistefayê Hilêliyê**

**Amedekar  
Mele Seîd (Seydayê Xelatî)**

**Çap  
Ektra Matbaacılık Ambalaj  
Davutpaşa Cad. Güven İş Merkezi  
B Blok No: 323 Topkapı - Zeytinburnu / İstanbul  
Tel: 0212 567 51 63 Faks : 0212 567 51 64**

**ISBN : 978-605-89217-3-3**

## **Spasi**

Hemî xercî û pereyê li çapkirina vê dîwanê û dîwanê Seydayê  
Xelatî ya bi navê CÎVAT çuye nujdarê Hêja Doktor Şirîn  
Aslankılıç daye ji ber vî karê wiye piroz ez jê spas dikim.

## NAVEROK

Danêr Rûpel  
Dîiyarî  
Pêşgotina Dîwana Hişyar  
Bersîva Bo Seydayê Mele Ebdula Mele Reşîd  
Li Ser Jîyana M. M. E. Hişyar  
Bi Navê Xweda  
Qencî û Dana Xwedê  
Vegeera ji Guneha  
Qesîde Di Pesnê Pêxember Ya Seydayê Batî  
Pesnê Pêxember  
Bi Hebûna Xwendinê Û Xwendin Serketinê  
Dana Evîn Û Eşqê  
Pesnê Mele Mistefa Berzanî  
Qehremanîya Bav û Law  
Mîr Bedirxan  
Axaftin Bi Pênûsre  
Karê Dujmin  
Jîna Bindestî  
Pesindara Dîlber  
Êşa Welat  
Qedera Xweda  
Dengê Kurdan  
Gerdûna Dijwar  
Kurdistan û Sedam û Emerîka  
Mexapin Bi Hêza Dujmin  
Welatê Min  
Kurdistan Nexweş e  
Nalîna Kurdistan  
Stema Li Kurdên Cizîrê  
Ey Felek  
Xapên Gerdûnê

Mêzebikin Li Pîlanê Stemkara  
Bibîranîna Dîroka Kurda  
Felek Biderdê  
Xwortê Çeleng  
Mizgînî  
Xameî  
Mirina Bi Azadî  
Ala Kurdistan  
Gazina Bo Welat  
Şêrîna Dil  
Mêranîya Kurda  
Serhatina Kurdistan  
Xezala Min  
Dilzarim  
Hişyarîya Milet  
Gazina Ji Bextê Reş  
Nêçî Li ser Felekê  
Tevgera Neyaran  
Can Firot  
Daxwaza Ji Mêcir Ingilîzî  
Gulxermanê Gulistan  
Denbêjê Cîhan  
Cejna Newroze  
Rêzan KU Qijik Bê  
Daxwaa Ji Koma Yekîtiya Miletan  
Pend li Mezina  
Îşa Penceşêr  
Gera Serbaz Dilşikêre  
Şiyarbûna Dil  
Milet Rabin  
Yara Berzî ye  
Yara Kubar  
Dîlbera Reng Bextrê  
Şerbata Lelû Gotina

Êwerga min Tu Nêne  
Şêst Sal Li Min Buhurt  
Yara Di Bircê de  
Dira Meyxaneê  
Ez û Yarê Bûn Temaşa  
Serê Tipa Hebîba Min  
Hebîba Nazenîn  
Xezala Delal  
Axaftin Bi Dîlberê re Di xwu de  
Ayina Bilbil Bi Gul re  
Dîlbera Çehvres  
Qîza Keleş  
Yara Seyrangeh  
Dîlbera Cegerpola  
Dîlbera Şox û Şepal  
Dîlbera Wek Fenere  
Sala Nexweşîya min  
Dîlbera Baxê Hêşîn  
Hebîba Dil  
Evîdarê Te Me  
Kurdistana Jibir  
Ez û Kurdistanê Çûne Rex Canê Qencan  
Kurdistan  
Qêrîn  
Şox û Şemala Dîlber  
Kurdo Zû Rabe  
Qesta Dîlber  
Dîlberê Mestim  
Tarîxa Biharê  
Aşıq û Maşûq  
Aşıqê Gulê  
Şehlunda Şêrîn  
Kurdistana Şêrîn  
Baxê Gulan

Hişyar Bixem  
Dujminê Welat  
Derdê Bilbil  
Welat Bûka Cîhan  
Dilbera Bûka Cîhan  
Bijîk Abidîn  
Hevalê Rêka Dûr  
Serhildana Gel  
Dildara Horî  
Jinika Bi Rûmet  
Jinanîn  
Kesê Bê Dewlet  
Kê Me Daye Paş  
Terîqa Neqşîbendî  
Pesnê Şêx Ehmedê Xiznewî  
Pesnê Şêx Îbrehîm Heqî  
Qesîda Şêx Mihemed Şefiq Heqî  
Diaê  
Melheq Bi Zimanê Erebî Ew Hindek Kurdi  
...  
Dilovanîya Xweda  
...  
Pesnê Seîdê Nûrsî û Seydayê Botî  
Pesnê Seîdan  
Dîroka Jîyana Bedîul Zeman  
...  
Pendê Mezinan  
Nêçî Bav Li ser Law  
..  
Hêvîdarîya Ji Yezdan

## DIYARI<sup>î</sup>

Bo Serok Mesûd Barzanî  
Û bo Seydayê Mela Ebdullahê Xerzî  
Û bo hemû mamostayê ol û mirovayî  
Û bo miletê Kurd tevayî û bo şehîdên

Kurdistanê û bo ci kesê  
Qencîya milet dixwaze û bo kesê  
Riya rast digirin û rê didin  
Ber milet û bi doza yekîtiya millet ba dikin  
Binavê Yezdanê dilovan û mihiban

## Gulzara Xemilandî û Mele Mistefa yê Hilîliyê

Xwendevanên hêja, dema dîwana Seyadayê Mele Mistefa ya binavê Gulzara Xemilandî spartine min kû ez pêşgotina wê binivsînim û nêrîn û dîtina xwe li ser diyar bikim. Ez dilgeş û pir kêfxweş bûm. Lê min zanî kû ew barekî pir girane kete ser milê min. Ez pir kêfxweşbûm lewra dîwanek ji helbestên zanyarek mina Seydayê Mele Mistefa kû şayeste bibînin ji bo ez pêşgotina wê binivsînim. Ji bo min cihê rûmet û şanaziyê ye lê gelo ez bikaribim vî barê giran hilgirim û ew durr û gewherên diwê deryayêda veşartî derînim û raxime pêş çavêñ xwendevanan. Min hêvîya xwe ji Xwedayê xwe qut nekir û dest avête xwendina dîwanê. Dema min ger û geşta xwe di dîwana Seyda da qedand min baş zanî kû bi rastî deryaye û ji çanda Kurd tijî durr û gewherên lê di kûratiya wêda veşartîne. Gelo bi yek ger û geştekî ezê bikaribim xwe berdima nav gerînekên kûr û wan gewherên bihagiran jê derînim. Xwendevanên hêja dîwana Seydayê Mele Mistefa bi xwe gulzareke xemmlandiye cewa kû navê wê jî gulzare. Angû nav û navdayî wek hevin lewra çewa navê wê Gulzara Xemmlandiye ew bi xwe jî gulzareke xemlandîye. Hemî rengin sorgul û kûlîlkan têda hene. Deme merif li helbestên Seyda di nihêre hostayeke pir mezin di hûnandina helbestan da dibîne. Wê çaxê merif dizane kû Seyda; di zanîn, raman û di nivîsandina helbestanda pisporekî dema xwe buye û ji bo axa Kurdiatanê evîndarekî pir mezin û di hemî jiyanâ xweda bi êş û derdê welat ve jiyanâ xwe borandîye. Tim û tim bi derdê gelê Kurd êşîyaye û biwî derdi tim qîr û hewar kiriye û divê rêda kar û xebateke bê hempa kiriye û bi pênûsa xwe ya pîroz ewî karê xweyê pîroz û pir bi rûmet ji netewê Kurdara hiştîye. Dîwana Seydayê Mele Mistefa berhemeke

evîndarîyêye. Çewa Seyda evîndarê welite her wisa evîndarê Seydayê nemir Mele Mistefa Berzanî buye û bi evîna wî û evîna welat da ji kûraya dilê xwe helbest nivîsandîye û hemî dem û gavê di kesera welat da jîyana xwe borandîye. Lê her çenda jîyana wî bi kul û keser borî be jî bes rûmetek pîroz li pey xwe hiştîye. Dema merif dîwana wî dixwîne ew rûmeta pir xweşik diyar dibe.

Ji ber kar û xebat wî dê Seydayê Mele Mistefa her tim bi rûmet bê bîranîn û ewê di nava gelê Kurd da nemir bimîne. Dilovanîya Yezdan li ser wî be wek tavîyê baranên baharan. Fermo hûn û Dîwana Seyda ya binavê Gulzara Xemilandî bi sirûdê bê deng. 28.03.2012

Seydayê Xelatî

## PÊSGOTINA DÎWANA HİŞYAR

Gotina Mamostayê mezin Mele Ebdulah Mele Reşîd

Bi navê Xwedayê dilovan û dilovîn

Birayê hêja û jîrek kar kirî  
Di rêka gelê Kurd wî can tê kirî  
Jiyanek dirêj wî bi qurban kirî  
Bi soz û bi peyman şev û roj birî

Bi mal û bi can wî xweşî tê firî  
Di heftê û pênc sal girî ser girî  
Welatê şêran kete bin dest virî  
Ku parsek û komir û tazî serî

Tu xwîna şehîdan ji bîr neke têr  
Bi kûrî bi dûrî tu dil tûj binêr  
Mele Mustefa jî ji êşa dilî  
Ji bo derd û derman hewar ser kirî

Ji bo vî birayî sipas pir dikim  
Di nêv kar û barê welat nas dikim  
Ku jana gelê min li dil kom kirî  
Û çav û dilê min bi dîwan birî

Ku derman ji bo derdê min kom kirî  
Û Loqman bijîjke ji bo vî derî  
Ji Barzanî zanîn me pir kom kirî  
Bi zanîn xwe bigirin neyar ma terî

Ewe babê kurda Şêxêm Seîd  
Bi Qazî dilê min Selîm Sedîd  
Kesê şaş û kaş be şiyar bin bira  
Ku zana bibe piştea wek çira

Heçî Kurd birane nezanîn hilîn  
Bi rastî durustî birane bibîn  
Çiqa gotîna wî dijê ya te ye  
Ji bab û ji dê ye li pişa te ye

Evan dijminan me ji hev dûr kirin  
Ezî û ezî nêvde tovê kirin  
Bi talî bi tîrşîne peyve bira  
Dilê kes birîndar meke tû çira

Livîn dil birîne hişê kor kirî  
Dil û can bi qurban kirî û birî  
Birîna zimana tu derman nedî  
Ji kîmya Sedamî xirabtir medî

Livîno bi lîv û livînê bi hêl  
Hinek şîreta tu bike pêl bi pêl  
Gelê Kurd xwe winda nekin kar bikin  
Bi dîn û bi îman serefaz bikin

Ji bo we dû pêlin subayî bikin  
Bi dîn û bi exlaq lebatê bikin  
Bi kurdayetî şev û roj kar bikin  
Û karker û rêber xwe nas bikin

Nedin pey kesî dîn û îman firot  
Çikû gel ji wî dûre nabe pirot  
Tu Barzanî ho jî bi rastî bibîn  
Seîd û Seîd û Qazî jî bibîn

Mela û mela û mela dore bîn  
Nede pey simê sim ku pesna dibêj  
Ji xalo tu bawer meke ew nepêj  
Ku Incîl dibêje ji hev hez bikin

Û Quran dibêje sîtem ra bikin  
Ji hev hes bikin û neyar dûr bikin  
Eve ked Xuda wer dibêj pê bikin  
Pesin û xweşî bo kesê kar kirî  
Mele Mustefa nav bilind ev serî

## **Miletê Kurd 1 ewladên xwe: Mele Mistefayê Hilêliyê WINDA KIR.**

Mele Mistefayê Mele îsa, bi navê din yê navdar Mele Mistefayê Hilêliyê, li Başûrê-Rojavayê Kurdistanê kurdperwerekî navdar bû. Dema ku ji navê wîbihata qal kirin, her kesekî ew nas dikir. Ew di heman dem de li Bakûrê Kurdisatanê û li Başûrê Kurdistanê jî, kesekî navdar bû.

Mele Mistefayê Hilêliyê di cîwantiya xwe beşdarî tevgera kurd dibe. Ew di zaroktî û telebetiya xwe de Qadrî û Ekrem Cemîl Paşa û mezinên din yên kurd nas dike. Ew di destpêkê de di nav Xoybûnê de cîh digre û xizmetî doza miletê kurd dike.

Piştî salên 1960î dema ku li Başûrê Kurdistanê Şoreşa îlonê dest pê dike, bi şoreşê re dikeve nav pêwendiyân.

Dema ku li Başûrê Kurdistanê Şoreşa îlonê dest pê kiribû, Partiya Demokrat a Kurdistana Suriyeyê hatibû ava kirin, Ew jî hevalbendê partiyê bû. Wî bi riya şexsî û bi riya partiyê ji Şoreşa îlonê re bi her awayî piştgirî û alîkarî dike.

Dema ku pêwendiyên wî ya Şoreşa îlonê pêş dikeve, ew, Serok Mele Mistefa Barzanî ji nêzik de nas dikle. Ew dibe xwendevan, heval û dostê Serok Barzanî.

Wî, di jiyanâ xwe de xeta Mele Mistafe Barzanî bê niqaşê pejirand û meşand.

Dema ku di sala 1975-an de Otonomiya Kurdistanê encama êrişa dewleta kolonyalist ya baasi û Iraqê hat hilweşandin, bi dehan pêşmergê raste rast li mala xwe dike mêvan. Ji bona tevayî pêşmergeyên hatibûn Başûrê-Rojavayê Kurdistanê bi cî û war bibin, hewildanek xurt nîşan dide.

Di sala 1980-yî de li Bakurê Kurdistanê dema darbeya leşkerî çêbû û diktatoriya leşkerî wek pergelek ava bû, gelek welatparêzên Bakûrê Kurdistanê derbasî Başûrê-Rojavayê Kurdistanê bûn. Gelek welatparêz di wan demê zehmet de bûn mêvanê Mele Mistefayê Hilîliyê û malbata wî.

Kûrê wî Sileyman di van xebatan de alîkarê wî yê sereke bû. Lê tevayî malbatê wî bi hev re fedekarî nîşan didan.

Sileyman li Stenbolê Zanîngeha Teknikê xelas kiribû û kesekî geklek jêhatî bû. Gelê kurd ew di gelek gencitî de wenda kir.

Mele Mistefayê Hilîliyê, ji binemaleke kurdperwer tê ye. Ew di medresê de perwerde bibû. Bavê wî meleyekî navdar bû û ew xebatkarê Tevgera 1925-an bû. Ew bi xwe jî kesekî gelek zanyar bû. Wî wek dibistana kurdperwerî kar dikir. Gelek kes bi perwerdayî ya wî bûne têkoşer û xebatkarên Doza Kurd û Kurdisatanê.

“Mele Mustefa’ yê Mele Îsa di sala 1923 an de li Heskîfê ji dayikbûye. Lawê Mele Îsa ye. Bavê wî Mele Îsa hevalbend û têkildarê Şêx Seîd bû. Ji ber vê jî piştî şoreşa Şêx Seîd mehkûm bû.

“Ji ber vê jî wek malbat ew ji Heskîfê bardikin diçin gundê Solanê cem Şêx Fethullahê Hemdî. Şêx Hemdulah alîkarîya Mele Îsa dike wî vedîşêre nifûsek sexte Ji bajarê Qubînê bi navê Mehmd Îsa jê re dide çekirin. Her weha Şêx jibona wî ji ber çavan dûrbixe, wî dişîne gundê Cinesker. Mele Îsa bû Meleyê gund û li gundê Cinesker heta wefata xwe feqîyan dida xwendin.

“Hêja Mele Mustefa çardeh (14) salî bû, bavê wî Mele Îsa çû rehmetê û tevê sê bira û xwişka xwe sêwî man. Ew tevî dêya xwe bardikin diçin gundê Depa Berava li ber Bismilê.

“Mele Mustefa xwendina xwe weha dîyardike:

“Min li rex bavê xwe heta kitêba Seedulah Gewre Pîre û kitêba Îane El Talibîn xwendin. Û di saxîya bavê xwe de li rex Seydayê Mele Ebdulrezaq Dînbîlî, li gundê Girbawî, li wê derê jî min kitêba Helî tevde li rex wî xwendîye. Ji Depa Beravan ez çûme gundê Kifirza jorîn li rex Seydayê Mele Îsmeîl Bikindî xwend, dûra ez çûme gundê Şorşib dinav Éla Sorgiçî li rex Seydayê minî Şêx Ehmedê Korî xwend. Dûre ez çûme Bilkê nav Éla Bamirdî li rex Seydayê Mele Elî Başrûtî xwend. Ji wê derê çûme Cizîra Botan li rex Seyid Elî Findikî meh û nîv xwend. Dûvre mala me ji Depa Beravan hate Hesenkêfê. Ji wê derê di sala 1940 zayinî bi malîtî hatin gundê Girhesen ku li rex Nisêbînê ye. Li wî gundî du mehan em man. Ji wê derê ez çûm Xîznê li rex Seydayê Mele Ehmed Zivingî Miftîyê Qamişlî, ku ewê kitêba Eqid El Cewherî, şerha Dîwana Cizîrî ci kirîye? Min li cem wî xwend.”

“Ew piştre li gundê Hilêlîyê cîwardibin. Heta wefata xwe li wir dimîne.

Li Şamê 1947 an de Dr Nafiz, Qedrî beg Cemîl Paşa naskirîye û ketîye nav Komeleya Xoybûn.

“Şêx Ehmedê Xiznewî, Mele Mustefa û hevalê wî Mele Ehmed jibona xwendina Miftîbûnîyê bixwînin şandine Şamê. Di dema vê şandinê de, Dr Nafiz jî pêre nameyek jibona lêxwedîderketinê ji Cemîl Qedrî Beg re şandîye. Qedrî beg nameyek daye Mele Mustefa û wî bi rêya Beyrûdê şandîye Bexdayê.

“Ew nameyê dibe Bexdayê û ji wê derê bersîva nameyê tîne. Li vegerê dibîne ew name ya Serok Berzaniye.

“Di sala 1965 an de di nava PDK-S pirsgirêk derdikeve û partî dibe du beş. Kesên ku li dijî perçebûna partîyê ne Komîteya Lihevhatinê çêdikin. Mele mustefa endamefiya xwe dide rawestandin û bi rêberî û pêşnîyara Qedrî Beg dikeve nav Komîteya Lihevanînê. Serokê Komîteyê Qedrî Beg bû. Mele Mustefa, di wê demê de bûye peywendîdarê navbera Qamişlîyê û Şamê jî. Piştre Mele Mustefa bûye têkildarê navbera vê Komîteyê.

“1967 an de Mele Mustefa, tevî li dor sed (100) kesî ji alîyê rejîma Sûriyê ve hatin girtin. Hukumeta Sûriyê wan bi cezayê giran gunehbar dike. Lê di sala 1968 an de, Hafiz Esed derbeyek leşkerî çêdike û tê ser hukum. Piştî vê derbeyê tevayîya girtîyên li Sûriyê têن efükirin û berdan. Kurd bi vê efükirinê ji kuştinê rizgar dibin û têن berdan.

“Piştî vê Mele Mustefa bû peywendîdarê navbera PDK yên hersê perçeyan, yanî têkildarê navbera PDK’yên Tirkîyê Iraqê û Sûriyê bi rêexistinkirina alîkarîkirina Şoreşa Barzanî.

“Di sala 1970 yî de dibin çavdêriya Berzanî de bi beşdarbûna herdû alîyên partîyê ve Kongreya PDKS dicive. Mele Mustefa jî beşdarî vê Kongreyê dibe. Ji ber ku di vê Kongreyê de herdû alî lihevhatin, vatinîya Komîteya Lihevkirinê teva bû û vê Komîteyê xwe belavkir.

“Mele Mustefa, her peywendîdar û hevalbendê Serok Barzanî ma...

“Her weha Mele Mustefa, yek ji wan kesan bû ku di pirsgirêkên civatî û malbaî yên herêma Cezîrê de, desteya çareserîya pirsgirêkan bû. Rûmetek wî ya bilind di nav civata herêmê de hebû. Gelek pirsgirêkên êlî, civatî, dînî li ber destêن wî çareserdibûn. Ne tenê pirsgirêkê civata Kurd her weha yên Ereban û xaçperestan jî jibona çareserîyê dihatin cem wî...

“Mele Mustefa tevî ku ewçend xwendina dînî kiribû jî qet meletî nekir. Lê gelek caran pirsên dînî dihatin cem wî û wî biryarên olî didan...” (Malpera Netewe)

## **HIŞYAR**

**Mele Mustefa Mele Îsa Hesenkêfi**

Ey ayina min dê bimrim tuyê bimînî  
Pişt min re nizanim di cîhan da çi dîbit  
Rûpel tu sipîke da ku tarîx te helînî  
Rehme li te kî nav li ba qencan de bişeyinî.

## **GOTINA HIŞYAR JIBO BERSIVA SEYDAYÊ MEZIN MELE EBDULA XERZÎ**

Seydayê di ilmê û zatê mezin  
Miletperwerê Kurdistana min  
Di ilm û zanîn mamostayê min  
Dilê rohn û paqij bo miletê min

Kurdistana pak ji bo wî û min  
Metala Seyda ya dûr û kin  
Di xewna şevan tê ber çavê min  
Seydayê dilevîn dilsoje bo min

Pêşgotina wî ser dîwana min  
Deng û behs didî ew pirîtî bo min  
Negiham wî pesnî ku daye bo min  
Nivisiye ser xêz û rêtê min

Mele Ebdula mamostayê min  
Di ilm û zanîn de qîblegahê min  
Dilsoje ew herdem ji boa axa min  
Axa Kurdistanî di destê dijmin

Pêşveçûna Seyda sed û bîst û hin  
Merdin qenc û pak pesnê wî didin  
Em kurdin bin destê ajanî mezin  
Maf û debir û mal tevde talan kirin

Seyda gazî kir go heware li min  
Namûse rabin hemî gelê min  
Namûs nîşane bo miletê min

Bo Kurdên gernas û lawêna axa min  
Hişyar û hewar ke wekî pîrejin  
Sipasî bide bo Seydayê min  
20.09.2002

## **LI SER JÎYANA M.M.Î. HIŞYAR MELE MUSTEFA**

Bi navê Xudayê dilovan û mihreban hezar dilovanî û paristinewwyî û nav hildan bi xweşî û serbilindayî li ser çêtirîn keasan be ku Pêxemberê Xudaye Muhemedê nûranîye ew li ser malbata wî û hevalên wî bin, ew hevalên wî ku bi dil û can û bi rastî pêre dimeşîyan û tada wan li ser malabata wî nekirine li piştî wefata wî.

Navê min Mele Mustefa ye, leqaba min Hişyar e, lawê Mele Îsa, lawê Hecî, lawê Îsa, lawê Îsmeîl, lawê Mehmûd, lawê Xelîl, lawê Mehmûd, lawê Şêx Muhtac Mihemed Eyûbî. Navê dayika min; Mehdiye qîza Mele Remezan lawê Xelîl, lawê Îsa, lawê Îsmeîl, lawê Mehmûd, lawê Xelîl, lawê Mehmûd, lawê Şêx Muhtac Eyûbî. Ez Hişyaram jîna min ji dayika min çêbûyî di sala 1923 zayînî li (Hesenkêfê) bajarek gelek kevnare ye, paytextê Melekên Eyûbîyan bûye, dewleta wan 334 salan dewam kirî ye. Melek Xelîl Eyûbî bircek gelek mezin çêkirîye li serê kelehê li qozîya bareş û bakur, tewla hespan li bin bircê çêkirîye bi qederê 500 hesp têde cî dibûn. Her hespek alifê wî û cirnek ji bo avê li teniştê alif de çêkiribû. Melek Xelîlê Eyûbî gelek hukmê wî li pêş kutibû heft iqlimî Kurdistanî hebûn di bin hukmê wî de bûn.

Melek Muhemed El Xazî El Eyûbî bajarek nû çêkir, li erda bin her du kelehan, keleha mezin û keleha piçûk du minare çêkir li dunyayê tevde wek wana çênebuye di tertîb û xweşikahîya wan da. Minarekî di çamîya li ser kevîya çemê Dîcle de hatîye lêkirin. Ew camî gelek mezin bû. Ehlê bajêr roja ïnê tevde li wê camîyê xutbe dikirin. Minara li wê camîyê du rê têde hene. Di rîyek de diçûn azan didan û di

rêya din de dihatin xwarê. Minara duduyan; camî di wê de hebû, lê belê ne wek camîya li ser çem de mezin bû. Minara duduwan têde ava kiribûn. Lê dûre camî piştî berdana erdê ji bo hewşê bi qeder bîst mîtroyan li hawêrdora camîyê hîştibû. Dûvre li hawêrdora wê de bîstanek mezin çêkiribû 334 ode, her odayek heywanek pêre çêkiribûn, têde feqeyan hîn dikirin. Ji wê dibistanê gelek xwendevanên mezin diplom jî standin; weke Mewlana Camî, weke Elî Herîrî, weke Mele Ehmedê Cizîrî, weke Şêx Ehmedê Xanî ne. Dewra Fexredîn Razî û Şîrazî jî di wê dibistanê de xwendin e, lê belê muheqeq Feqîyê Teyran têde xwendin kirîye. Xeyrê vana jî têde xwendin kirine em wana nas nakin.

Di serê jîna xwe de ez gelek li cîhan gerîya me ji bo xwendinê. Di çaxê piçûkanîya xwe de bi malîtî tevî bav û dayika xwe û xwişk û birayê xwe cîyê me Hesenkêf bû. Dûv re em çûne Solanî rex Şêx Fethullah El Hemdî. Bavê min mehkûm bû ji bo hevaltiya wî bi Şêx Seîdê Pîranî rehmetî re hebû. Şêx Fethullah gelek alîkarî pêre kir. Nifûsek jêre çêkir, li bajarê Qibînê, bi navê Mehmûd ji dilê Îsa. Dûvre şand gundê Cinesker, bê guman bû ji ber çavê tirkan. Bo îmamê wî gundî dîsa feqeyan didan xwendin heta wefat kir di sala 1935 zayinî li Cinesker. Hingê jîna min 14 sal bû, birayê min Seîd 12 salî bû, birayê min Hesen 8 salî bû, xwişka min jîna wê 7 salî bû, dayika min li ser me mabû. Ez û dayik û bira û xwişka xwe bi hevra em çûne Depa Beravan.

Min li rex bavê xwe xwendin kir heta kitêba Seedulah Gewre Pîre, kitêba Îane El Talibîn min dixwend. Ji Depa Beravan ez çûme gundê Kifirza jorîn li rex Seydayê Mele Îsmeîl Bikindî xwendin dikir , dûra ez çûme gundê Şorşîb dinav Eşîra (êla)

Sorkîcî li rex Seydayê minî Şêx Ehmedê Korî xwendin dikir. Dûre ez çûme Bilkê nav Eşîreta (Êla) Bamirdî li rex Seydayê Mele Elî Başrûti xwendin dikir. Ji wê derê çûme Cizîra Botan li rex Seyid Elî Findikî meh û nîv xwendin kir. Dûvre mala me ji Depa Beravan hate Hesenkêfê. Ji wê derê di sala 1940 zayinî bi malîti hatin gundê Girhesen li rex Nisêbînê ye. Li wî gundi du mehan em man. Ji wê derê ez çûm Xizne li rex Seydayê Mele Ehmed Zivingî Miftîyê Qamişlî, ewê kitêba Eqid El Cewherî, şerha Dîwana Cizîri çi kirîye? Min xwendin dikir.

Û di saxîya bavê min li rex Seydayê Mele Ebdulrezaq Dînbilî, li gundê Girbawî, li wê derê jî min xwendin kirîye kitêba Helî tevde li rex wî xwendîye. Lê bilî piştî Seydayê min Miftî Mele Ehmed hate Qamişlî, hingê mala me çûbû Hilêlîyê, li rex Seydayê Miftî Îcaza Îlmî Rizî send. Me got du salan bi malîti li gundê Enteriyê em man. Li wê derê ez bûm Katib li rex Ingilîzan, qederê sê mehan. Min mal hanî Hilêlîyê û min di karê xwe de li rex Ingilîzan salek û şes mehan ez mam. Di sala 1942 wan de min dev ji kar berda, ji ber yê ku kar da min navê wî Cewdet Beg bû mislman bû, eslê wî ji Azerbeycan bû ji cenga 1883 va bavê wî yexsîr (dîl ketibû) bûbû li rex Ingilîzan. Ew ketibû dibistana Ingilîzan bû zabit, wîna li gora karê Ingilîzan wî şiyandin Yemenê, min jî dev ji kar berda. Lê belê Cewdet Beg min bir li rex Generalê Ingilîz perenê baş dan min ji xeyrê heqê mehê min. Hingê min jî dest bi karê çandinî kir. Li dawîkî di sala 1975 de Seydayê Mele Ebdulla Mele Reşîdê Xerzî ji gundê Gozgiranî li ser ava Dîcle dimêni. Ew gund ji nehîya zimara Iraqîye bi malîti hate Hilêlîyê.

Naskirina min û wî ji sala 1943 zayinî de hebû. Rojekî hat Enterîyê bi rehmetiyê bavê xwe re. Mele Reşîd wî bir rex Diktor Nafiz ji bo nexweşîyê. Me hevûdû nas kir û hevaltiya wî û dostanîya rast me pevre kir. Lê mixabin xizmetek li kurê cenabê wî jêre nekir, ji ber Seyda Alimkî mezine di rêka Ilmanî mezindîye di temamê Îlmê Rizî û Şerîet û Hedîs û Tefsîr û Eqîde İslâmî û di felsefi û di mentiq da û di helbestan da.

Ji xeyrî vî îlmî merivkî mitqî û miletperwer bû herdem ew dijê zilim û tadaîye li ser misilmana temamî lê bilî bi zêdebûn disekinî li ser tada û sitem li ser miletê Kurd tê kirin, li her deran her wekî tada û sitem li serê wî û malbata wî jî hate kirin. Ji welatê xwu derket wekî me hate Sûrî di sala hezar û nehsed û cilî (1940) zayinî li kurî van ewsaf mezin ji qncîyê pêre heye milet jê hez dikin, lê ne kûrê îlmû qencîya wî temel jêre didin heta îro em li rex hevin, ji xweşî û heskirina hev em têr nebûn...

## **DESTPÊKA DÎWANA HIŞYAR ÇAP KIRINA BENDÎ DILOVÎN**

### **BINAVÊ XWUDA**

Bi navê te xwudayê jor Xwudayê asmanê jor  
Piştewa Dojho Mador Digel Siderto erşê jore  
Ji kaf û nûn wan çêkir Qelem nivisî çuye jor  
Di xizne qedre qadir Dimînî dar û him madûr

### **QENCÎ Ü DANA XWUDA**

Razî me ji te Rebî Bi wê dana îhsana te  
Daye me te ya Rebî Ji wî îlim û îmana te

Zanîn û yeqîn Rebî ji behra îlim û dana te  
Îlim û merîfet Rebî ji wê nûr û rohnaya te

Avadanke ya Rebî bi çûne ji dana te  
Bi wê dana bilind bo me herdem ew ji fedla te

Bibî mal û dirav bi merem Razî me bi pişka te  
Mal û dirav namînin Lê îlim û zanîna te

Gava tu bidî însan herdem maye dana te  
Hişyar ew çiqas bêjî ew nagêhînî dana te

## **FIKRA JI GUNHA**

Aya însan tu cahilî Ji Rebê xwu tu xafilî  
Ji gunhan tobe bike Ji bona wî tu qabilî  
Qelbê te erşî ekber Xwuda lê dikî nezre  
Paqij bike ji xetere Niqte li ïn wî jî hilî

Îblîs kursî lê danî ye Ji gunehan reş kirî ye  
Hirs û hesed lê çandî ye Dinav perda wî dilî  
Carek bişo wî perdeyî Kursî bişkîn bi xameî  
Tisbîh û zikrin xameî Şuxlê li eyn wî jî hilî

Hişyar nesîhetan dikî Lê nefsa xwe ji bîr dikî  
Nefsa xwe bîra xwe bikî Tobe bikî ji wî dilî

## **QESÎDÎ DU PESNÊ PÊXEMBER**

Gotina Seydayê Batî ye dilovanîye Xwedê lê bê dinav vê  
dîwana min danîye ji bo pîrozîya wî bigihêt me.

Ey ne`t tu ez erş heta ferşa şehîra  
Ez pirtuwa nûra te cihan gişte minîra  
Ey Seyda alem bi te pirwayî asîra  
Ey taca serê şahan û sultan û emîra

Qed kan lik efdel lik li cûd kesîra  
Erselet îla xeleq beşîren we nezîren  
Te tursili melek erş el ezem  
Der behra cemalî tu tenê dara yêtîm

Lolo seftî der sedfa behra ezem  
Ehsentîrî ez Yusufê sedîq helîm  
Mkan lek elnas şebîhen we nezîren  
Erselet îla elnas beşîren we nezîren

Fexra melekan padîşahê textê medîna  
Yek lehze giha erşê Xirama bi meşînî  
Ne çerxîfelek bo te ser gişte avînî  
Her çî ku neynit bi te îman û yeqînî

Têkbûne xesaret û sîslûn seîra  
Erselet îla el xelq beşîren we nezîren  
Baranî silavan ji xwuda sebih eşîye  
Bir seyîdî muxtarî Resûlî Medenîye

Sedîq û çi Farûq û çi Usman û Elî  
Bir alû û eshab ûdurûşma qedmîye  
Kanû lek fî el dîn meñen we nesîren  
Erselet ila el xepeq besîren we nezîren

Ey leelû lebî ezîm re mîm ew dikit ehya  
Ber şewqa ruyê te buye sir gişte surya  
Coşan û Xuroşan ji firqa tene derya  
Her çî ku bi şer`a te `emeldar e didinya

Kanit li him el xeled herîren we serîren  
Erselet ila el xepeq besîren we nezîren  
Ey seyîdî dîn muhebet ayet mukerem  
Şsmî te di Hindî sehfan buye mufexem

Lutfa te şeyatîn ji sema kirîye murcem  
Gerdî to nebuya nedibû çerxa mi`ezem  
Tubî li min eşfe`et le kunt menîren  
Erselet îla el xepeq besîren we nezîren

Ey Seyîdî `alem seneda nûra hîdayet  
Hêvî dikin em tim ji te ey sedrî risalet  
Mehrûm nekî tu me ji dîwana şfa`et  
Batî bi cehenem nebrî roja qîyamet

Qed kunet le şem şefî`en we nesîren  
Erselet îla el xepeq besîren we nezîren

## PESNÎ PÊXEMBER

Ey seyîdî `alem nûre qendîle mizeref  
Serdarê temamê enbîyayî bê tedref  
Erwahê munewer li huzûra tene sef sef  
Hawêr ew dixwînin pirkî ayatî di Meshef

Şitiryo û Qidûsîn melaîk têtin ref ref  
Tevda ew ji nûr û kerema te bûn müşeref  
Hişyar hêvîdar e ew ji nûra te müşeşef  
Şafi` bî di heşrêde ji bo wî bi tekelef

## **BIHABÛNA XWENDINÊ**

Xwendin dara bilind e Bi bêhna wa bax û rind e  
Şaxê wêna tê hildan Ser gerdûna bilind e  
Xwendevanîn bilind e Gihan ser heyva gund e  
Di nav koma însanan Serê wana têt hildan

## **XWENDIN SERKETIN E**

Dara bilind ew xwendin e Bi misk û enber mistin e  
Cîhan dibihnî hîştin e Xweşî têda raxistin e  
Milet pir û rê xwendin e Azadî têt bi xwendin e  
Dar û dewlet bi xwendin e Bi xwendinî serketin e

Welatpîrozî xwendin e Serbestî û pêşketin e  
Hişyarî û axaftin e Serxwebûn û destriştin e

## DANA EVÎN O 'EŞQÊ

Temenî ez dikim ya Reb te da min `eşqa mecazî  
Bi her rengî şerîf mame bi yarê re bi dilxwazî  
Bi yarê re gelek dem çû bi vî rengî me kir gazî  
Li pêş cirim û guneh çêbû hîcab û pirdîya nazî

Heqîqî `eşqa min çê bû dema dil girtî perwazî  
Ji zewq û lezetê mame bi yarê re î`cazî  
Belê dewsa mecazî hat heqîqet bi tinazî  
Çû warê xwe di dil de çêkirîye bi serfirazî

Ji bîra min çû yara min heqîqet maye serbazî  
Evîna min felek dêwr da li dînyayê nema sazî  
Bi vî rengî gelek maye mi dî şewqek bi şehbazî  
Jîşereb birqekî derbû cîhan girtî bi fewlazî

Aya Hişyar tim nabe bi `eqlanî nema razî  
Bi rêke şer'a Pêxember bikir carek bi daxwazî

## **MELE MUSTEFA BARZANÎ DILOVANÎYA XWUDA LÊBÎ**

Barzanî bi navê Mustefa ye ey Serokim  
Herdem ez duxwum sondî bi navê te Serokim  
Çavên te wekî çavên pilingan ey Serokim  
Lewra ji ezel heq te dinasî ey Serokim

Tensîx kir ji çavên te ji bo şêr û pilingan  
Her halde ev nî met daye wana ey Serokim  
Qet kes me nedî awirê çavan rengê ê te  
Wek şibhê bijû ku tewrê bi tîrêj ey Serokim

Mêrxas bin heger mêt bin û ya sultan û paşe  
Hember awirê te ew xwe nagirin ey Serokim  
Rodîna te heybet jê bi şeca`et  
Tawêl jê re nabî her kesek zanî Serokim

'Enter nebû wek te di qiwamê bi mîranî  
Ristem jî ne wek te di şran de ey Serokim  
Tîra felekê ci bikim mixabin çendî zor e  
Êşa pençeşêr rîkir ji bo te ey Serokim

Sipasî dikim rîça tu pê çû jê nedûr bim  
Hişyarim di wê rî de bikaribim ey Serokim  
Êşa ku tu pê çû hizûra zat el heya  
Rîçe pençeşêr buye rînasim ey Serokim

Hêvî ez ji Yezdanê mezin her dem dixwazim  
Wek çaxê di jînî de heval bim ey Serokim

## **QEHREMANÎ YA BAV EW LAW**

Qehremanê esra bîstan Mustefa Barzanî tu  
(MelaEmadedîn)

Bo to latan sondî naxwim  
Ez bi roja xawrî  
Qehremanê qirnî bîstan  
Şêrê Barzan wa lira

Çendî Barzanî mezin çû  
Mesûd girtî xencerî  
Ger û govenda ku lê ye  
Liza dujmin nabî rê

Hawirdor wek gurgê harin  
Li berxê çavreş digerin  
Hin ji sûrî hin ji Îran  
Hin ji Sedamê şerî

Defna Kurdan ew dixwînin  
Da ev birine çi sirî  
Şêrê cangirîn ji dewlet  
Dil û can venegerî

Ne wekû heftê û pêncan  
Reş kir soza deftera  
Destê Şah û Ereban girt  
Reş kir şûna fenera

Xwe rapêçe şûr û rim girt  
Danî şûna kemberî  
Şoreşa şêst û yekê  
Winda nabî wekî berê

Biryara Mustefa Barzanî  
Danîye girtî li rê  
Qedera miletê Kurd  
Ava heyran ji bire

Miletê Kurd ew şiyare  
Lîz û bazan dinêrî  
Lîz û bazê dijminê Kurd  
Hîn ji cengea Tetera

Beqilûbazî dileyzin  
Bi dizi him bi eşkera  
Dostanî diyar dikin  
Lê bi dil neyarê berê

Hoşyar carek şîyar be  
Biseke xewna qederê  
Qedera te xebata te  
Wê azadî vegerê

## MÎR BEDIRXAN

Bi xêr hatî Bedirxan Mîrê Botan  
Serekdarî gelê Kurd û Kurdistan  
Te kiribû zor xebate pir bi Yezdan  
Tevî mal û piçûk û deyşt û zozan

Ji bona serxwebûnê kiribû qurban  
Ji bo serkeftina Kurd û Kurdistan  
Milat rakir ji xewa kûr ser nigan  
Te dewlet jê re çêkiribû dilovan

Te mafê Kurdan hildabû li ezman  
Te leşkerkî giran çêkir bi ferman  
Temel sike pere ji zîv û zêran  
Bi navê Dewleta Kurdî ez heyran

Aro serdarê Tirkan çûn rex Siltan  
Revîn ber leşkerê Kurd û Kurdistan  
Asasê Dewleta Kurdî li dardan  
Bilî 'Îzedîn rovî Tirk û Siltan

Patoxwerê serokê caşê Tirkan  
Piştî Welat ji nûve bû gulîstan  
Xîyanet kir pere xwar ew birazî  
Ji bona Mîr dibe xwarzê ş birazê

Berê cengê zivirandî bi sazî  
Bi caş û leşkerên Tirkan kir gazî  
Şikandî Dewleta Mîrê Ezîzî  
Ji lewra ew li ber dijmin ma tazî

Derket fermana Mîrê Bab El Alî  
Emîrê Xwînxwarî Siltanê talî  
Bi nefî ya Mîr Bedirxanê Delalî  
Li Albanya akincî kir bimalî

Bedirxan ew ji dostan nabî xalî  
Li Şamê çêkirin koma hevalî  
Dilovanî li Şamê jêre daket  
Be cîyê bû ew heta roja qîyamet

Li rex Şêx Xalidê sahib keramî  
Milet perwer xwudanê alem û hîkmet  
Veşartin wî bi cîranî qebûl kit  
Li ruhê wan bibarî hezar rehmet

Bila şâ be Bedirxanêm bi rehmet  
Bi dû te torinên çak û bi hurmet  
Ne razan çûn û hatin dora milet  
Ebdul Rezaq û Mîr Mîdhet û Celadet

Kurdistanek li Misrê Mîrêm Mîdhet  
Liçap kir Kurdistanek pê şadî ket  
Hezar heyştsed û not û heyştan  
Di bîstû duduwi nîsan derket

Li Mîsrê alîkarî kir Mihemed  
Elî Paşa Bavê Farûqî derket  
Li Rusan li Alman û li Taşqend  
Ebdul Rezak Sefîrê Kurd û Dewlet

Ger û govend û doza Kurd û milet  
Gihandin me' hedâ seyfer bi dîqet  
Da zanîn bo gelê cîhan û dewlet  
Doza Kurd û Kurdistan bi hîcet

Celadet torinê rast ûbihîmet  
Di îlm û zanibûn û rast û serbest  
Hawar û Rohnayî çêkir bidarket  
Tipê Kurdî bi latînî jê derket

Xoybûn Partîyek çakî biserket  
Di nava miletê Kurdan de daket  
Li Waşînton li London û li dewlet  
Torinê Mîrê Botan doza serbest

Doza xwe dane destê Koma Milet  
Ji bo mafê Kurdistan û dewlet  
Li pey wana Seîd û Qazî û Berzan  
Şerîdê azadîyê bo bidest wan

Lê çi bikim bo Kemal û Şahê İran  
Bi rîka wan sitem danîn bi ferman  
Barzanî çak û dilsojî Kurdistan  
Hukum danî ji Kurdan re kir derman

Serok Mesûd li pey wan hate meydan  
Doza Federalî dikî biherzan  
Bilî dijminê zorî dijê însan  
Daxwaza wan bitefi şemala Kurdan

Xwendekarê Ewropa û Emerîka  
Peyman dane biparêzin me Kurdan  
Jî dijmin re dibêjin sond û peyman  
Jî Kurdan re nema Kuştin û talan

Şeş û deh dewletên Ereb ser cîhan  
Bi doza Filistînî re didin can  
Filistîn bi qandê lêwayekî Kurdan  
Tunîne lê dikin doza bicengan

Lê gava navê Kurdistan tê meydan  
Bi yek zarî şer dikin mafê Kurdan

## **AXIFTIN BI PÊNIVÎS RE**

Ey qelem min qet nedî janek ji dil rahet kirî  
Kul û derdan min bi êşan derd û jan zêde kirî  
Gava destê xwe dirêjî te dikim nazanî min  
Ejdeharî tu ji nişksn destê te gez kirî

Defterâ derd û xeman wek ewrê nîsan dikelin  
Çerçeva ser me helanî hiş û aqil min birî  
Ketime nav dûman mij de reş û tarî bû li min  
Wî mijî ez hilfirandim paşê min serjêr kirî

Min li wê bûkek didî wê keys û bejna ser wê min  
Qet nedî wek wê şepalek dil ji min nîsan kirî  
Deste best û jar û mest bo wê bi Kurdî gote min  
Kurdistanim ji qelem re bêje ew min best kirî

Bi hezaran salbihartin guhdarî nakî li min  
Lewra nav pêncî neyar demame wî min qeyd kirî  
Bêje Kurdo hovo rabe bikire namûsê limin  
Bi qelem re bi hevaltî danişe dawî werî

Tu Selah û Şêrgo neynî feyda cengê nadî min  
Çaxê şûr û rim nemaye bes qelem feyde kirî  
Îro çaxê top û saroxane ey dil bêje min  
Guh nedêre bendekan hîlekan serserî

Ey Hişyar û seyda ninî tu qelem bikirî ji min  
Ev tiwarê miletan çakî bi dozê re herî

## KARÊ DIJMIN

Dora me dijmin têl vedâ  
Bi rehetî rê berneda  
Ku em herin rêka xwe da  
Bimba dibaran ser meda

Dijmin danî di erdê meda  
Girtî ji vir ta serheda  
Dijmin li ser me bê heda  
Kurdên reben kir mideda

Hewara wî de kes neda  
Çare û mefer maye xwuda  
Ku can nedîran em fedâ  
Çara me nîne ey geda

Qet kes ji bo te guh neda  
Peyman û soz bo te neda  
Dewra çelengan bermeda  
Peyra tu bispêre Xwuda

Xwuda ûsan gotin dida  
Gotî rabe heq bermeda  
Gotî rabe heq bermeda  
Ez bi te re nabim cuda

Vê şêwrê bêxe serê xweda  
Wisaye şer'a Ehmeda  
Hişyar bese bike neda  
Canê xwe giştî sir xweda

## **JÎNA BINDESTÎ**

Eger dinya te dûrbîn bî  
Di dil te ew pir şîrîn bî  
Li bin zicir û sitembîr bî  
Her tim ser te qal û qîl bî

Koledarê ber derî bî  
Wek qantirê libin zîn bî  
Bindestê dijmin girtî bî  
Çikî wê jînê bi dîlî bî

Dravêن te bê texmîn bî  
Bi koşk û quesir û terzîn bî  
Tu wek Hişyar dilbirîn bî  
Jîna te wê firavîn bî

## DÎLBERÊ

Dîlber qamet elîf rengê rîhan û gul e  
Sosin û terha qedîfe melhema can û dil e  
Ez giham diçû bi rêve wê ji min bir aqil e  
Min digot cismê letîf e ji bihiştê nazil e

Dîtina wê bi sed derîve nêrgiza lat û mil e  
Kuştima bi awir û lêve mal limin kir kavil e  
Bi nesîmî sihrî ve ji beqçeyê qernefil e  
Roj bi xêr da min dipeyive rohnîya çehv û dil

Gizmeyek danî ji pêşve mîlake kole  
Bûm ji wê derba birêve nexwoşî nav mezel e  
Min nizanî ew ji kuve hatîye ew serpil e  
Kuştime dêmî ji sîvan her du çavêن qatil e

Ne ji Qilab û ne Silîva ne Kohî Gerdel e  
Ne ji zozanî şerîf e ne cezîr û filfil e  
Ne ji Şengale kirîv e ne ji Berzan û bil e  
Ne ji Batman û Birîv e bil ji şaxa nav dil e

Kurdistan e rabe pêve bi qiloçe ser kil e  
Lo xuyaye ew bi kêfe Huşyar deyn ser mil e

## **ÊŞA WELAT**

Welatê min çiqas bêjim digel te  
Kul û derdan dibařinim li ser te  
Bilî çara me nîne gel bi derde  
Sitemkar darê zorê girtî ser te

Ji gazî û hewaran deng nemaye  
Di min de ez bi kovanim li ser te  
Li cîhanê temaşe kim ji bo te  
Temamê dewletan cenge li ser te

Le pêxwas û le Îran benêre  
Be milyonan ji hev kujtin ji bo te  
Li dawîkî ji tirsa miletê te  
Dihevda ew buhurtin tev ji bo te

Erê Hişyar bizane dewr wusa ye  
Kurdistan teze maye bin dest e

**4. 11. 1989**

## **QEDERA XWUDA**

Ez mama di heyreta xwuda de  
Kurmancî di dewletêni dinya de  
Bê behrin ji hîkmeta xwuda de  
Bê dewletin bê karin bi zêde

Xwendekar û wezîre ser bederdan  
Hinka ku ewan dar ber xwe berdan  
Dijmin wekî holê wan di hildan  
Pir mal û dirav ji wan girêdan

Tamara xwê di çehvan hatin  
Lewra bikelk tu bê xelatî  
Hinda me xweh tu gelek nerastî  
Ji destê dijminan xwe neparastî

Dijmin xwendkarî dewletîne  
Ew dijmin û xwînxwarê birîne

## DENGÊ KURDAN

Dengê Kurdan lihederîzane sitemkar hêdî ye  
Xwîna xwe jêre dikî gorî û hên nerazî ye  
Eskerî jêre dikin sax û mîrezanî  
Roja cengê serserê dijmin êrîşe pêşî ye

Feyde nakî bo sitemkar hêñ jê ew nerazî ye  
Em bedilek him bi gazin têne pêşbirî neyar  
Him bi qanûna mirovan rengê demoqraî ye  
Him bi qanûna şû 'îyan razî nabitin neyar

Dev li canê me kirî naberdî ew yek carî  
Feyde nakî bo sitemkar hêñ jê ew nerazî ye  
Ger çiya meydana şêran e piling jî dû wî ye  
Miletê Kurd di çîyan de serfîrazî ya wî ye

Gerden û xwûna serê xwe Barzanî danî ye  
Dirêka azadîxwazan pirsê nakî ew çî ye  
Feyde nakî bo sitemkarhêñ jê ew nerazî ye  
Keleh û çeper ji xwûn û ser û can ew çêdikî

Mêzenakî ew di cengê ne li zehf û hindikî  
Cendekan davêjî erdê napirsî pê lê dikî  
Ger di vê rê de nemînî zêç û mal û xanî  
Feyde nakî bo sitemkar hêñ jê ew nerazî ye

Her dima şer û qewamî serbilinde serpiyan  
Ew dikî wêran bi carek koşk û birc û xanî ye  
Hêvîyan nakî ji dujmin ew bedîl û lavan  
Rev ji bo wî qet tunîne mîranî karê wî ye

Feyde nakî bo sitemkar hêñ jê ew nerazî ye  
Rabe Hişyar tu binêre dem û dewrana dinê  
Miletê Kurd bitenê maye di mîzana dinê  
Şerq û xerb tevda dimeyizînin li şopa gerdenê

Daxwaza xelqê cîhan bo herkesî azadî ye  
Feyde nakî bo sitemkar hêñ jê ew nerazî ye

## **GERDÛNA DIJWAR**

Ev çaxê li min fajî li gerdûnê diçî û tê  
Çendî digerî tali` di çerxêda bikid her tê  
Kîna felekê herdem bi dijwarî li min tê  
Sûcê min tu nîne çima vajê bê mefer tê

Ez çûme link pîrê Mixan gotî çima ê  
Bê sûce felek Hişyar bizane biqeder tê  
Îqbala nikaran be xebatê ew dirust tê  
Daxwaza bi rastî ew bizanin xweş lihev tê

Eksa qederê bikî nikarî mistehîl tê  
Birca te reşe îro belê tali` nêzîk tê  
Tîra felekê zor e dema pê re qeder tê  
Lê sebir û xebatê bikişîne xweş lihev tê

## KURDISTAN

Û

### Karê Sedam û Emerîka

Kurdistanî welatê min ne wek Sîn û ne wek Hindî  
Bi te çerxa li gerdûnî dirakê berberî û bendî  
Tu Wan û Sêrt û Amedî tu Zozanê Şeref Xendî  
Tu Kerkûk û tu Hevlêrî tuyî Dûkan û Debendî

Tu Kermanşah û Tebrîzî Rizaî û Mehabatî  
Tuyî Zerdeşt û Seblaxî Cih û warê Eyub Mendî  
Delalî tu çiqas rindî wekî terha xav bilindî  
Xezale nav beled nînî tu xişmane dinav gundi

Tu rohnayî didî her der wekî mûm û wekî findî  
Di çar kenarê gerdûnî xuyaye tu çiqas rindî  
Wekî roja ku şewqa xwe dide rûkê cîhanê de  
Temamê jîna her tiştî bi wî saxin be ferxendî

Ji bona te xwîya ye dewra gerdûnê bi vajê te  
Temamê dewletan cenge ji bona te bi her mendî  
Welatê min tu bû fitne bi zîv û zêr û petrolî  
Liqade Kurd û Kurdistanbela çîkir bav û çendî

Temamê me`denên nûwe derdi Kevin û hin tê xuyabûne  
Ji yaqût û ji almasan di gerdûn ser bilindî  
Li Ewropa tu meyizîne li Asya him li Afrika  
Li her pênc qareyê dinyayê ji bona te bê şermendî

Tebat û him livî nîne kuştin û ceng û talana  
Li behr û bej û valabûn mij û dûman wek mendî  
Bi navê herba Îran û Iraqê ew dikin me`na  
Kesê bawer bikî şâşe ne ev daxwaza efendî

Ji bo xêra welatê me di her çar warê petroli  
Bi hevre ew dikin kînê derakin ger û govendê  
Van istûlê Emerîkan di Behra Faris û Hindê  
Bi wan re kar dibin dewlet tevî NATO û ATLANDÎ

Li meydana şerê Îran bi Sedam û Iraqê re  
Bi aştî ew dibakin eger û bêjin dirêkek dî  
Agir û pêtan gur dikin cenga kîmyawî ser dikin  
Feqîr û jar divê bimirin kesek hember nebî idî

Belê çibikim delala min ez Hişyarim bi vî rengî  
Dirêjim van kul û derdan wekî pêlê Behra Hindê

## MEXAPIN BI HÊZÊ DIJMIN

Bi Yezdan ez dixwînim ey welat karê xwe pêk bîne  
Bizan lawên te yê dilêr bi xurtî doza xwe dibîne  
Tevî dozdarê cîhan doza Kurdan bixwer tîne  
Birûsk û nameyan şandin cihê heqê mirov bîne

Ger û govend li Ewropa hevalbendê xwe datîne  
Li ser rûkê cîhanênav û nîşanan digerîne  
Çime Sovyet tu dey nakî qanûna Marks derîne  
Ji bona mileê bindest derheqê wê çi hel tîne

Ev jî xape li Kurdînî dikî herkes dixapîne  
Temamê karker û cotkarê dînyayê dixapîne  
Bi vî terzî xîyanet derheq Marks tu dikşîne  
Nîzam û destûra wêna ji rengê tu dertîne

Sitemkarî dikî ser gotina qencan nerazîne  
Di gewran de pir xemkin ji serdaran bêhêvîne  
Dibakin leşkeê WARŞO jar û bindestan nabîne  
Li ser rokê cîhanê tevde bin qanûna Nazîne

Ciwan û qehremanê Kurd bi xwînê doza xwe dibîne  
Li deyşt û koh û bajaran xwûna paqij ew dirijîne  
Berek nîne latek nîne li Kurdistan nevisîne  
Bi xwûna pêşmergê Kurdan doza xwe ew lê danîne

Koma Mîleta bê guhdar kanê heqê Kurdan nîne  
Carek pirsê li me nakin ne raste ew nezanîne  
Ne şerq maye ne xerb maye ne Hind û Sîna dawîne  
Ji pîlan pêve nas nakin ji wan jî em bê hêvîne

Erê milet tevda rabin li keskî xwe netewkelîne  
Tu ïnanî bi doza xwe li nefsa xwe bi tenê bîne  
Barê dewra te hilnadê ji xeyrê te kesek nîne  
Barê doza te pir zor e carek lê meyzîne

Kesê barê e hilbigrê ji xeyrê te kesek nîne  
Bizan barê kerê Îsa ji xeyrî wî hildî nîne  
Gotin û pitatê Hişyar were carek lê meyzîne  
Ji ber êşa dilê xwe ew jî van peyvan dirijîne

## **WELATÊ MIN**

Welatgê min çiqas rind û başî  
Wekî zêrî şûrî qelemtiraşî  
Cîhê te pir bilind e goh û kaşî  
Hemî deyşt û çiyayî tu qelaşî

Li kohêñ te dijî ava heyatî  
Bi serbestî durustî ne bişaşî  
Di nav baxan bi xem xem ew diçî ş tê  
Gelo Hişyar vexwarî jê bi shaşî

## **KURDISTAN NEXWEŞE**

Ez Kurdistanim bi derd û rencim  
Ez berê yek bûm ne şeş û pênc bûm  
Xwedî çiya me kelat û bircim  
Îro nexweşim bi derd û rencim  
Belê nexweşim bindest û xercim  
Derman me nîne bê kes û kencim

## NALÎNA KURDISTAN

Ez nexweşim ta digirim Roj ji rojê xirabtirim  
Destgirtiyê bin kevirim Hêl û taqet nahilkirim  
Birîndarê can û dilim Rewşen me nîne sêfîlim  
Lew bi dijmin difikirim Bi zorkarî bindest kirim

Hişyar bese talan birin Xwînê dîne pîremêran  
Wê şîn bibî dara mezin Dara yekîti û serketin  
Hingê wê Kurd azad bibin Talan û xak wê vegirin  
Zincîra Barzan bikirin Şopa şehîdan diherin

## SITEMA LI KURDÊ CIZÎRÊ

Bira mîze bike tu li vî zemanî  
Li halê Kurdê bê zar û zemanî  
Çawa dijmin işkence ser wan danî  
Cezîre Kurdê Sûrî bû fermanî

Eve halê Kurdê Sûrî li Cizîrê  
Qaçaxin tevda derdê bê dermanî  
Qizilbaş û pêxwas herdû bi hevra  
Dibên erdê Cizîrê bê gumanî

Cîh û warê me ye kevnarê salan  
Hun mîvanin herin tevde biyanî  
Li tarîxa cîhan carek nanêrin  
Cizîr herkes ji tarîxve dizanî

Kurdin xwedîyê ax û erdê welatin  
Hezar salan ji bavûkalê wanî  
Berê çaxa ew lê akincî bûn  
Divî erdê ji dêke Kurdî zanî

Diwî çaxê Milûkê Eyubîyan  
Ji Şingalê tu bigirî Serêkanî  
Ji zirgan here deysta Sirûcê  
Tevî Kurdin Birazan li Kûbanî

Li Kurddaxî li Efrînê binêre  
Li wan şaxên zeytûnan bê guman  
Warê Kurdaye ji kevnarê salan  
Li meydana şêran wan kon didanî

Melek Adil Melek Fadil Eyûbî  
Bi Romê re biherqel şer didanî  
Ji Antakyê milûkê Romê rakir  
Bera wan dan Bizente bi karwanî

Di wê hingê Qizilbaş caşê xaç bûn  
Pêxwas jî sipîkuj bûn herkes zanî  
Belê dibêjin ê derve hatin xanî  
Ê hundiro ji xanî wan deranî

Ci bêjim ez ji van derd û kulan re  
Ji destê Kurdên pîsê Kurdistanî  
Heçî pato xwurin ew dûv livînin  
Li pê dijmin diçin bi ruh û canî

Binêre ew çiqas dûrin ji jînê  
Ji destê dijminan hatin yemanê  
Hişyar bese bibêje van dîlokan  
Bizan namûs çike derheq wana

## EY FELEK

Tu dizanî ey felek çendî tu dijwarî dikî  
Serserê jar û feqîran toz û dumanî dikî  
Lê bizane ey felek derba dime tu dor dikî  
Carek hildidî li jorê cara dî serjêr dikî

Lê belê bawer bike tê ji vê felatî bar bikî  
Tê ji hebûnê herî wêda xeyrê te wê kar bikî  
Hingê tê zanibî çendî sitemkarî çi dikî  
Gava zorkar serserî tê pif û halanan dikî

Xak û erdek nuh wê bêtin ji cihê te rabikî  
Dil û nav û riha piştê ew ji kokê ew ra dikî  
Hoşyar bese bibêje dil nema tehmul dikî  
Sebir û silwan tu hilîne her Xuda ew çê dikî

## XAPANÊ GERDÛNÎ

Şoxe ku ez dinasim Xwurşîd jêre gede ye  
Ber pirava şewqa wî Rohnî da her dera ye  
Çi bikim felek nedost e Karê felek weha ye  
Bi hezaran wekî min Kuştin li bin pîya ye

Însan mebe ji ber wê Gelek ew xapînok e  
Zarê wê pir şêrîne Dibin jehra marî ye  
Bê ser û ber têt mirov Rengê maran didaye  
Yan wekî sehkî paşvegir Xwe davêjî meraye

Hişyar bizan bêkîne Felek bo te xwîya ye  
Înan mebe tu jê re Wek ta'wîla xewna ye  
Dibî ku xewn bi rastî Çêbit qet nemehal e  
Soz û peyman e gerdûn Hemî êş û bela ye

## MÊZE BIKIN LI PÎLANÊ SITEMKAR

Dilo rabe bi şiranî bi rengê dîlberê danî  
Rihê şêrîn liser danî neçûbê textê tûranî  
Bizan Tûran û Îranê Ereb tevda bi misilmanî  
Biratî biwan me danîbe hîl û pîl û xapanî

Dibêjin hun xwedîyê malin birane tev misilmanî  
Nêzikî firaxe nebin li ser we me emir danî  
Di cengan de li pêş wanin ji bona wan em meralin  
Ew xwedîyê ac û nîşanin disuxurînin me bi kolanî

Hindek dîtir ji wana ew dibêjin Kurd tu nînin tu  
Kesê bêjî birane ew emê lêxin bi çokanî  
Li ser erda welatl me ji petrol û xêratê me  
Her roj cenge ji bona me di nav tazî û îranî (?)

Divê xwîna me bikişînin ji nav canê me derxînin  
Goştê canê meveçirînin rengê kelaşê sehkanî  
Ji bona me sehkî harin çend ku laşen me xwarin  
Welat birin ew serdarin tevî şêni dar û kanî

Milet saxe ew xew nakî heta firsetê peydakî  
Hişyar e lê ew deynakî belê soz û peyman danî  
Miletê Kurd ranakevê heta rihê şêrîn hebî  
Kurd û Kurdistan wê hebî heta ew bikrê nîşanê

## BÎRANÎNA DÎROKA KURDA

Miletim rabe binêre buye çaxe xwuserî  
Kes ji te pêve nemaye dîl û jar û bêserî  
Tarîxa cîhan bixwîne da bizanî çend nijad  
Şeszed û heyştê dixwînin tev bizarê madirî

Ev tixûb tevde li me buye Sedê Çîna mezin  
Ê ku derbas bî tê kuştin wek nîzam Hîtler  
Tu li Viyetnamî binêre qîr û halan û şer e  
Hezaran têne kuştin tev jibona xweser e

Him li Kûba him li Korya cil û çar sal şer kirin  
Heta azadî nebûn nixwûn nebûn çav û serî  
Mal û can ş zêç û zarok tev fîda bûn bo welat  
Heta taca serxwebûn ser serê milet kirî

Hişyaro tu şîyar be qet kesek raze nema  
Le dewr û dolaba dinê çerxafelek qet nanêrî

## **FELEK BIDERD E**

Herdem tifû ji ber min hezar tifû biserde  
Ser gerdûna sitemkar anî ji bo me derd e  
Tac û key stendin serwanek dabû ser de  
Dema gerdûn vajî tê arî dikî biser de

Hişyar dema gerdûnî tête li Kurdan  
Felek kîna wî zore ji ber Kurdan biderd e

## **XORTÊ ÇELENG**

Welat dibakê herdeme Xortê çelego bê xem e  
Xerîbim ez bê çareme Ber dergehê lutfa te me  
Xortê ciwan gotî çime Ji bo te ez pêşmerge me  
Bira ez bimirim bê xeme Gava di min de xwûn nema

Xorê Kurdî bêt dewsa me Ewê helênî heyfa me  
Cîhan gîrim nekole me Rakim van zor û siteme  
Gava welat xweş bû li me Rakim konê derd û xem e  
Ji bil welat pir şemal Pir biha û qîmet û lat

Ez bibînim canê delal Erzanî nafroşim bi mal  
Welat dibê Hişyar bese Kesek nemaye bê kese  
Ji bil Kurdistan a xweş e Didest dujminê teres e

## MIZGÎNÎ

Diwê cejna mezin çûme serdarê  
Di Newroza bîstûyekê adarê  
Bişev min min dît pîteagir tê hildan  
Li kohê Kurdistanê ser zinarî

Min dî teyrek sipî daket ji asmanî  
Min go mujde li ser milet dibarî  
Min go îro ji jorê hate xwarê  
Wekî rengê tilûrî ber biharê

Min go belkî teyrê baz bû hatî  
Xwe daddabû kevoka ser çinarê  
Nizanî min ku teyrê qertelê reş  
Xwe dada singê zirbilbil hezarî

Bizan bilbil hezar baxê Kurdistan  
Birîn buye dinav pencê gemarê  
Kevoka kesk û sor û zer birine  
Hişyar bake Diktor Nafiz bi xarê

Seîd û Qazî û Berzan hun rabin  
Îzin bidine milet wî dîtî carê (?)

## XAMÊ

Noşî me kir vê badeyê Ji mi xanîyê padîşehê  
Dil min revandî vê mehê Min secde bir qîblegehê  
Lêxist li dilde xemê  
Gava min dît ber dergeh bû Şaş û xwar mam berze bû

Secde şikir yan sehwe bû Min pir zanim bê çare bûm  
Lêxist li dilde xemê  
Çaxê min dîti vê mehê Reng esmerê padîşehê  
Gotî ji min re gilehê Te çare nîne vê mehê

Lêxist li dilde xemê  
Gava min dîti dîlberê Şewqek ji xerbê da dere  
Wek roj û heyy û exder e Çendî min dilek da bere  
Lêxist li dilde xemê

Ew dîlbera rohnî didî Bi dîdeê çavan medê  
Nav esmer û gewran didê Awir li can û dil didê  
Lêxist li dilde xemê  
Can û ceger qet nalivin Lewra kewtî jê av û xwîn

Nafiz bi xwe hat ser birîn Feyde nekir ketime livîn  
Lêxist li dilde xemê  
Saet li ser dilde birî Bi dengê guh mîzekirî  
Êşa ku mîkrob navkirî Bi destê xwe derman kirî

Lêxist li dilde xemê  
Bi zarê şêrîn gote min Êşa te kevne çehvê min  
Min got hewar bêje min Êşa Xanî ye hate min  
Lêxist li dilde xemê

Êşa Xanî derdê welat Qet jê nekir sax û felat  
Dawî canê xwe kir xelat Ji bo Kurdistan û xebat  
Lêexist li dilde xemê  
Gelek divê rêde hene Di şopa welat de wek mine

Pîr û mamostayê min e Tovê Kurdistan a min e  
Lêexist li dilde xemê  
Hişyar were bawer bikî Rengê zeman mîze bikî  
Bi pişt û rext bawer nekî Kurdistanê azad bikî  
Lêexist li dilde xemê

## **MIRINA BI AZADÎ**

Ne şerm e ku bimirim azadî nebim  
Ji jîna bindestê neyar derkevîm  
Heqê her kesî ez dixwênim bikim  
Ne wek Tirk û Îran û pêxwas dibim

Hemî insirîne li wan şik dibim  
Bi şûreê sitemkar şeş perçe kirim  
Bi zanîn bi zîr û bi zor kar kirim  
Bi pîl û bi xapan piştrînc birim

Hişyarım dizanim lê xilmaş dibim  
Ji fen û dekê dujminan lal dibim

## **ALA KURDISTAN**

Ez Alim Alim Ala Kurdistan  
Ez hatim hildan li koh û deştan  
Gava aşîti ew bête destan  
Ser serê Kurdan ez tême hildan

Ji ber sitemkar hatime pêçan  
Wê dema min bêt li rokê çîhan  
Kurên Ristem û Guhderz û Alan  
Xwendekarê Kurd li çol û çîyan

Ewê serrastkin xakê Kurdistan  
Tev wê pêk bînin wek dem û dewran  
Ji ber sitemkar hatime pêçan  
Wê dema min bêt li rokê çîhan

Wê hingê xweş bê Hişyarê derdan  
Kurdistana Kurd ew bûka cîhan  
Emê bavêjin van xem û derdan  
Ji nû xwe bikin nala mirovan

Ji ber sitemkar hatime pêçan  
Wê dema min bêt li rokê çîhan

## GAZIN BO WELAT

Welatê min, welatê min welatê min tenê mame  
Xwendekarî ji min çuye bindestê dujmin ez mame  
Xerîb û jar di cîhanê di cîhanê de ez mame  
Delala min delala min delala min tenê mame

Serxwebûna her miletî çêbuye ez tenê mame  
Temamê xelqê cîhanê rizgarbûne çûne dame  
Kurdên reben bindest mane ji lewra ez rê wunda me  
Kanê bav û kalê Kurdan kanê pismam kanê mam e

Di vaê rêde hatin kuştin tevî şêxan û îmame  
Bin destê dujminê bêbext û xwûnmij ez tenê mame  
Erê Hişyar ciwanî çû bê hêl û quwet ez mame  
Dibin reşe Kurdistanê nav kul û derdan ez mame (?)

Di vê qara Asya demêrxas û egîd her ez mame  
Belê çibikim di ber kêda xulam û kole ez mame  
Xoş nobedar bû dujmin mîrkuj û bekçî ez mame  
Belê dîse xerîb û jar di cîhanê de ez mame

## **ŞÊRÎNA DIL**

Erê gewrê tu şêrîna dilan  
Tubihna dar û hîşê Kurdistanî  
Tu gewrî axa te gewre tu zanî  
Di nav hîmê te da darêن şîranî

Hemî avin, çem û bîrin û kanî  
Le goh û deyşt û cû başî zemanî  
Tuwî ser wê dinav bax û gulanî  
Ji eşqa te Hişyar dibî dîwanî

## MÊRANÎYA KURD

Ciwanê min tu Kurdî xweş dizanim  
Tu pir mêt û egîdî xweş dizanim  
Di dewrana vê gerdûna stemkar  
Di herdem bûme vajî tê dizanim

Belê çara me nîne em bihlîvin  
Divê nexta xwînê deynin dizanim  
Felek Hişyarim dewra te dizanim  
Çiqas çerxa te serjêre dizanim

## **SERHATINA KURDISTANÊ**

Kurdistan ez dilsojim ji bo te  
Tevlî ehil û xwedî tevda ji bo te  
Çiqasî şerpeza bûme ji bo te  
Bi hesret û sizaî dîtina te (?)

Umrî minî gelek nemaye canê  
Gelek min da li ser şop rêça te  
Roj meh û sal û seet bihartin  
Negihame bejn û bal û zendên te

Ez çi bikim felek bo me neyare  
Çerxa wê vajî tê ji bo min û te  
Hişyar salê te borîne ji heftê  
Azadîya Kurdan nehat ji bo te

## **XEZALA MIN**

Kurdistana şêrîn kanê gelo em têne bîra wê  
Belê herdem dinakin bona dîtina bejin û bala wê  
Li Burse him li Îzmîr û Anadolî çûme bo wê  
Gelo min got xezalek min hebû ketime gumana wê

Kesê rêkek durust bêjî ji saloxek bo dîtina wê  
Wekî heft car herî Hecê sewab û xêr têne jibo wê  
Digotin tu dil û dînî xezala te ji bona wê  
Di Şerqa Navro de cenge ji bona herdû çavên wê

Ji çahvek wê dizê ava Feratê ser şemala wê  
Ji çehvê dî dizê Dicle ji bin herxên çiyayê wê  
Li Başûrde çeleng zêr heye rabû bi doza wê  
Xwuda jê re vekî dergahê doza wê ji boan wî

Ewe Mesûdê Berzanî xwe kar kirîye bidoza wê  
Ji bav û kal xiyanet wan nekirîye qet ji bona wê  
Şepal û şox û şeng e ew hêjaye can bidin bo wê  
Mixabin destê dujmin de dixwê xêr û xêratê wê

Ji petrol û ji tebir û madenên hêja dijminê wê  
Xezala te eve Hişyar em tev rabin bi doza wê  
Nebin perçe nebin qet qet destê dostan bigirin bo wê  
Meçe Burse meçe Îzmîr Kurdistane here rex wê

## DILJARIM

Dizanim dil çiqas jar û hezîn e  
Ji derdê mafê Kurdan dilbirîn e  
Dilo jaro hewarke kes tunîne  
Ji xeyrê yekîtî çare tunîne

Ji Kurdan re bêje gelî dîna  
Fedî nakin bi Quran û Yasîn e  
We Partî kir hezar perçe bilîne  
Ji dujmin re veger dergahê jîn e

Serdarin him serokin serserîne  
Li ser millet bûne jane birîne  
Stemkar ser serê me dar hejîne  
Nizanim kî jîyane kî mirîne

Partîzanî li Sûrî bêfedîne  
Fedî nakin ji lewra bê xwedîne  
Neyar cîhaztehekum destê wîne  
Partîzan xizmetê jê re digerîne

Her çapek beyanan derketîne  
Dibêv ev partîk nûhebîne  
Meydana çeqel û rovî şêne  
Hişyar rabe millet zerer dibîne

Gelê Kurdi li Sûrî heyirîne  
Her ro êş û xesartî dibîne  
Nifûs jêre nema tev ecnebîne  
Ne kar maye ne erd maye tev birçîne

Destê milet ma sar û dil birîne  
Nizanî ew çikî wek rengê dinya  
Serok kêfê dikin kadir girtîne  
Di zindanê stemkar raketîne

Bese Hişyar kul û derdan hilîne  
Êşa milet girane dil kuyîne<sup>7</sup>

## **DOZA HİŞYARÎYA MILET**

Bese millet serî rake heta kengê tê razabî  
Stemkarî lie çêbû gelo carek şîyar nabî  
Çi bêjim ez vê dewrana li kurdinî vajî tê  
Gelo carek bi rastî ew gera wê bo me çenabî

Kurdistana me Kurdan bin mij û tarî dîye herdem  
Heta kengê libin lingê Tirkо pêxwasde bêzari  
Jîna bin destê dujmin bî gelek zore birayê min  
Wekî kolên libin destê stemkar bî bêpergalbî

Serî rake binêre mileê azad di gerdûnî  
Dijîna wan biserbestî divê rûges wek gulabî  
Ji rewşa van xulûmatêñ dibînim ez di xewnê de  
Ezê bimirim ji van ji van derdan gelê Kurdê şîyar nabî

Dema rabî herî Şamê herî derive bi mîhvanî  
Ji qonaxa xwe derbî serbestî nîne jêre rabî  
Ji xwe rabe li ser axa te lîza ferd û şetranc e  
Kurdistan berxekî can erovî jêre şivan nabî

Binêre tu li vê dewrê li şerq û xerba dinyayê  
Ji bona axa te ceng e divê dujmin derbê rabî  
Herê Hêşyar tu ku nabî jivan nêçin liser millet  
Li ceng û şoresê Kurdî di çehvîn te xuya nabî

## **GAZIN JI BEXTÊ REŞ**

Ez divê dewra cîhanê şerpezebûme ji dil  
Dewr û dolaba wê vajî ew diçê û tête ji dil  
Tali`ê min ew çiqas tarî û reş buye ji dil  
Bê pergalim bê diravim bê xwedîme ez ji dil

Miletê Kurd ez kojîme dîl û hejare ji dil  
Kurdistan jî maye êsîrî stemkaran ji dil  
Dem bi xwoşî ew berê xwe nade min carek ji dil  
Her ji dil tehlî û dîlî dem ji bo min tê ji dil

Qet nizanim ez cewabê bidime bo milet ji dil  
Jar û bêkes ew ku maye rozemînde ew ji dil  
Qedera Rebî li jore hatî ser Kurdan ji dil  
Yan kemasîya Kurdaye bê xelatin ew ji dil

Hişyarê bêpişt û pergal tu şîyar nabî ji dil  
Tamara çehvên dibilbil hatî ser çehvan ji dil

## NÎÇÊ LI SER FELEKÊ

Felek rabe carek li min binêre  
Li çerxa min çiqasî serberjêre  
Bihar hatî kesê dinya temamî  
Bi sebestî dijîn sirê min jêre

Stemkar roj bi roj ew tûj dinêre  
Li me Kurdan dixwazî me bihêre  
Bi rengê aş û genim ber biwêre  
Çiqasî em bedîlek tîne pêre

Be xwuşî wî dixwazin guwenedêre  
Hezar xidmet dikin xulamî pêre  
Misilmanin birane têkde jêre  
Dibêjin dujminatî ew dinêre

Hişyar bese çiqas bêjî nexêre  
Ji bona Kurdistanâ tevde jêre

## **TEVGERA NEYARAN**

Neyarêñ pir stemkar bûn  
Di nav Kurdistanê wer bûn  
Firsenda Kurda tevda çûn  
Kurdêñ xebatkar wunda bûn

Xemgîn û dîn û har dibûn  
Fersenda bendewarde bûn  
Bêheş bûn ew hişyar dibûn  
Ji bûve tevde kar dibûn

Neyar zore wekî têfûn  
Li ser mafê Kurd de derbûn  
Welat bakir aya mecnûn  
Neyarê te hawêr pevçûn

Çarêñ me Kurde nêzikbûn  
Belê dostê Kurde kerbûn  
Serok Mesûd û hevalan  
Peyman xwendin bi serxwebûn

Yan mirin yan Kurdistan  
Tangê neyar lixwar werbûn  
Hişyarî bê xelat çûn  
Welat yar e tu jî mecnûn

Wek û wî çek li ser gerdûn  
Nedî tê kes şêrên têr bûn

## CANFIROT

Di firoşgeha xeman can bifroşim bimirim  
Xweştire herdem ji van derd û kulan ez dimirim  
Ez gumanan ji firoşgeha gihanê dikirim  
Çendî rojin ku ji jîna min ku maye dibirim  
Dil bi destê min digirit em her du serxweşbûn birim  
Bi serbilindî gotî min bi van armancan dê herin

## **DAXWAZ JI MICRÎ INGILÎZ**

Werin carek binêrin hun li vê gerdûna cîhanê  
Li vê rewşa ku danîne li ser Kurd û Kurdistanê  
Carek Micrî Ingilîz li ser dîroka cîhanê  
Ji Kamîran Beg re gotî wê şîretê wek rîhanê

Gelên Kurdan bawer mekin ji sozan û ji peymanê  
Ji Rûs û Emrîkan û ji Frank û Birîtanî  
Heta kar û feyda wana nekevitin Kurdistanê  
Tucar bala xwe nadin we hun bimirin herin yemanê

Ji ber qanûna wana ew di her çax û her zemanî  
Alîkarî nakin li kes dikin bo nef û dewranê  
Bizane Kurdo teyrê baz firîne mîla ser danî  
Li ser serê te wê deynê teyrê dewlet û jîyanê

Hişyar bese bike qêrîn bese hewar fîxanî  
Şehbaz bi destê te bikrê ji behrê ta Tehranê

18-04-1991

## **GULXIRAMANÊ GULISTANÊ**

Ji gulistanê min dîtin gulkiraman çûne mal  
Gulperî bûn mişterî bûn nêrgiazan pêre heval  
Bêhna misk û emberê dagirtibûne xanûman  
Lew ciwan bûne li wêder pîr û kale heftê sal

Ez nizanim wesfê halê wan bêjim ey heval  
Lew ji wesfê wêde çûne nîne bo min re mecal  
Rengê ala kesk û sor û zer li wan bûne ew şepal  
Çûn seraya Kurdsitanê çêbû lê şewq û şemal

Li serayê Hişyar pêşkêş kirî yek erzûhal  
Gotî ez tevlî hevalan çendî mechûlin delal  
Kar û barê me kirî windaye wek roja zewal  
Ey Serok Mesûd bipirse ji Cewher û Diktor Kemal

Emin licne aştîxwazan pir me danî kar û mal  
Kerîm û Zeîm Elî zanin bime bike sual

## DENGBÊJÊ CÎHANÊ

Denbêjê cîhanê nav kesan de serbilindin  
Dengbêjên me Kurdan çîma bê rûmet û bendin  
Hindek li cîhanê bi mere be kul û derdin  
Navdana welatê me bi sazê xwe dihildin

Mêrxas û egîdin hin ji wan camêr û merdin  
Dilsojê welatin ji bo Kurdistan bi derdin  
Sazdarê cîhan xwedî malin şik û binkin  
Tevda wekî siltan û emîran serbilindin

Çendî bi ger û dolabê gerdûnî nizanîn  
Dengê wan di bircan li dîwanan dihildin  
Nav kome cîhanê têne navdan têne xwendin  
Lewra bi xwedîne xwedî dewlet û himendin

Bindestî eve gava em Kurdin em bindestin  
Koletî nizanîn çîye jîna dînperestin  
Ger şêxin heger mîrin heger axayê Kurdin  
Gazî dîkin bo hec û zekatê hev neberdin

Nasnakin ku dîn hec û zekatê wacib nakê  
Ser kesê ku kolebî sitemkar dest li ser bî  
Çarsed sal berî lew ji cizîrê hate gotin  
Ger ebdê ji ebdan qet tucar zekatê nadîn

Hişyar bese galgal û xeber qet biha nakin  
Milet jê hemî jar û perişan û bindestin

## **CEJNA NEWROZÊ**

Şerq û xerbî di cîhanê zanin Newroz ci ye  
Ejdehak navê wî zehleq bû stemçêkirîye  
Milkê Şerqa Navro bû xwînmêjî çêkirîye  
Kawayê Hedad bizane ew Ferîdun bixwe ye

Ejdehakê stemkar ew xwînrêtin karê wî ye  
Heq tealê pênceşerek navmilande çandîye  
Rengê wî wek ejdeha bû êş û jan lê danîye  
Du serê maran xwîya kir nav qolincê wî ye

Tibatê jêre nebû har bû ji bo jana wî ye  
Rojekê hekîmek dujmin hatî jêre gotî ye  
Mêjîyê mîrê ciwan têbide dermanê wî ye  
Gazî kir Hirmiz wezîr vî karî bo wî ye

Her siba cotek ciwan mîjî jêkderxistî ye  
Wî dawîkî mîjîyê berxan dişandî bo wî ye  
Komkî zehf û giran li kolan û çiya  
Her du cotik soz û peyman dan herin serê çiya

Miletê nejî bihevre halê wî bindestî ye  
Her wekî miletê Kurdan mîzeke li halê wî ye  
Kurd hezar salan kole û bindestî ye  
Tehda û ajan û kuştin sîtem û talanî ye

Ne ji dûr ve ruhnayî çêbû li başûrê meye  
Çekdarê pîs ji Kurdan çûn tefandina wî ye  
Kawayê Hedad ji nûve şoreşê karkirî ye  
Çek ji bona kuştinê bi destê xwe çêkirî ye

Şoreşa Kawê hildabû pêta agir ser çîya  
Nale agir sernexwun nabê û nabî hêvî ye  
Pihrozî qenc û ciwan bankir li şehr û gundan  
Bi biratî destê Kawa bigirin bi qencî ye

Ejdeha ku jê re Kawê gotî navê te çi ye  
Melek el Mewt ey bê ew lê serserî ye  
Serê Zehaq jêkirî rihê wî ji can dexistî ye  
Şahîyabihroz çê buye xwendekarî behra wî ye

Eve Newroze li şerqa navaroda hatî ye  
Gelek milet tevî Kurdan hebûn Newroz danî ye  
Lewra Kurdistan û Kurd birî Newrozê ew hine  
Dewletê gelek bilind çêbû li ser erda wî ye

Hişyarî Kurd û Kurdistan namê çake wek wî ye  
Şoreşa pazdê gulânê cejna Newroz girtî ye  
Newroze Newroze bo Kurdan pîroz e  
Bê ba û bahoz e şahî ye pîroz e

Ser tilman û gire çîya tev agir e  
Xweşî hatî bire cejn û şahî wir e  
Kulîlk dane der e gul pêxember e  
Li ser çehv û ser e kesk û sor û zer e

Newroze Newroz e Kurdan pîroz e  
Bi ba û bahoz e şahîye pîroz e  
Emê bikin xebat Newroz çêkin birast  
Rakin nîşan felat şahî çêbû û hat

Cejn û kar û xebat bo milet û welat  
Deyşt gohê welat tev zozanê xelat  
Newroze Newroz e bo Kurdan pîroz e  
Bi ba û bahoz e şahî ye pîroz e

Milet dabû soz e herdem bikî doz e  
Serok şêrê boz e nav danî Newroz e  
Bo Kurdan pîroz e ji bo gel da soz e  
Resmî kir ev doze ji bo gel pîroz e

Newroze Newroz e bo Kurdan pîroz e  
Bi ba û bahoz e şahî ye pîroz e  
Serok şêrê jor e ferman kir bi zor e  
Resmî kir her dûre wekî berê sor e

Dujmin bextkore serî rakir jor e  
Got ev tiştê zor e lê mirin têt dor e  
Newroze Newroz e bo Kurdan pîroz e  
Bi ba û bahoz e şahî ye pîroz e

Navê Newroz anîcejna Kurdan danî  
Xwuda ji me re anî binav û nîşan e  
Newroze Kurdanê xakê Kurdistan  
Ferman kir û anî qanûn jêre danî

Newroze Newroz e bo Kurdan pîroz e  
Bi ba û bahoz e şahî ye pîroz e  
Ew dijminê sore wekî marê kor e  
Go didê van şore lê çi bikê mecbûre

Dibêjî dem dewre aştî û hem zor e  
Peyvê Şêrê jor e rast kir her dor e  
Newroze Newroz e bo Kurdan pîroz e  
Bi ba û bahoz e şahî ye pîroz e

Dujmin ku bikî ziman wê jêbikî  
Belê ew nas dikî gava peyvan bikî  
Mirina xwe kar dikî ba'sî şîyar dikî  
Nizanî çi bikî Hişyar wî nas dikî

Newroze Newroz e bo Kurdan pîroz e  
Bi ba û bahoz e şahî ye pîroz e  
Diwî salê heftê nehsed birî miştê (?)  
Hezar birê xweş tê pênc û şeş tê

Fermana şêr dertê pir dirust û rast tê  
Ew ziman pir xweş tê di nehsed û heftê  
Newroze Newroz e bo Kurdan pîroz e  
Bi ba û bahoz e şahî ye pîroz e

## RÊZAN KU QIJK BÎ

Ger qijik pêşkêşê milet bê heval  
Ser kelaşê koçkan kombin delal  
Nobedarê miletan sekbin li mal  
Wê milet bikşenî kolan xeyal

Yan kolana axesehkî bê mecal  
Mêş û kelmêşan dikin ser nale nal  
Têhn bibî ger tu li çolek xir û xalî  
Bazbidî leyланê bo ava zelal

Lê çiqas nêzik bibî bi xet û xal  
Av tunîne erda hişk û bê timal  
Hişyarê pir ker û gêjî here mal  
Serokê Kurdan bimin ketîye Kemal

## **DAXWAZA JI KOMA MILETAN Di nimayışa Helebçe de di sala 1991**

Ey niletê aştîxwaz koma heqê mirovan  
Mêzebikin qenc û saz ji bo Kurd û Kurdistan  
Maf û ax û koh û gaz bin lingên dujminan man  
Hişyar bese razan li pêşve rokê cîhan

Xwuna Kurdan dirijînin her dem û çax û zeman  
Lê qet milet nalivê ji bo top û tifingan  
Wekî brûskê şevêne tirs û silî li ser wan  
Mafê Kurdan nanêrin ey Koma Heqê Însan

Toza jehrê dirijînin ser çehv û canê Kurdan  
Ev xwunxwarê bê îman Sedamê lawê îtan  
Li ser gelê me Kurdan Kurdê mîr û qehreman  
Top û gulan têr berdan li Kurdistan bû tofan

Bi sed tabûr û fewcan ketin bajar û gundan  
Miran xwendin biferman ser jin û zîç û kalan  
Tevî zaroyê pêçekê hemî kuştin biderman  
Xwuna gelê me Kurdan ji bo Sedam û Kenan

Ya îdam û bizindan xelat kirin ji bo wan  
Li deştan û li kohan bihezaran cendekan  
Ser dirêsin ji teyran wek qertel û qijikan  
Ev dujminê bêîman pir hez dikin ji beratan

Mîna segê ser laşan mîna riqal û tûtan  
Dizûrin ser cendekan wek tebayêن ser laşan  
Hestuyêن me dikojin wek cenawirêن guran  
Belê milet dibakin bi hawar û bi qîran

Ji nsv û dil dirêjin xwun û edab bê derman  
Gazîya Kurd ji mêje kes nayê gazîya wan  
Bi hevdûre dinalin her çar perçeyêن Kurdistan  
Ji cergê de dikalin ji destê Tirk û Îran

Tazî û lawêن Tûran ew bêbextên bê îman  
Di wan demêن dipaşî sî jehr çar perçan (?)  
Yekem Sedamê Faşî Kenan Evrenê Tirkan  
Digel kalê rehdirêj didane soz û peyman

Dîse kalê rehdirêj ban kir pêxwas û Tirkan  
Em destbirakin ji mêj li ser gelê Kurdistan  
Gotin ferze wek li mêj tevde rabin wek biran  
Bi destek zor û qirêj ferman rakin li Kurdan

Bi hevra sond dixwarin xwunxwarêن kevnezeman  
Bi hevra dost û yarin li vê xwunrêhtina han  
Berpirsiyar hemparin li ser xakê Kurdistan  
Faşîst û sitemkarin xwunmijê mafê Kurdan

Kirêtin pir qirêjin KUrdistan kirine wêran  
Qesabgahîn xwunrêjîn kirin di şehr û gundan  
Serjêkirin û kuştin edam û hepis û zindan  
Talan û koçbar kirin surgûnî wek Bedirxan

Jêrzemînan dikolin bi saxî dikin goran  
Li Kurdistan dibûrî reş û saye her zeman  
Wek Rîçard û Mosolîn wek Hulak û Cengîzhan  
Weka Hitlerê Nazîyîn weka Kemalê Tirkân

Tarîxa wan reş û xwîn bê bext û dîn û îman  
Ne kêmî waye Sedam ji bona gelê Kurdan  
Kemalîsê bê îman xwendin fermana Kurdan  
Elîqemshê şewitand tevî însan û heywan

Li Amed û li Farqîn li Gulyaz û Hekarîyan  
Gava keç û mîr û jin bijartin tev cewlegan  
Di zindanê kûr mezin veşartin rengê hovan  
Bê ifade jimartin edam kirin bi sêdaran

Bi ordî û alayan hilweşandin xan û man  
Newal û deşt û çîyan di nava xwînê de man  
Di cîhne zarîyên piçûk ji bo xwe kirine nîşan  
Ev yek çêbû li Dihok li Salê û Mardîwan

Çavkanîyên se çîyan tev bax û mês û daran  
Şewitandin bûn zîyan bi asîdê bi derman  
Ev tişt çêbû li Bakur li Şengal û Çemçeman  
Kurd rakirin gel piçûk ji Kerkûk bûke cîhan

Bi kotek û nalenal birîn û bend û tajan  
Kerkûkê winda nabî ewe dilê Kurdistan  
Seferbelek rakirin li ser gelê me Kurdan  
Li her derê zêr û mal ji wan birin bi ferman

Tiştê ku hat serê Kurd bi kuştin û bi talan  
Nehat serê kesekî rind dinav dîroka cîhan  
Li Helebçe mîzegin heta bigihête Berzan  
Toza jehrê reşandin ser kal û zîç û xortan

Jehra kîmyawî danîn li ser canê mirovan  
Weke tava biharê hat barandin bi tonan  
Rengê tuwan weşandin ketin ser rûkê erdan  
Goşt û hestû helandin qîz û jin û merivan

Ezê bêjim ji bo we navê bajar û gundan  
Qetilxane çêkirin ew faşistê bê îman  
Koktepe Sîwe Sînan Germîyan û Şêx û San  
Dola Çaftê Seyidekan Emadîyê qehreman

Gelîyê Baz ş serkel û Qeredax û Birkelo  
Kohê Şêxan Serpelo Gundê Qerê û Berzan  
Van buwêran dibînim bi kul û xem û derdan  
Divêtin ku nemînin rakin mafê Kurdistan

Bese haho heware dengê me çuve asîman  
Ey faşist û neyaro binasin gelê Kurdan  
Wê gelê Kurd serkevê bijî bijî Kurdistan  
Hingê Hisyar dilivê ji gotin û serpeyvan

Helebçe ji bîr nabê gelê Kurd û Kurdistan  
Wê serkevê gelê bijî bijî Kurdistan

## PIND LI MEZINA

Bira mîzeke gerdûn çawa ye  
Çerxa wê reşe bi kul û derda ye  
Ger û govenda tu lê xwuya ye  
Te barek giran da ser mila ye

Ev barê mezin ne ê niha ye  
Ji çaxê dûrve ew nexoş ma ye  
Ma tu deng nakî li van peyva ye  
Divê bê hildan mafê Kurda ye

Dujmin her yek e li her dera ye  
Tucar ew nabê bav û bira ye  
Reş sor û zer wek hevdû ma ye  
Bi hîl û pîlan têne mîra ye

Şoreşek giran te nav hilda ye  
Divê tu bigirî destê Kurda ye  
Erdê Kurdistan texma çîya ye  
Di vê ew bibê warê Kurda ye

Pê lê nekî kes ji dujmina ye  
Erda muherem bit nav hilda ye  
Bibit çeper û kozika xorta ye  
Tev bibit atom ser dujmina ye

Serok têde bî gel pêşmerge  
Hingê şoreşa mafê Kurda ye  
Bîne bîra xwe tarîx vana ye  
Nav koma cîhan çawa deng da ye

Şiklê şoreşan çawa xwiya ye  
Serokê şoreş di her çaxa ye  
Di nav pêşmerge şervan de ma ye  
Welat stendin ji dujmina ye

Her wekî Marks Lenîn xwîya ye  
Di nav şoreşa Sovyet de ma ye  
Sewra Oktobir Lenîn hilda ye  
Heqê mirovan nîşan dida ye

Her wekî Xandî nav Hindûka ye  
Di nav şoreşa Hindî de ma ye  
Her wekî Castro betlê Kuba ye  
Nav şoreşa xwe herdem dima ye

Her wekî Qadî Ala hilda ye  
Li Mahabatê rengê şêra ye  
Berzanîyî pak dinav dila ye  
Kêmasî nekir ji bo Kurda ye

Wextê ku rabû wî nav hilda ye  
Yan Kurdistan yan Kurd nema ye  
Ji dil serok bû didil Kurda ye  
Wî şax û per da dilê xorta ye

Wî Hukmê Zatî ji bo Kurda ye  
Anî imze kir hukmê Bexda ye  
Temamê dewlet li her ciha ye  
Pê dane zanîn maffî Kurda ye

Di nav şoreşê her çax ma ye  
Betlê cengê bû di her dema ye  
Gava tu neyê di nav cenga ye  
Li Kurdistanê şerê Tirka ye

Mafê Kurdistan nabit wusa ye  
Şerê bi dizî Kurdistan na ye  
Ev xirabûna gelê Kurda ye  
Tu winda dikî mafê Kurda ye

Carek mîzeke felek çawa ye  
Vajî digerê rengê xapa ye  
Sitemkar herdem rengê gura ye  
Felek xayine rengê mra ye

Neyar xwunmije di her dema ye  
Bi dostanî tê gelê Kurda ye  
Neyar bû mîqrob kete ruha ye  
Nav canê Kurdan de cî dida ye

Divê Kurd rabin wekî şêra ye  
Xwedê nehêlê peyva qelsa ye  
Weke Berzanî rakin cenga ye  
Bi destê xwe wî ala hilda ye

Bîne bîra xwe şoreş vana ye  
Milet birê te rabû piya ye  
Kor Mihemed Paşa mezinê Sora ye  
Ebidê Nehrî Îzedîn Şêr wa ye

Şa`be Eldîn Seyid Elî rewa ye  
Şêx Selîm çak piçûkê wa ye  
Mele Bedirxan mîrê Bota ye  
Serdarê leşger ji bo Kurda ye

Xalidê Cibrî Yextî pêra ye  
Doktor Fuad Beg qencê xorta ye  
Qelemkêşê Kurd ji bo doza ye  
Seyid Rizayê qenc li Dêrsim ma ye

Şoreşa wîna doza Kurda ye  
Li pey temaman Qazî biha ye  
Xwendekarê dewlet ji bo Kurda ye  
Şoreş û dewlet çêkir weha ye

Şensê me Kurdan herdem nema ye  
Dewletên mezin digel şaha ye  
Tevde bi hev re yek gotin da ye  
Divê nemêni mafê Kurda ye

Rûsê bênamûs jî tevî wa ye  
Dewleta Kurdan firot biha ye  
Ew petrola reş korkir çehva ye  
Sala pêncî heyşt piştî niha ye

Berzanî hafî ji rex Rûsa ye  
Doza Kurdistan lidar veda ye  
Temamê Kurdan raya xwe da ye  
Diya ji ber wan tevde hejîya ye

Demxetera te nemre yeka ye (?)  
Tu têde dibêjî derheqê wa ye  
Dujmin wan çêkirine ji bo Kurda ye  
Heyf û mixabin bo serdara ye

Ev gotinê çewt û bêbuha ye  
Ji bona şoreşvanê Kurda ye  
Wan mal û can û serî tev da ye  
Bira mêzeke li her dera ye

Gelê cîhanê bo mafê wa ye  
Xelkê cîhanê ev gelê wa ye  
Xebatkarê wan nav dilê wa ye  
Bi çak û qencî pesnê wan da ye

Nam û nîşanê wana hilda ye  
Şîretê Hişyar feyde neda ye  
Ji bona kesê dexs û reqa ye

## ÊŞA PENCEŞÊR

Penceşêr hatî deq û nî  
Kil di çahvan werdikin  
Ew birîndarê le kohan  
Bi qîr û fortan sax dikin

Serok û dujmin bihevre  
Henek û keyfan dikin  
Miletê jar û reben  
Bin dest de maye xweş dikin

Tasa siltan winda buye  
Kes kesî hunas dikin  
Dost û dujmin kes nenasin  
Xort biber birê dikin

Xortê hêja dilbisojin  
Her gotin bawer dikin  
Kemîn û xefkan dideynin  
Pêşiyê lê rast dikin

Miletê Kurd tevde rabin  
Mêzekin bawer bikin  
Vir û rîpan û xapandin  
Şore şivanan radikin

Serpîyan lê ew nizanin  
Serxwebûn doz dikin  
Hişyar rabe şîyar be  
Xort şopê winda dikin

## **GIRA SERBAZ DI LEŞGER DE**

Ezim serbaz di leşger de belê leşger li ku ma ye  
Ezim teyrê bilind firde cîh û warim li ku ma ye  
Libin destê sitemnérde gedem toprax li ku ma ye  
Belê navêm di cîhan de heye lekin şekil ma ye

Çil milyonim didu bi serde li bin destê neyar ma me  
Cîh û warim li bin destan li bin destê dujmin ma me  
Ezim Hişyarê xerbende jîna min bê xelat ma ye  
Dikim gazî dikim qêrîn ey deng bikî li ku ma ye

## **ŞİYARBÛNA DIL**

Dilo rabe evîdarî  
Ji nava dil birîndarî  
Ji derdê dîlberê jarî  
Bi kovanî bi jandarî

Werem barkin ji vî warî  
Ji ber destê sitemkarî  
Dîlber dibê tu nizanî  
Kurê Kurd û Kurdistanî

Tu mîrxaşî xwoş ciwanî  
Xwedî malbî yan xizanî  
Here dujmin bi çokanî  
Ew bi halê te nizanî

Hişyar dibê dîl û jarim  
Wek qfoke berbiwarim (?)  
Ji mafê gel xeberdarim  
Ji ber sitemkar bêzarim

## **MILET RABIN**

Milet rabin da em herin Li texma dujmin binêrin  
Li bin erdê mayin nebin Ber bi warbê emê herin  
Kurdo dujmin nabin bira Heger deynin barê pêre  
Nabin ji hev ser ta ser e Ger heq nedin emê herin

Şer û kuştin emê bikin Heta heqê me bi cî bikin  
Gava ku heq bi cî nekin Bikirin çekan emê herin  
Dujmin yekin gelî bira Rahêjin çek û xencere  
Heqê me ew nekin der e Rabin tevde emê herin

Hişyar dibêjî xweş dikî Can û ceger rehet dikî  
Belkî çare feyde bikî Çare nebû emê herin

## YARA BERZÎ YE

Her kesê yarek heye biştirî û tox û sermîye  
Lê belê yara te Hişyar Kurdistan e berzî ye  
Axa payî yara te bû çehvên kil re tütî ye  
Lê li gerdûnê li Asya ew siwaş û fitnî ye

Çinkû kuştin tev ji bo wî her diman axtermî ye  
Dujminê bêbextû ïnan dev lê kirîye keftî ye  
Bingehê dewra gerdûnê vajî tê bêfeyde ye  
Çendî rawestane bo wê nagirî ew xistî ye

Feleke bêbext û dijwar nabî damê bo mi ye  
Tali`ê me reş gerî winda ye nabî bal mi ye  
Dem di çerxa felekê yara te Hişyar kulî ye  
Sed mixabin şox û şeng e lê belê ew bindî ye

Me`denên zêrî direş bindestê dujmin tevdî ye  
Jê re talane bi kotek jêre bêş û yexmî ye  
Rengê yarê wek eqîqe arxwanî sadî ye  
Bin destê dujminê xwunmij jêre mal û xiznî ye

## **YARA SPÎNDAR**

Min yara xwe dî ber min meşî çendî kibar e  
Nazik qide dîlber pir ya şeng û şemal e  
Min gotê çiya çendî bilind e ew hejar e  
Herdem sernixûn e ew dinav fikir û mitale

Wek darê spîndarê bilind e bihewarî  
Sernizim e li ser bend û li bin hej û kejal  
Wê got ez biharim beqçiyê mîr û bika me (?)  
Koff ser me menav keç û bûkê pir delal e

Sûka min buha ye mişterî bo min dilawer  
Dîtin kî hezar zêr e ji min dem meh û sal e  
Pirsê bike jaro çîma sêvan neçinîne  
Xelkê ji te girtî pir ya şeng û şemal e

Sûka te bizî çuye nema têde buhakar  
Salê te bizîne ketî nava pîr û kal  
Lê dîsa tu Hişyarî were carekî rex min  
Serbestî di nav baxê gulan ava zelale

## **YARA KIBAR**

Yara xwe me dî çendî bilind û bextîyar e  
Ber min de meşî çendî şepal û pir kibar e  
Qet mîzenekir bi alê min de ew çavxedar e  
Min gazî dikir ey dîdiyê çehvê xemar e

Şefqet te nekir ser min birîndarî bê zar e  
Rehmê tu bike carek li ser bindî bêçare  
Go şerm û fehête me ji van dostan û yar e  
Hem tirsek ji yezdan gunehek ser me bibare

Min gotî gune nîne di sûka evîndar e  
Şer`a mezhebî eşqê dibêjî çar kenar e  
Go fitwe te dî erceh tu nîne wî midar e  
Min go min dî ye qewlê qedîm bo dost û yar e  
Wî gotî bi min qewlê qedîm xewn û xeyal e

Derbuye ji qamûsê feqîyan wî medar e  
Peymanek ji yarêre dida bendê Hişyar e  
Ev qewlê qedîm sûke evînde nezirar e

## DÎLBERA RENG BEXTRÎ

Dîlbera rengê xurman hat didestê wê cilik  
Bextrê meşîya bibal min çahv li wê bûne pilik  
Nêzikahî wê li min kir gotî min ey bê nimik  
Ma tu dîlber nabînî jêre merasîmik bik

Her kesek patek didî jê re hebîbe çahvbelek  
Amin digot jê re li min negire şepale wek melek  
Ez bê huşim serxweşim aşiqê wan zîlfên xelek  
Çeknasê zêran tunînim ne didest min de mihek

Ez nizanim ez li ku me ne Hişyarim ne xewek  
Tête çahvê min bi carek saet û çax û demek  
Wê şepalê miskê xalî ser perîyê nûnê dalî  
Got evîndarî xîyalê nuwe gihiştî lê newek

Min şepalê bisk û şemalê dîm dirî gerdan şemalî  
Evîne derd û bela lê tîr li dil da her şevez  
Xew ji çehvên min beav be dame ber penc û kilab e  
Gotî Hişyar dem xirabe rev tu nîne nebzek

Dîlbera şêrîn kelamê ez xulamê xwoş xiramê  
Nazike îywan meqamê berda dil tîr birk

## **ŞERBETA LE'L Û GOTINA**

Şerbeta le'l û kilamê min vexwarî bi dizî  
Tewafa ruknê yimamê xweştire jê bûm tijî  
Der ji le'lên te dibarin serde danî orjî  
Badîya 'eqjî bi hevra me vexwar û ket mêtî (?)

Serxweş û sikran dimame çok û destê min hejî  
Mame heyran û perîşan û biyanî serde jî  
Çû ji destê min hebîba pir ciwan û sorkejî  
Rengê gulnar e biharê ew li bircê tijî

Hatî dîlber min nedîtî ez bêhişbûm got xwezî  
Hişyarî derdan nedîta te di halêqirêjî  
Feleka bêbext û dijwar çerxek lê da û lezî  
Qedera min reş gerîbû herdu çehvîn min rijî

Dinya bû tara bêjingê ser serê min de gerî  
Çerx û dewrana dinêdewra min vajî dihejî  
Hişyarê xem û kulanî tu ne saxî ne mirî  
Nebe malê ne xizanî elacê nanê rizî (?)

## **EGER FERHATBIM TU ŞÊRÎNÎ**

Eger Ferhat bibim b te Tu şêrîna bilind bazî  
Li şerqê avtab reş da Ji ber şerma te şahbazî  
Stêra Qirixê der da Şepalê gul'ezar nazî  
Şemala xwe bilind dada Li bircê girtî perwazî  
Temaşa kir li min erde Hebîba min bidilxwazî

Digotî min kul û derda Neke bar tu belengazî  
Temen nîne bikir birda Felek tête qelû bazî  
Divê dewrê nekir feyde Hişyarî bêmefer razî  
Bê pergalê bese berde Vê rîka çewt û nesazî

## **BERSIVA BI YARÊ RE**

Bi yarê re yarî me kir Yarî xweşe pêre me kir  
Ber mezin çeşman dil vekir Min jê girtî şehd û sekir  
Dîse min pirsê jê dikir Bersîv dida min dey nekir  
Bijangê çahvan wê vekir Pêre dilê min xweş dikir

Konê xeman min radikir Her du çeşman min xew dikir  
Dilê nexwoş rehet dikir Hişyar pîrozî lê dikir  
Dilê evîndar radikir Cejna mezin jêre dikir  
Dîlber dîdarê jêre dikir Miradbexşî bo dil dikir

## **Ey Û RÊKA MIN TU NÎNE (?)**

Melca min tu nîne lew dikim qêrîn û zarî  
Qelbê min şikestî ew xezandare bi hewarî  
Şiklê min bihare lê dinav agir dîbarî  
Çara min ci ye dostê dilovan were darî

Dermanek Hekîm Loqman bidî vê êşa sarî  
Derdê di dilê min de herî lat û zinarê  
Wê hûr hûr bibî rengê bixûrê bête xwarî  
Wek can û dilê min dihelê ew jî neçarî

Hişyarê kul û derdan evîndarê bi yarî  
Sebrê bikişîne wek te çêbûne bi hezarî

## **ŞÊST SAL LI MIN BUHART**

Şêst sale li min borî dilê min wek bihar e  
Yek bêhnî ji bîra min neçû ew dost û yar e  
Rismê wê di dil de bext û xal ew dîyar e  
Neqşê xwe neqişnê di dil de gulbihar e

Dil kirîye ji bo xwe erş û paytext û sera ye  
Kursî lê danîbû ew hebîba bextiyar e  
Dem jê re bi şahî li wê pîroze şadî  
Sultana evînê ew di baxê gul`ezar e

Wê bi cewr û cefayê darê sultan girtî bo xwe  
Hukmê xwe dibarînê li ser miskîn û jar e  
Qet rehmê nekir balte di nîv dil de vedaye  
Dil buye birîndar rehetî jê re bêçare

Hatif kete goh tu Hiûyarê xem û derdan  
Dengê dîlberê bû got tu hatî ser sera re

## **YARA DI BIRCÊ DE**

Mi dî yarê ji bircê wek meh û roja zelal der bû  
Bi xemla kincê çox û doq bi zêr û bazarinê zer bû  
Şevek tarî weî heyva di çardan de li min wer bû  
Stêrên heft seyare li dora wê mehê gur bû

Ji ber şewq û şemala wê cîhan tevde seraser bû  
Pirava rodîna yarê bijoktorek biraber bû  
Bi wê xemlê bi wê xêzê di rengê cam û mermer bû  
Xwe rapêçe ji bo cengê bitox û al û leşger bû

Bi remza wan mijangan tîr li min da xwîn li min der bû  
Yarê Hişyar kirî nîşan bi şûr û gurz û xencer bû  
Bi derba tîrê qewsînan dil û can tevde kir kir bû  
Li min rehmê nekir zalim rihê min jê re mînder bû

Bi hêvî me ji te canê rih û canê min ebter bû  
Nema tehmul dikim carek nema taqet bê nefer bûm

## **DERÊ MEYXANEÊ**

Ez çûme derê meyxaneê  
Min dîtibû dîlber  
Nazdarî li min kir esmerê  
Hat min rengê ejder

Min gotî çîma gêj dimeşî  
Tirsek didî rêber  
Ez rêberê Kurdim esmerê  
Hat min rengê ejder

Ez şûrê ji almasim werî  
Ezim şûrê heyder  
Can û rihê xwe ez dikim qurban  
Kurdistana zîbir (?)

Em iro di çaxê qelemê  
Pirsîyarî bike her  
Xama qelema şer pê dikin  
Nav gerdûne piror (?)

Hişyarim li ser deşt û çîyan  
Zanim çi dibê der

## **EZ Û YARÊ BÛNE TEMAŞA**

Ez û yarê ji hevra bûn temaşa  
Ne wek Mecnûn û Leyla bûne haşa  
Min dîtî gel dir û dîna te yarê (?)  
Kesê wek min bibînî nabê şas e

Gulistana gulê cûrî li ruwê te  
Wekî baxê îrem bû mîr û paşe  
Ji wan çehvên direş ser tîr dibarin  
Wan dil kirkir wekî qelemtraş e

Dilê xemgîn dikê zar û hewarê  
Kesek pêve nabê kuştî belaş e  
Birûskên nava ebruyan ji remzan  
Wekî birqê li min da bûme laş e

Ji rebê xwe te tirsek nîne yarê  
Te Hişyar kuştîye bêheq nebaşê

## SERÊ TÎPA HEBÎBA MIN

Tîpa li serê navê hebîba min elîf e  
Tebrîke bi navê zat alî pir zerîf e  
Ala e li ser kon û mekan erşê menîf e  
Têda ew nivisî nav û esmanê şerîf e

Tîpa duduwan mîm e hevaldarê elîf e  
Newroz û el celal e çêbû jê dre û qedîf e  
Tîpa sisêyê ya ye bi xişme him effîf e  
Rengê pir ya nava bihiştê pir şeffîf e

Ew tîpa li çaran nûn e rohnî da birêve  
Çil rojî di zik masî de man we bû xelîfe  
Tîpa dawîyê ha ye bihaâre bû şerîf e  
Lewra dawîyê navê xuda ha ye letîf e

Hişyarî pejindar pir ya te pir elîf e  
Wek darê bibêhne lê ji bo te ne helîf e

## **HEBÎBA NAZENÎN**

Ey hebîba carek li min mêze bike  
Rûgeş û him devkenîn sipasîyek bo min bike  
Qet xirab nabê zemînî ser cîhan dil geş bike  
Can û dil bûye birîn carek were derman bike

Dilevînim dilevîn ey dîlberê rehmê bike  
Mûma dil bûye birîn were bixoşî aştî bike  
Hal xirabim wer bibîn temaşa halê min bike  
Feyda doktorek hebitin bête min derman bike

Ayeta Kursî û Yasîn ser bixwîn falê veke  
Hesabê ebcet derîn tîpa navê min yek yeke  
Ji dehan neh jê derîn pê keşfa halê min bike  
Taliê se`da şeref belkî bo min peyda bike

Yar dibê Hişyar bi min dermanê te sebrê bike  
Tê bi miradê bigihê dîsa divê sebrê bike

## **XEZALA DELAL**

Ey delalê çahv xezalê Ruh û canê min li balê  
Rûgeşê rengê gula lê Wek meha çardan şemalê  
Mûm û qendîle leyîlê Ruh û canê min li balê  
Xwezîya bi çaxê kemalê Wek rîhana bal newalê

Hişyarê derd û bela lê Hingê dîlber dêt li malê  
Şimşekâ cejna helalê Ruh û canê min li balê

## **AXIFTIN BI DÎLBERÊ RE DIXEWDE**

Di tarîxa duhezaran di çiryayê deh û yek de  
Wekî xewnê şevan min dî hebîba xwe pirî xende  
Di wê hingê xilûmatên reş û tarî bû ser min de  
Wekî ewrêñ biharê ew dihatin ser kul û derd e

Midî hatî hebîba min şewqa wê hat li ser min de  
Ji rodîna hebîba min mi gotî qey şeveq hilda  
Di çaxê serfişan bûm ez digotin lawikê qende  
Dema min yar bi çahvan dît wekî bilbil likul xwende

Min got ey rehbera şêrîn şikir barîn li min bende  
Ji lêvên te şekir barî dema hatî bibal min de  
Belê can û ceger sohtin bi wan remzên çehvên rind e  
Mi gotî ey hebîba min rihê min çû bese berde

Were rehmê bike carek ji bircê derbibe hirde  
Bi wî zarê teyî şêrîn canê min xweş dibî ji derde  
Dil û can û rihê min çû esîrî qeyde û bend e  
Ez Hişyarim hebîba min nexweş nav cî û perde

## **AYÎNA BILBIL BI GUL RE**

Dil miqabil dil nebî  
Xemgîn him sêfil dibî  
Ronik û zewqa hebî (?)  
Wê jehr û êş her têdebî

Bilbil texma gul nebî  
Wê kul û derd lê zêde bî  
Lê belê nêzîkê gul bî  
Wê di eşq û kêtfe bî

Gava gul hember bî  
Sikran û him serxweş dibî  
Eqil û hiş pêre dibî  
Lew bê medam û mîze bî

Qareqar jê çêdibî  
Weqtê seher him sebhe bî  
Bendewarê gulve bî  
Çaxê ku roj nû hildibî

Tamara xew çêdibî  
Ser herdû çehvan mest dibî  
Daxwaza wî jê dibî  
Lewra ku har û dîn dibî

Mîslê Hişyar lê dibî  
Bê cîh û war jar dibî

## DÎLBERA ÇAVREŞ

Ew kakilên çehvên direş  
Cepha meha çarda ye xweş  
Xalêñ li dêm rengê hebes  
Mixabin perde û humda kir

Sed tif liser wî perdehî  
Ser rû dîne padişehê (?)  
Husnû cemala wê mehê  
Mixabin perde wunda kir

Ew çahvxezal û xêrguhê  
Qamet elîf darê nehê  
Enî û dêm û rû mehê  
Birê xweda min mîzekir

Tîrêñ ji remzên çahvên reş  
Şox û şemal û bîhna xweş  
Geziman reşandin pênc û şeş  
Can û ciger min perçekir

Paşê bi nazî meşîye  
Rengê kubarî hatîye  
Misk û zibad jê weşîye  
Destê xwe da min toqe kir

Ahîn ji destê dîlberê  
Şêrîn meşî reng esmerê  
Şewqa xwe dabû her derî  
Çehvê me bin lingê xwe kir

Dîlber kubar û him pir hêj  
Dil min birîndar kir ji mêt  
Rû ma libin pîyane hêj  
Zêde li min delalî kir

Ew awirên tûj bi keder  
Birq û birûsk jê hate der  
Sotim dikim ah û keser  
Derman me kir feyde nekir

Ev pêncî sale bir şikan  
Bir tîr û derbêñ lewleban  
Zilma ji destê dîlberan  
Kuştin û talan serde kir

Umrê mi şêst û hefte dil  
Ji hicrê soht û kefte dil  
Vê salê dîlber dîtî dil  
Jana di dil de zêde kir

Dîlber min dîtî ser sede  
Sala hezar û nehsed e  
Notî jê deyne ser sede  
Ji mîladê Mesîh vêkre

Destê min girt û bernede  
Tîrek li mîlakê mede  
Guvaşt û xwîn jê bernede  
Rehmê li min carek nekir

Hişyar ji dest nazik bixef  
Tîr dane dil her çar teref  
Can û ceger kirfye hedef  
Şenqar ji seydê pêde kir (?)

Şenqar dilê ketîye kemîn  
Seyda hebîba nazenîn  
Cerhêن bi xwun bûne birîn  
Seyad dîbin destê xwe kir

Cerhêن bixwun bûne telef  
Axift birîn lê buye kef  
Dil hate şûştin wek sedef  
Erşê xwe ser dilde vekir

Xêr û xweşî bo min nema  
Xişma bi dest û qelema  
Rim danî dil bê merheme  
Dîsa bi awayên xwe kir

## **QÎZA KELEŞ**

Wexta ciwan bûm qîzek keleş bûm  
Rengê rîhan bûm wek gula geş bûm  
Jibihna mîskê bêhtir bihnxweş bûm  
Di nav keçan de ez hibrî reş bûm

Çil û çar kezî nav milan hej bûm  
Wek marê şivîn bêhtir bihiş bûm  
Singa minî gewr berva qelş bûm  
Ji zozana jor bêhtir biqes bûm

Bejin û bala min dara kefş bûm  
Bi jimar ez metir û heftê û şeş bûm  
Hişyar nedîtim gula binefş bûm  
Dawî giha min gelek bextreş bûm

## **YARA SEYRANGAH**

Ez û yarê sehergahê  
Bi hevre çûne seyranê  
Sitem danî li ruh û can  
Dilê min ma di zindanê

Bi dilek çûme yara xwe  
Bi şîva naz û rîhanê  
Wê guhdarî neda min qet  
Doza min ma li diryanê

Digote min gunehkarî  
Ji bil doza Kurdistanî  
Xebata zor nekir carek  
Ji bo doza Kurdistanê

Min got jê re ez Hişyarim  
Heval qaîdê kalim  
Ji bo wî herdem dikalim  
Wekî dînê li dîwanê

Heta nemirim ji bîr nakim  
Wekî totê ezê bankim  
Ezê bêjim xelas nakim  
Ew çû Mesûd ma li meydanê

Bav û kalê me Kurda bû  
Sed ew xerbî ji mecda bû (?)  
Giha Qazî pê re kar bû  
Rex Şêx Seîd bi mîvanî

Me gazî kir Kurdistanî  
Ji bo te dînî dîwanî  
Xebat û kar gelek danî  
Ji xeyrê hepis û zindanê

Me danî bû rih û canê  
Ji bo Kurd û Kurdistanê  
Bi risteka te Berzanî  
Rêkek rast û dirist danî

Me girtî vê rêka hanê  
Me daye sond û peymanê  
Naberdin rêka Berzanî  
Bi îmanê bi Quranê

## DÎLBERA CIGERPOLA

Dilbera şewqa ji heyvê carnan bêhtirî  
Dil ji pola ew qewîntir kevirê seb hişktirî  
Rû meha çarde dibînim perdeyê carek helî  
Şewqa xurşidî mibarek wê hilî danagerî

Lew ku şermende ji husna te nikarê vegerî (?)  
Me`dena husna nikaran dir û cewher çêirî  
Sala nehsed sî û heştan û hezar jî li berî  
Min di koşka dilevînan dîtî dîlber buhurî

Wê ji hingêî nehsedan û not û çaran dil birî  
Kir esîrê evîna xwe heps ş bend û qeydkirî  
Gotî min ey bendî dildar ma tu çawa dinêrî  
Ger tu Ferhat bî ji bo min ez Şêrîna ferwerî (?)

Zehmetkêşî dilbapêşî min ji doja seqrê (?)  
Hişyarim dil bi hoşim serxweşim narê zerî  
Çûme koşka dilevînan wê dawîkî li serî  
Pirsîyara dîlberê kir gotin min ew safirî

Li ji kuve kes nizanê çûye lê wê vegerê  
Mame heyran û evîndar hêl û çokê min mirî  
Qerimîm mame li erdê bûme ebdalê dirî  
Hiş û aqil min nema rengê dîwan û serseri

## DÎLBERA ŞOX Ú ŞEPAL

Ser wa rengê dîlberê  
Şox û şepala min tuyî  
Wek gula zêrîn zerî  
Şewq û şemala min tuyî

Heyva çardan esmerî  
Dildara mala min tuyî  
Dîlberê ey fenerê  
Çare û umîda min tuyî

Bexçê mîran gulperî  
Xemş û xezala min tuyî  
Tu ji dilê min naderî  
Şem'û ciraya min tuyî

Piştä perdê tu derê  
Sersal ûcejna min tuyî  
Xet û xalêñ perwerî  
Dilsoj asina min tuyî

Bi qerarim xawerî  
Şerha hewalê min tuyî  
Cepherojî dîlberê  
Kesk sor û zera min tuyî

Zêr li dêmî serwerî  
Tim badenûşa min tuyî  
Qed û qamet nazdarî  
Qenc û delala min tuyî

Bendewarim zû werî  
Dermanê derdê min tuyî  
Soz û peymanên berê  
Hişyarê dilcanim tuyî

Mam bi derd û keserê  
Ê bersîvê bide tuyî  
Mam di qeyda qederê  
Mifteyê qeyda min tuyî

Bike carek nezerê  
Her heyvgeha min tuyî

## DÎLBERA WEK FENERE

Ey dîlberê ey dîlberê  
Ey şepalê ey fenerê  
Wekî berxê çavreş werê  
Ji zozanê şêrîn serê

Wer biçêre wekî berê  
Avê vexwo ji kewserê  
Kêfê bike wekî berê  
Li serayê herê werê

Ey dîlberê taqê zerê  
Rohnî da qesra çeperê  
Ala kesk û sor û zerê  
Hilda li Saraya Hewlêrê

Lê xeydoka qoze qerî (?)  
Ez dixwazim tu vegeŕî  
Kêfê bikin nala berê  
Ez çi bikim naête ser rê

Tu bû enqa ew şenqerê (?)  
Firî çû Qesra Teterê  
Çiqa min pirsî li kêrê  
Qet nebihîstîm xeberê

Ez ketim qeyda qedere  
Heşê min çû ma li berê  
Li dû çûm çemê kezerê (?)  
Dikim nakim navegerê

Bi sond û peymanê berê  
Bi wan sozên mîrê berê  
Bi wan ahîn û keserê  
Bendewarim weka berê  
Xewa çahvên min da derê  
Hişyarim heta seherê  
Çahvlirê me li her derê  
Hetanî roja mehşerê

## SALA NEXWEŞİYA MIN

Di sala du hezar û yek  
Di çiryayê biharê de  
Di bîst û nehê Gulânê  
Awazê bilbil xweş lê da

Dengê şalûl û qemrîna  
Xweş tê di bax û dehlê da  
Bihara têr gul û nêrgiz  
Binefş û yasemîn peyda

Êşa xedar di wê çaxê  
Kete canê min pir zêde  
Min qesta Şamê kir dîsa  
Rex diktoran di meşfê da

Diktor Fayiz xwe rapêça  
Dûzan derxist ji dercê da  
Li dora canê min çû hat  
Bencê lêxist di piştê da

Ji gurçikan wî destpêkir  
Eseb rakir ji qurmê da  
Hişyar mêtzekin didim bo te  
Xêr û xweşî têt birê da

## DÎLBER BAXÊ HÊŞÎN

Dîlbera rengê wê gulinara hêşîn  
Ew di baxê gulezaran bû hêşîn  
Baxê mîran gul zêrîne xem revîn  
Di nesîmê sibehê bayê evîn (?)

Eqreban ser çehv û dêmê wê weşîn  
Zilf û xalêñ wê li ser cebhê lezîn  
Baweşîn kir ket semayê zilfê çîn  
Wek meha şewqa wê bin ewran meşîn

Nûn û dalêñ wê di eydan de me dîn  
Ger nebûna meh ji helalê çi divîn  
Yar bi xemla xwe dihat gewde lê birîn  
Şahneşîna aşiqan de te dibîn

Min go yarê ez Hişyarê dîlbirîn  
Ey saha şahan dil û canê min helîn

## **HEBÎBA DIL**

Hebîba dil ji min sotî Evîndarê te me dîlber  
Jîna her deman geş bû Bi dîna te aya dîlber  
Ji te bêhnê dîbarînê Didê mîskê didê gulzer  
Tu Belqîsa Silêmanî Dinav baxê Îrem da der

Çîya û deyşta te şewqa Daye jor û behr û ber  
Dîyar û hêş û darê te Bilindin her dem û her dem  
Xezîna zêrê reş der bû Ji bin payê te wek ejder  
Ji bona te her ro ceng e Di gerdûnê tevan serser  
Ji bona te ez Hişyarim Dibînim bo te herdem şer

## EVÎNDARÊ TE ME

Yarê ez evîndarê te me Gulzara dilanî  
Jîna min bi te gênc e Her çax û zemanî  
Rengê te Gulîstana Îrem Rohnî da li banî  
Çêtir ti ji Belqîsa hukumdar Ser erşa cîhanê

Rodîna te yarê meş`ele Daye her mekanî  
Fecra Leyletulqedir bi şewqê Rengê te didanê  
Tu meha çardanî yarê Extir dorê danî (?)  
Hişyar bi yeqîn ber Biryarê te danî  
Î`damê li ser xwendî Wî da ber nîşanê

## KURDISTANA ZÊBIR (?)

Kurdistana zêbirî xewn û xeyala kêtî tu  
Destê dujmin ma li serê xemş û xezala kêtî tu  
Melûl û jarê birî destbestegaha kêtî tu  
Kurdên çak girtine rê hingê çûna kêtî tu

Ez birîndarê berê dermanê halê kêtî tu  
Hukumdara Teterê Berberî xwşma kêtî tu  
Beske zulm û xedrê tu dilqewîna kêtî tu  
Meke xişmê li serê jaran rêzdara kêtî tu

Xwînşêrîna esmerî herdem li bala kêtî tu  
Heyva çardan nuwe derî şewqa çiraya kêtî tu  
Rohnîdara fenerê sîmeserpoşa kêtî tu  
Abike rehmê zû werê dilêşa derdê kêtî tu

Hişyarê derdê berê hekîm loqmana kêtî tu  
Derman bîne wer serê merhema canê kêtî tu

## **EZ Û KURDISTANÊ ÇÛNE REX CANÊN QENCAN WEK MEM Û ZÎN**

Ez û Kurdistanê wek teyrê kevoka sipî  
Geh dixwînin geh dibazin difirin wek bazî ye  
Em Diçin Birca Belek balê Cezîra Botî ye  
Em li ser erwahê qencan digerin bi rastî ye

Li Mem û Zînê dipirsin li Tacdîn Stî ye  
Mîr Zeyneldînê serokê ser temamê Botî ye  
Me pîrsîbû li Çeko Heso jê birayê wî ye  
Me gotî ey perwerên Kurd serokvanêñ Kurdî ye

Temaşa kin mîzekin li halê şehr û gundî ye  
Tev dibin destê stemkarana bin darê faşî ye  
Digotin me doza we rex Kor Mihemed mayî ye  
Çûne rex wî got Bedirxan Mîrê Kurdistanî ye

Tevda raya xwe kirin yek berê me dan banî ye  
Ehmedê Xanî Feqê Teyran Melê Cizîrî ye  
Mewlana Xalid serokdarê terîqa Neqşî ye  
Şêxê Nehrî Seyid Elî Şêx Şabedîn li dû wî ye

Şêx Selîm û Şêx Seîd û Şêx Mihemed Qazî ye  
Civata wana digerîya dora heqê Kurdî ye  
Çûne kongira Bazîdê nav şehîdê heqî ye  
Civata wana digerîya doza heqê Kurdî ye

Me got erwahêñ mezheb bi rica û hêvî ye  
Hatine ber dergehê kongra we yê rengî ye  
Bir birêve hêvidar bî bona gelê Kurdî ye  
Gel ji bin destê neyaran zû bibê azadî ye

Ayet nêzikê mehrebane bo Kurdan diaçî ye  
Kaxidê dewra Kurdistan tevda tesdîq kirî ye  
Şandine cîhê qebûla Mihrîban heskirî ye  
Em ji Yezdan hêvîdarin bi destê Berzanî ye

Azadî ji bo Kurdistan bête çaxek nêzî ye  
Derdê Hişyar wê herê ew roj dibêcejna wî ye

## KURDISTAN

Heftê sal çav digerînî Rohnîya çehvan namîne  
Kurdistan jê dinalînê Dibê Kurdo tu nabînê  
Neyar girtim dikim şînê Birca Belek ji ku dimînê  
Qeydkirî me dikim şînê Ji sersalê ta havînê

Bi dilsojî bi evînê Divê vê barî helînê  
Min gotî rêça evînê Derman bit şûna birînê  
Min dil azadî bibînê Em tev herin şahinşînê  
Hişyarê derd û birînê Dewra azadîyê dixwînê

Serxweşbûna ji bo jînê Rahêje çek û dûrbînê  
Koledar çara namînê Li ser gel sitem namînê  
Pêşmerge peyman datînê Yan Kurdistan yan nemanê  
Hingê em bibin şahinşînê Kurd hatin rokê zemînê

## QÊRÎN Û NALÎN

Hişyar bese bike qêrîn Ji cergê xwe dikî nalîn  
Ji destê dîlbera narî Bi vî rengî emir dabû  
Hebîba dilweşan min dî Bi dest da xencerek Hindî  
Dilê min kir nişan çendî Di wê çaxê şefeq dabû

Min gotî qey gunah nîne Stem danî li miskîn e  
Dilê xencer lê daîne Di nav xwînê de mabû  
Kesê dostê me xemgîn bûn Bi êş û derd û dilkîn bûn  
Heçî dujmin pê razîbûn Kesê dilreş bi wê şah bû

Kurdistan rengê şahî ye Li textê kesrewan ma ye  
Bi îdam bi rêberan daye Ji bona min xişman mabû  
Bedîlê min gulê rakir Birînê dil de dîyar kir  
Cîhê xencer lê xwiya kir Ne xwend û ne cewab dabû

Erzuhalek xwe nûve rakir Bi destê dîlberê da kir  
Wê xwend û dilê min şakir Ji le`lan dirik peyda bû  
Digot Hişyarî min zanim Ji le`lan merhemek da min (?)  
Birînê kul re dermanim Bijîkek rengê Loqmanim

## **ŞOX Û ŞEMALA DÎLBER**

Serwe rengê dîlberî şewq û şemala kêtî tu  
Qolana zêrîn û zerî tu dilkişîna kêtî tu (?)  
Dîlberê ey jiberê xemş û xezala kêtî tu  
Ketim qeyda xedrê berberê hukmê kêtî tu

Ez birîndarê berê dermanê halê kêtî tu  
Sirê hilda zû werî tu şahlewenda kêtî tu  
Bi kirêdarê qederê ma tu Belqîsa kêtî tu (?)  
Hukumdara Teterî berberê xişma kêtî tu

Biska xişmê li serê jaran rîzdara kêtî tu  
Meke zilm û xederê tu dilqewîna kêtî tu  
Qereqûşa herderê tu îdamdara kêtî tu  
Bike rehmê fenerê dilêşa derdê kêtî tu

Xwunşêrîna esmerê herdem li bala kêtî tu  
Heyva çardan nûderê şewqa ciraya kêtî tu  
Rohnîdara her derî sîma serpûşa kêtî tu  
Hişyarê derdê berê Hekîm Loqmana kêtî tu

## **KURDO ZÛ RABE**

Kurdo zû rabe te ez bihîstîm (?)  
Bûka cîhanim ez bi dergîstîm  
Ez Kurdistanim bêkes ez hîstîm  
Çokêm qerimîn bin lingan hîstîm

Hişyar hewar ke tê negihîstîm  
Neyar giha min bîzor ez girtim  
Dilê min vekir ji can derxistîm  
Zêrê reş derxist biyanî hîstîm

Wek zîyayê reş biçolan xistin  
Debir û mal jî birin bê dirav hîstîm  
Belengaz û jar bê xwedî hîstîm  
Li ber derîyan mist û jar hîstîm

Sing û berê min narê her miştîm  
Bi destê çepel girtin derxistin  
Cergê mni sohtin ji dil birijtim  
Namûse Kurdo bi zor raxistim

Girtim bi qeydan ez ne serbestim  
Xewa çehvan çû ez nenivistim  
Zora min çuye bi derban kuştîm  
Hişyar gazî ke hêñ nehilistim

## QUESTA DÎLBERÊ

Esta dîlberê kir li serê Min dîtî li bircê bû nêrî  
Dilê min ji canê min firî Dîber wê li semta min nêrî  
Got Hişyarê min difikirî Derdê te çi ye bêje werî  
Min got rohnîya çehv û serî Ey padîşaha eşrê serî

Dildarê te me ey gewherê Tu dirî tu cam û fenerî  
Got sozê didim nalebirî (?) Dildara teme ez mişterî  
Sozên ku me dabû berderî Deh qatê bi zêde wek berê  
Ez çi bikim çi bêjim qederê Nahêle evîn here serî

Diktorê Îbnî Sîna werê Dilê min ji singa min derê  
Kirkir wê bikê bi xencerê Xeyrê evînê nakî derê  
Peyman ez didim peyxemberê Terkî nadim ger rih jê herê  
Hişyarim di dilda sequerê Sohtim ji pîya ser ta serê

## DÎLBERÊ MESTIM

Ji eşqa dîlberê mistim hebîba xemrevîn kanê  
Ji nava dilde ez sohtim nedîtin bo min dermanê  
Wekî min sed hezar kuştin nedî leşger li meydanê  
Dibêjim sehra ha rûte wiya îlmê Sileymanî

Yan jî remzên çehvên yarê dil û can birine talanê  
Yan jî îlmê wesfê girtîye ser hukmê cîhanê  
Yara min ew şewx û şeng e navê wêne Kurdistanê (?)  
Dibêjin berze bo hîştim gul û çoyê Hemedanê

Yan çû banê Şerefîdînê li Mûş û Erzirom danî  
Bese xişmê bike dîlber li me jar û esîranî  
Bese Hişyar te xew nayê ji êş û kul û derdanî  
Te rih û can li ser danî bo wê ye çaxê serhildanê

Kurdistanê evîndarim dilovanim ji bona te  
Bendewarê hebûna serxwebûna miletê te  
Gelek min da li rêça te divêm bigihême bala te  
Xewa çahvan ji min dûr bû ji metal û xeyala te

Xeyala te li ber çahvê mine mirdim ji bona te  
Li goh û deşt û behran ez gerim bo bejin û bala te  
Evîndarê te me dîlber tebat nîne ji eşqa te  
Nedî min kes di temtîla qed û qamet û bejna te (?)

Cîh û warê min nîne dîn û sewda me ji bona te  
Dil û canim giriftare ji remzên her du çahvên te  
Kirin te ew pir çalakin wekî şêran li doza te  
Bilindin pehlewanin ew li ser deştan û kohêne te

Dilsojin dilevînin ew ser rêç û ava erdên te  
Rihê şêrîn dikin gorî bi erzanî ji bona te  
Kurdistan tu rindî ez nikarim bêjim pesnê te  
Belê buka cîhanî sîma ser tacan ji rengê te

Milûk û kesrewanan sîma ser tacan bi navê te  
Di çaxê kalîn tê meydê nixwûn dibûn ber lingê te (?)  
Dinivisandin li ser tacan bi resmê dana emrê te  
Şefeq derde serî hildabû çaxê serxwebûna te

Hişyarim ez li rê karim di cejna serxwebûna te  
Felek bigerim li gerdûnê libin lingan ber heyfa te

## TARÎXA BIHARÊ

Di tarîxa bihara çaxê can bûm  
Tu jî rengê bihara koh û kaş e  
Di jîna me nedî xweştir ji hingê  
Ciwanî û dilanî man li paş e

Nizanim derdê me çima li paş ket  
Wekî bextê me çêbûye sewaş e  
Li vê dewrê jîna me pir bidûr ket  
Hemî sûcê kesê gotin me şas e

Vê rîka dil we girtî bi serfîrazî  
Di çaxê we dilovanî nebaş e  
Em îro bûne kalikê heştê sal  
Nema karin bikin xebata baş e

Yara min Kurdistane herkes dizanî  
Dibê Hişyar neyar kuştım bûm laş e  
Heger kalim welê dilê min can e  
Qelem bigirim wekî qelemtraş e

Kitêba ez binivisînim bi rastî  
Beyan kim sitemê wek berê aştî  
Go hatin ser gelê Kurdî bijanî  
Ji kul û derd û sitem tevda bilaş e

## AŞIQ Û MEHŞÛQ BI HEVRE

Aşiq û mehşûq bi hevre ew li darê meihbetê  
Wekhevî bin dilbihar bin dilevîn û dilketî  
Xwe biparêzin ji enwaê gunehkarîyetê  
Ji evîna mecazî derbin bibel heqîqetê

Ew meqamê hezkirî jê xwuda bal qudsîyetê  
Pir bilind e nagihîtê her kesek bê xidmetê  
Ew evînek egera dinya de qehir û zehmetê  
Lê dilovanî ji Yezdan jê re tê di axretê

Em ji Yezdan hêvîdarin her zeman û saetê  
Ji Hişyar re evîna heqîqî bikî qismetê  
Bi hevalê salihan re di roja qiyametê  
Serbilindî bête heşrê misteheqî çênebê

## AŞIQÊ GULÊ

Nazika sogul tuyî ez bilbilê mistaneme  
Reşika nava gulê ez aşiqê dîwaneme  
Perîya baxê cemalê ez Ferdewsê baxê me  
Ger tu şem`î tu çiraî bona te perwaneme

Xwe disojim bi şemala dîlberê qurbaneme  
Mehr û mahî padîşahî ez jî gulxaneme  
Cepha rengê avtabê sîma serpoşaneme (?)  
Ger mestê mey engurî xanîyê meyxaneme

Dîlbera şahnazê îro birc û perwazê teme  
Ger rihê şêrîn bixwazî bin emir û destê teme  
Bin emrê drgahê şahimxidmetkarê dergehê me  
Berberê şahim ci deynî hazırî fermaneme

Sekinîme ez di ferman canfîda şahaneme  
Hişyarê eşqgezarim ber emrê şahaneme

## ŞEHLUNDA ŞÊRÎN (?)

Şehlundabihulwî şêrîn kelama kêtî tu (?)  
Qendîla birca belek tu rohnîdara kêtî tu  
Min bidîta dema ser bircê qametgahî tu  
Wê demêcejna minî pîrozgehek daba min tu

Çax û salê min buhurtin şefqetek neda min tu  
Her li ser jar û esîran sitemdar û caf tu  
Ji xwuda tirsek te nîne cergê Hişyar sohtî tu  
Şev û rojan ketîye pirs û suala bo to

Wê dema sala wê salê gotî min Hişyarî tu  
Sersalacejna mezin çêbuye bo min û to  
Eyda herkes badîyan noşî dikin wek min û to (?)  
Lê belê badira heqîqî noşîdara minî tu

Sala sî û du hezaran û siltek bo min û to (?)  
Şahînşîna wek bihiştê çêbûye bo min û to  
Bawerî çênebûbû min wek dixwînê ez û tu  
Çaxkî gelek buhurtî nazdara minî tu

Ez gerîyame li cîhanê pirsîyârim bona tu  
Ev sala rengê buhuştê lê rûniştî ez û tu  
Eyd û sersale bi rastî digerînin ez û tu  
Hişyarîm keasa medamê dinoşînim ez û tu (?)

## **KURDISTANA ŞÊRÎN**

Ey Kurdistana pir şêrîn  
Dermanê derd û dilbirîn  
Ta kengê bin destan bimîn  
Qada neyar ser te digerîn

Milet bese rabin bibin  
Gelê Efriqa ta bi Sîn  
Ala azadîyê sor û şîn

Her dem bi serbestî dijîn  
Hişyar bese xwe laperîn  
Texmîn tê azadî bibîn

## **NEXTÊ JÎNÊ XWÎNE**

Birayê min jîn hatîye kirîn  
Texta wê danîn rih û can û xwîn  
Ka kêm dil birîn beske derd dû şîn (?)  
Welat bûye şêñ bi çek û zanîn

Gelê Kurdistan serxwebûn hildan  
Bi yek dengî dan Ala Kurd hildan  
Gotin bes razan bo mafê Kurdan  
Hişyar jî pêzan nemaye razan

Yanê Kurdistan yan jî Kurd neman  
Ev peyva Berzan bû herkes bizan

## BAXÊ GULAN

Ez çûme baxê sorgulan Dengê şalûl û bilbilan  
Dengê teyran û Qemrîyan Bi hevra awazan didan  
Pesnê yara min wan didan Yarê nav baxê sinbilan  
Bi tewx û şe`ra kesrewan Şewqa wê dabû birc û xan (?)

Roj xêrek da bi serê zeman Cerg û dilê min tev helan  
Bi kovan û derd û kulan Min fikirand li ser seran  
Ber mêtîna çehv û ebruwan Gotî min Hişyarê xeman  
Pêşmerge ketine ser çîyan Ketin warê Akincîyan

Gund û şehra dujmin stand Bazor karî westman (?)  
Hatin stand tev ji wan Berdan çewçukê Basiyan  
Kurdistanim bûka cîhan Xemil û xêzên min ser qedan  
Atlas û hevrîsmê xetan Serqed û qamet da weşan

Wek hewr û eynê perîyan Tişbê Zîn û Stîyan  
Toxa li ser pûşî veşan Qed û qamet ser wa ziman  
Kember ji zêr lê wer giran Li birca belek tev lê civan  
Çeng û pirik ji Kurdistan Azadî bû ji çar cîhan

Ji dujminê bêbext û jan Bê dîn û bê soz û îman  
Dewra sê çengê dî ji wan Nêzik azad bit bê guman (?)  
Hingê biser bîstî û nîşan Li KURDISTAN bit şahîyan

## HIŞYARÊ BÊXEM

Hişyarê bixem dildare her dem  
Umrê bi derm buhurtî bo xem (?)  
Ka ew çax û dem ciwanî li cem  
Ka ew xwuna germ ka ew laşê germ

Ka ewrokê geş wek gula binefş  
Ka ew pora reş ka ew canê xweş  
Ka hîle keleş çû ber pêncî û şeş  
Wê bimrê nexweş wê herê ser nehş

Ka ew rengê sîm çehvê rengê cîm  
Ka ew birhû dêm xale serdibêm (?)  
Ka le`la narîn kîmasî li kêm  
Bejna herêm wesfê wê nişîm

Hêlîn ser çêkir ew mîskê lêkir  
Bejna çox lêkir tevda çi jê kir  
Gulav lêkir nav baxan rêkir  
Bazin zêr çêkir ser bejnê lêkir

Tev kîf û xweşî dema keleşê  
Bi xêr û xweşî buhurt tirşî  
Sala heftê û pênc pîrîfîya hêc  
Dorê kire sênc can nemaye gênc

Ciwanî rakir pîrî serda kir  
Dujmin pê şahkir dostan xemdan kir  
Piştî te`da kir dûvê xwe liba kir  
Hişyar wunda kir jêre xelat kir

Dîna çav rakir qirim serda kir  
Çara nema kir feyda nema kir

## DIJMINÊ WELAT

Welatê min tu her dem serfîrazî  
Di îqlimê cîhan de teyrê bazî  
Kohêن te serbilindin iz û nazî  
Dinav de av û baxêن nuh ti razî

Pêşmergeên lawêن te jîyan naxwazin  
Şehîd bin yan ji bo welat bin xazî  
Li hawirdora neyarê tazî  
Hemî gur û beraz û hirçê nazî

Xwuna dilê te mîhtin nabin razî  
Dil û gurçik jî pêre ci dixwazî  
Zêrê reş wek zîya kêşî dibaze  
Temel dujmin duxwî tev cengebazî

Komir û medenêن tebirî xerazî  
Ji almasêن caman wek şûrê tazî  
Temam kom kir ji xwer bir zorebazî  
Digel hinde defna Kurdan dixwazî

Kuştin û barkirin ji me dixwazî  
Hişyar dibî fena werin birazî  
Ji bona yekê tuyî bikine gazî  
Bêjin Kurdo bese tu rûnê ew razê

## **DERDÊ BILBIL**

Derdê bilbil her deman de ew gul e  
Şertê wê serdarê bêt ser çiqil e  
Dora wê pergê hêşîn û sinbil e  
Bilbil serxweş û sikranê dil e

Bilbil dil xwe padîşahê wê demê  
Benda xencê vebî ji nav kakilê  
Nobedara rojhilê pêre vebê  
Hingêcejna mezine bo bilbil e

Umrê bilbil buhurî çendî zeman  
Wî nedîtî pişkivî xare gul e  
Lew tebatê jêre nîne ji ber evîn  
Dil bisoje dil xemgîn û dil kul e

Eşqa bilbil ji kevnar bona gul e  
Derdê wî ew pişkive xare gul e  
Qareqar jê çêdibî nabêñî gul  
Biçe terzê vedibî ji nava dil e

Rengê wî Hişyar dinalê ser welat  
Jana eşqê pêre daye ser dil e  
Bo hevalê bilbilî jan û heval  
Derdê maşûq û gulê dan ser mil e

Deng û awazan ban dikan  
Pêra ew derman dikan dilê kul e  
Ger mirada aşiqan ew bête cî  
Cejna Hişyar û şalûl û bilbil e

Tevda awazan didin nav baxê wî  
Bi şahîyû dilgeş û him bê bela

## DÎLBERA BÛKA CÎHANÎ

Dîlbera bûka cîhane rûgeşî  
Qed û qamet rengê ser wê gergeşî  
Eqreban rengê swada Hebeşê  
Sebhîya Babê Nesîm ser dimeşê

Tevî zulfan di semaê dikêş bê  
Tevda ser dîman û xelan diweşê  
Cephe mermer dîmê gewher keleşê  
Xalên ser dîman bi rengê hebeşê

Miletê Kurd hêvîdarê serxwebûn  
Kurdistan bi rengê binevsa Laleşê  
Kurdistan bûke Dîcle û reşê  
Heskîf û Wezerîn û Şirnex Laleşê

Şîn dikî her dem kohê wê Qerşê  
Ave Koser navde xumxum dimeşê  
Subhîyan bayê nesîm têt bi xweşî  
Bend û zilfan û kezî ser dimeşê

Ser qad û qamet û gerden hereşê  
Hatin ser sing û beran tevde weşî  
Dîlber Hişyar e tev xêr û xweşî  
Lê mixabin li bin destan tireşî (?)

## **WELAT BÛKA CÎHANÊ**

Welat Bûka cîhanê pir rengînî  
Wekî heyva libin ewran dimeşî  
Rindî başî li pişt perdê dixwînî  
Belê dizanîm çiqas rind û şenî

Şahînşîna welatê Send û Sînî  
Wekî Baxîê Îrem rokê zemînî  
Ji wan çehvîn direş remzan datînî  
Swaşa pir şewat ser dil evînî

Mixabin nav pêncî dijmin dimînî  
Mehrûmê serxwebûna nazenînê  
Hişyar can û ceger tev ser danînî  
Ku carek dîtinek jî ew bibînî

## **ÇÛNA REX NUJDAR FAYIZ ABIDÎN**

Ey hevalê rast û rohnî ehlê mal û gundî ye  
Ez nexweşim dilbirînim canê min pir xeste ye  
Çûme rex Diktorê zana mîzekir bi eynê ye  
Şande mi ser kehrebayê ê ku bo derdê mi ye

Saet û sûret û deng danî li ser canê mi ye (?)  
Çendî caran wî gerandî qet nedî êşa mi ye  
Çûme rex pîrê tilisman xwedîyê îsim tekî ye  
Min gotî pîrê mexan derdê min êşek bestî ye (?)

Tu gihabî îlmê Lahût mêzeke derdê mi ye  
Gotî derdê te girane êşekî bê çare ye  
Ez gihamê Îlmê Lahût û tilisman tev dî ye  
Feyde nakê li te îsm û ne tilism û noketî ye

Êş di canê te tunîne xeyr êşa dilhî ye  
Ew jî derdê Kurdistan e zehmetî pir jê heye  
Hezretî Îsa û Mûsa bêtin hewara te ye  
Darê zora sitemkaran ew helînin ser te ye

Hingê derdê te namînê serxwebûn behra te ye  
Tê xwedî dewlet û azadî bî ser erda xwe ye  
Hişyarê derd û birîna xweş dibê halê te ye  
Hingê tê razê bi dilxweş naminê derdê te ye

## HEVAL RÊKA DÛR

Ey hevalê rêka dûr Bi durustî birêketî  
Mêzeke nêzîk û dûr Hişyarê neraketî  
Ew jana cegera sor Pêta agir pêketî  
Ew agirê gelek zor Giha mêtî û derketî

Ji pê heta ser û por Goşt û hestû ji hevketî  
Dengê nizim û gelek hûr Ji ber eyba rûmetê  
Sûka wêna çuye jor Heram helal bi cî ketê  
Zêr û perê moza sor Bê jimar ew serketî

Pere wekî marê kor Bi xwedîyê xwe diketí  
Dewlemendê hawirdor Çiqasî bê rûmetî  
Pera kom dikî li jor Hemberê bê rûmetî  
Perê deşt û kohê tor Ew têtin birehetî (?)

Ew perê tê gelek zor Dirixe bi camêrîtî  
Dibistanek gelek zor Çêbikî bê zehmetî  
Xwendevanê hawirdor Xwendin bikin bi rehetî  
Dibistana gelek zor Têde biterbîyetî

Pêra diçin dor bi dor Pirîtî ne kêmâtî  
Çê nakin meqamê jor Wek berfa av lêketî  
Çêke dibistana jor Tê be qedir û hesyetê  
Bibî navê gir û hûr Biqdir û him qîmetê  
Hişyar bixwaze destûr Bibî imanperestî

## SERHILDANA GEL

Serî rakin gelî Kurdan  
Dinya ser we xirab nabî  
Hun lawên Ristemê Zal  
Dujmin çima bi we şabî

Xwe rapêçin ji bo cengê  
Dujminê we bizav nabî  
Taliê we hatîye dem  
Dem û dewran weha nabî

Li tarîxan mîzebibikin  
Her dem wek hev ciwan nabî  
Egîdê Mîdîya hun bûn  
Dema Aşûr Hemorabî

We dinya didkir (?)  
Hember we kes hebû nebî  
Çima îro hun bindestin  
Ser xakê xwe azad nabî

Erê Hişyar serî rakin  
Ji bo gerdûn bi we şabî

## DILDARA HORÎ

Dildara sifet horî Şêst sale li me borî  
Dîtin li me wacib kir Wesilet çênebû li dorê  
Pir da wesleta hilda Dîlber rengê ferfûrê (?)  
Mehcûb ma işaret kir Xelwet li ser me borî

Meclis li me ew pir bû Gotî rihê min gorî  
Dil bimre jêre gotî Dilovanî ser wî gorî  
Hişyar dilê rencûrî Bo neh meha kir gorî (?)

## JINIKA BI RUMET

Jinika şerîf bifikire husun û cemala te çî ye  
Tazî nebe sûk û dire şerm û heya te girtî ye  
Mezin dibê jinika şerîf ber çehvê insanê şerîf  
Gava xwe rapêçî bi kincê etlas û sîm sermî ye

Laşê li derve şewq didî çahvê hezaran lê didî  
Sûka wê bêbuha dibî nav xencê bax û bexçî ye  
Şerpa çarik serê te bî dîbax kiras bî serde bî  
Gore potîn nigê tebî daxwaza mîran botî ye (?)

Manto li ser cilê te bî çente li ser milê te bî  
Rok û destê te berz bî çendî delala cindî ye  
Mezheb ji borokê dîyar destê ji qevdik jê dîyar  
Bo karê jinika pir kubar fetwa ji bo wê danî ye

Pantorê tenik li xwe dikî laş têde ew xwiya dikê  
Carek li xwe pirsê bikî bi terbîye û bê tirşî ye  
Wexta serî tazî dikî sing û beran dîyar dikî  
Çaqê sipî xwiya dikî temen namênî bo te

Gula cûrê temen buha evîna bilbil tê giha  
Bi nav û nîşanê weha gula ser meşûqa wê ye  
Şertê bilbil jê re eve gul ji dara xwe nekêf e  
Şox û şeng e ji bo teva gul sore yara gundi ye (?)

Bilbil evîndara gule gul xanima ser çiqil e  
Gava ser darê sîflê bê rûmet û bindestî ye (?)  
Hişyar gelek şîret bike fala qencî lê veke  
Gotin başe herdem bike peyvîn dirist feyde heye

4-9-2002

## JINANÎN

Miletê Kurdî bizane xweşîya te her eve  
Jîyana te li cîhanê ji vê rê dernakeve  
Yezdanê mezin ku çêkir Adembûna serxwebûn  
Emrê qudret çêkirî Hawê ji can ew derkirî

Hatina Hawê ji Adem çêneba sernediket  
Ger nehata ev alem çawa dihate serhev e  
Serketin bo te tunîne ger heval bo te nebî  
Miletim bo te dixwazim jinanîn zû derkeve

Çaxê kevnar dewra Mîdî bêhtirî herkes tu bû  
Îro hejmara te kême dewra te tevliheve  
Jin bi rastî jîne bo te ey hevalê colemerd (?)  
Lê meyzîn jê re divê bo jin û mîr nala heve

Bawerî nav jin û mîr deger nebî bo kul û derd  
Her yekê digerê bi rêka hîlebazîya xweve  
Mejdîya bona kirê adem jin anîna helal  
Debir û mal û ziçl û zarok çêdibin nala heve (?)

Ger helala to nebî hejmara dundan nayê cî ye (?)  
Donda wenda ye di nav herkesê tevlîheve  
Gotina Hişyar ji bona madena mîr û jinan  
Kêmasî têde tunîne rastî wê jê derkeve

## KESÊ BÊ DEWLET

Dîlbera bi rengê bihokê bi zerî  
Bêhna misk û zehferan û enberê  
Rohnîya şewqa rodîna te dabit  
Wek meha çarda ye nuwe daye der e

Padişaha birca ser Diçlê dabit  
Şaha ser iqlim heftan digerî  
Sed wekî Cengîz dîbin emrê tebit  
Şah û xaqanê li Qesra Teterê

Extera se`da şeref birca tebit  
Gerdişa heftan ji extir bigerî (?)  
Ser çîya û av û deştê tebit  
Pertewa ala te herkes binerî

Lawên te wek çaxê hukmê Mîdî bit  
Serfirazin di cîhana pîrozî  
Kurdistan biyeqîn azadî bit  
Ew bihişa îrmê wê jê derê (?)

Ew dilê te pak û paqij jê derê  
Îbrahîm pêxemberê lawê Azerî  
Pûtên Nemrûd perçe kir da zanibit  
Ne xwedane tevde wan rûreş kirî

Serbilindî bona Hişyar çêdibit  
Çaxê Kurdistana azadî werê

## KÎ ME DAYE PAŞ

Ez Hişyarim dilbirînim ah û hesret min dî ye  
Dax û derdê min girane bê guman jarîfî ye  
Gelê Kurdî çima nanêrî li van kêmâsiya  
Ew li bin destâ de jar e bin darê faşî ye

Ma nenasî miletê derdê li ser wî hatî ye  
Ew dibêjî dînperestî ew me bindest kirî ye  
Gelê Mîdî piştî çûbû bes navê wî mayî ye  
Miletê Kurd tête xwendin perçekî ji Mîdî ye

Wî ji hingê teqwa Îslam pîrozgahî anî ye  
Xwendkar û dewleta Kurdi jêre nehatî ye  
Bes namê Kurdi dimêni di Kurdistana rengî ye  
Nav û nîşana wî nîne nav miletperwerî ye

Kurdên bindestêneyaran sê hezar sal mayî ye  
Nabêjîm zanakî Kurdan darê dewlet girtî ye  
Lê mixabin dewleta bindestê wî ne ê wî ye  
Gava Îslam jê xwiya kir dîfî têde rastî ye

Gelê Kurdi navê Yezdan birê Îslam xwendî ye  
Yezdanê mezin yeke ew Xwedayê eslî ye  
Miletê Kurd ji ezil ve xwedî dînê rastî ye  
Wan digitî bo Xwedayê Şev û Roj yekîtiye

Bi rê Îslamê yekîti ji bo Yezdan xwendî ye  
Kurdistana nam û nîşan ew bidin qîmet lê ye  
Dînê Îslamê nebûye wek gelê Aşûrî ye  
Kurd ji qamûsa hebûnê nedimane serpê ye

Lê mixabin hin ji Kurdan rêke vajî girtî ye  
Ristke nerastîyê wan dijê Îslam kirî ye  
Dibêjin Dînê Îslamê dujminê mafê wî ye  
Ger Musulmanî neba dihat Dewleta Kurdi ye

Ji milet re xweş dikin bêdînîti sebestî ye  
Lê nerast e ezbenî bêdînîti vajîti ye  
Xwendevanin mişkî herfan û xeta nizanin  
Gava Kurdan dîperest bûn Dewleta Eyûbî ye

Lidarxistin bûne dewlet li Hesenkêf danî ye  
Sêsed û sî û çar salan dewleta Kurd mayî ye  
Destê darê wan mibarek kir dînê Îslamî ye  
Lê belê hindek ji xwendan guh nedirî rastî ye (?)

Tarîxa kevnar naxwînin da bizanin rastî ye  
Ehwalê Kurdan nanêrin çawa bû mafê wî ye  
Lewra nasnakin ev rêka qencî û birastî ye  
Ne bi îlm û rastîyê tiştê tê ber devê wî ye

Sed mixabin dane ser şopa guran û rovî ye  
Lew dimane bindestê sitemkar û faşitî ye  
Dewletên rokê cîhanê her yek bo karê wî ye  
Wan diyanet hedef nîne daxwaza wan kursî ye

Zilim tadayê dikin ser nefsa miletê xwu ye  
Bes bigehê daxwaza mal û serwet û kara xwu ye  
Lê bira Kurd zanibin ev qisa hanê i wî ye (?)  
Gava rabê dijê dîn tada digihê mafê wî ye

Lê belê Kurdo bizane qisa te bê feyde ye  
Qiseta rast û bi rohnî dest bihevdana wî ye

Êşa me êşek girane dexeşti êşa mi ye  
Bi tifaqî bi yekîti buye wacib ser mi ye

Ber bihevdû çima naçin dîn dikin derdê xwu ye  
Ez ezî çehvên wan kor kir dexeşti karê wî ye  
Gava merdek nava Kurdan çak û mîr û zanî ye  
Pîlanê dujmin dinasî zanî kar û fêdê ye

Bi hezar çehvan dinêrin tev dibin dijê wî ye  
Hezar heymen serdidêrin li ser wî karê wî ye  
Eve paşketina Kurdan her xesaret dîtî ye  
Dexeşti nav xwuna Kurdan bê tifaqî serdî ye

Destê dujmin nav dilizî dujminatî nav wî ye  
Dibêjî Kurdo tu çakî filankes pêşîya te ye  
Wî helîne ji meydanê ev karê qenc ête ye  
Ew nizanî tevde xape poşmanî li dûv de ye

Lewra dewra wî dijinî dûrê koma milî ye  
Qet sûcê dîn têde nîne belkî tev sûcê wî ye  
Fikirandî min li ser gotinê dîn erqeli ye  
Bo rêya azadîya Kurdan û Kurdistanî ye

Edbaê Kurdistanê wekî Ehmed Xanî ye (?)  
Dîn û dewlet daxwaza wî herdû nav şe'ra wî ye  
Daxwaza Kurd û Kurdistan dîndar û azadî ye  
Ne dijê dîn Îslamê wek Serok Berzanî ye

Tasa Siltan wunda buye pirsîyarî pey wî ye  
Hişyaro rastî dibêjî çehvreşî behra wî ye

Fî tarîx 1326 \* miwafiq 1942

## TERÎQA NEXŞEBENDÎ

Şeraba Neqşebendan min vexwarî  
Diwê kasa dirola lew miararî (?)  
Ji esrarê di hewza neqşebendan  
Ji zû de ew ji bna min hinenarî (?)

Di sala nehsed û çilan ji zanê  
Li Til Nesrê bihara wê dîyarê  
Mi dî şewqek li memûra Cizîrê  
Biderket hatî xwarê ser zinarê

Ji nav qews wê anî şewqek vedabû  
Wekî rengê bijoktorê bi hewarî  
Seda jê çû wekî birq û birûskê  
Belav bû nav dil û canê hezarî

Giha kê wî ji bîr kir nalenale  
Kesek dilêş negote jêre jarî  
Ji qewl Ehmed wî dersek da min Ehmed  
Dibû istaz û şêxê qelbê tarî

Di çaxê ez eazar bûm serbiwar bûm  
Şeraba xweş xizna min vexwarî  
Xweda tewfiq bidî te got bo min  
Bi rengê pêşveçûn û qendharî

Kerem da min xwedanê Alî ïzet  
Giha me Ehmedê sirûr ji zarê  
Di her çaxê dîyar e bo te Hişyar  
Çikê tu ji rabita çehvên xemarî

Le ser çehv û dilê te kon vedaye  
Nema carek dikê zar û hewarê  
Dil û canê te sohtin wê birûskê  
Mehweka Neqşebendan lê bû carê

Li dawîkê vebû dergahê eşqê  
Semerqend û Bixara bû dîyarî  
Me peyman daye te ey şah û serdar  
Hesîba dergehim bûne wî warî

Bi hêvî me ji te ya Rebê Alem  
Bihêlî bo me vê terha wî darî  
Ji xeyda û ji seyida bidîyê nîsbet  
Di gel hîmet ji bona wî nikarî

Ji alayê Bixarî lê firêkê  
Li texta şahê xizane bikrê darê (?)  
Ezim Hişyar xizandarim ji bo we  
Ji şopa we nebim dûr û firarî

# ŞÊX EHMEDÊ XIZNAWÎ DILOVANÎYA XWEDA LÊ BE

Wêne

Di îlmê de Seydayê min bilind e  
Di Şer'ê de kesek wek wî nikarî  
Di teqwa de terîqa Neqşebendî  
Di silûka salihan t xiznedarî

Di rêza miletê Kurdî nedûrî  
Stem rakî li ser milet yekcarî  
Li Şamê çûme rex Mîrim Celadet  
Xoybûna ji bo Kurdan me danî(?)

Li wê min dît di lîsta navên Kurdan  
Miletperwer ji qencanî jimarî  
Di nav wan de me dîbû navê Ehmed  
Kurê Mele Muradê rehmedarî

Min go Mîrim kî ye Ehmed Miradî  
Di go Şêx Ehmed e bo alîkarî  
Min got hemd û sena ji bona Yezdan  
Şêxê min nav miletperwer serdarî

Misilmanim di dînê gulbiharê  
Di mezheb de Şaffî me ji seharê  
Derêka Neqşebendan min ïnanî  
Bi Şêx Ehmed El Xizne bû dîyarî

Hişyar mijde ji bona te dixwînim  
Serxwebûna Kurdan lêbûye carê

## **ŞÛX İBRAHÎM HEQÎ DILOVANÎYA XWEDÊ LÊ BE NAMÎYE JI BO ŞÊX EDNAN HEQÎ**

Wêne

Ez Hişyarim navê min jî Mistefa ew hatîye  
Lawê Mele Îsa Hecî Hesenkêf cîhê wî ye  
Zayina min ew di bîstê Kanûna Yekê deye  
Bîst û çar û nehsed û hezar jî hatî dû wî ye

Min li rex bavê xwe xwendî ta Sadulah Gewrî ye  
Di sî û heftan dilovanî ji Yezdan hatî ye  
Çuye rehmeta alemê gewre xesaret danî ye  
Gelê Kurdî li Cinesker tê de rehlet kirî ye

Çûm Cizîrê rex Seydayê Seydayê Seyid Elî min xwendî ye  
Sadulah rex wî temam kiribû di roja şemî ye  
Şêx Seydayê pir bihîmet pir bi hîkmet min dî ye  
Pê mubarek bûme çend car li Cizîra Bohtî ye

Hatim rex Şêx Ebdulrezaq (hel) li rex wî xwendî ye  
Ez fikriyam hatim Hilwa Şêx serdar dîtî ye  
Îbrahîm Heqî bo nîsbet wî ji Besrat hanî ye (?)  
Şêx Huseynê ewelî Mewlana Xalit dîtî ye

Bo Xelîfê wî Terîqa Neqşebendî anî ye  
Ruhnaya çehvê min bavê Şêx Mihemed Zekî ye  
Hîkmet û îlm û terîq ew keramet rex wî ye  
Çendî rojan ez li rex mam bereket min jê dîtî ye

Min dixwestî ez temam kim xwendina xwe rex wî ye  
Lê çûn û hatin gelek bû ji mîhvan û sofî ye  
Min nexwest zehmet bikêşim Şêxê min pê zanî ye  
Bi edeb çûme destê wî istiftah kir camî ye

Wî dia kiribû ji bo min tewfiqa rebanî ya  
Hemd ji Yezdanê mezin pir menfeet jê dîtî ye  
Xwedîyê xetwa salihan bo bi heqîqe min dî ye  
Ilm û hilm û hîkmet û muhewebkî rebanî ye

Dabû ser şopa Pêxember bi qeîdê sinî ye (?)  
Rêka Zatê Mewlana Xalit ê çû bû girtî ye  
Qedema Şahê Bixarî tê gihîştî zanî ye  
Bedil û can ruhnîya çehvan da ser şopa wî ye

Dîsa destê wî ramîsand min xatir jê xwestî ye  
Hatim rex Seydayê ilmê Mele Ehmed Muftî ye  
Kitêbê rêsê temam kir rex Seydayê Muftî ye  
Bîst û çar mehan li rex mam îcaze standî ye

Lê jibîr nakim ku min dî nameya Şêx şandî ye  
Bona Şêx Ednanê Heqî rohnîya çehvê wî ye  
Wî xelat kir Xirqîya Şêxîtî lê kirî ye  
Nisbet û hîmet ji Besrat rêkirî bona wî ye

Ez ji wê rojê dilê min pir ji wê hezkirî ye  
Bê xilaf sondê dixwînim pir ji ilmê zanî ye

M. M. E. HIŞYAR

## **QESÎDA ŞÊX MIHAMED ŞEFÎQ HEQÎ DILOVANÎYA XWEDA LÊ BÎ**

Ez dihatim destê vala her zimanî çû xiyab (?)  
Pir şebab û i`z û nazî ku bilaş derda ciwab  
Jîna xwe derda bi şaşî çûm û hatim ne sewab  
Nûr û aqil te nebê wê çi bikî ew laş û şebab

Me çi dergehê teleb kir ji xwe ra feyde nedît  
Her şerab dest minde bû min digot kanê şerab  
Zehmeta saffî ji bo min him gunehkarî li pey  
Lê belê xeyrê mi ra hingiv diçû safî şerab

Lewra dil kewara xirabî pir müsîbet mezinî  
Rê û rîbar ber min wunda bû min dîfî pir ezab  
Min nemaye dergehek ku berê xwe bidimê ye  
Xeyrê derîyek da bixwazim ser me rakit ev ezab

Bendeên kêmê milokan jê dixwazin sed kerem (?)  
Ger mi jî ji wê dergehê xwest keremek nîne etab  
Ez zeif bûme nikarim waciba îfa bikim  
Bê me derdê her ku borî min divêt hel sewab

Ya Rebê Efwê bide ezra xeşîma pir heye  
Layiqe tu wa efûkî nexê ber meqtû etab

## DIAË – LAVAKIRIN

Ez Hişyarim bi hêvî me  
Ji Yezdan efûkî bîne  
Gunehê min wekî hîm e  
Ser gewrîya min helîne

Bi fedla xwe ji te' lîme  
Dînê İslâmê bigihîne  
Dilê Hişyarî hezîne  
Tenwîr bit wek cam û cîm e

Ji zanîn û ji tehkîm e  
Dinê nava dal û sîne  
Min gazî kir ha û mîm e  
Zîyaret bim rex Medîne

Şefaet bendewarî me  
Ji Ehmed Roja Mêzînê  
Ji Yezdan ez bihêvî me  
Guneh li ser min helî ne

Nezer bêtî rengê sîm e  
Li ser dilde bi ayîn e  
Şefeq der bê ji Medî ne  
Wekî birqê bi mizgîn e

Dil paqijkî xwe derî ne  
Ji destê nefsa leîne  
Çendî taeta min nîne  
Misilmanim eqîdî me

Eger bêjin min ez kî me  
Hişyarê dîndar bilî me  
Ne Xerbî me ez Şerqî me  
Ne Efrîqî ne Samî me

Ez Arî me ne Hindî me  
Bi mezheb Sinî zanibî me  
Ez Çelengê Asyewî me  
Di Mezheb de Şafî me

Nav caziban ez Neqşî me  
Mirîde kim ne soffî me  
Miletperwerkî Kurdî me  
Ne wek hinka insirî me

Bi rengê cî yê welatî me  
Di eqda dîn min bibî ne  
Ji qencan re kemasî me  
Ji ehlê îlim û zanî ne

Di her çaxê destbestî me  
Ji şêxê îlim û him dîn e  
Ger cahilê nûn û mîm e  
Wê Hişyar jê çi bistî ne

## **MILEHEQ Û BI ZIMANÊ EREBÎ EW HINDEK KIRDÎ YE**

### **DILOVANÎYA XWEDÊ**

Xwuda dibêñ denga dikî Tiştê dilan de his dikî  
Tiştê ku çêbî ew dikî Di nav dilan de ew dikî  
Hêvî ji wî her kes dikî Kesê tengî serbar dikî  
Gilî û diliikan jî dikî Alîkarîyê ew dikî

Xizneyêñ rizqan ew pir dikî Bi gotina kun çê dikî  
Ya Reb ciwamerdî li me bikî Xêrat cem tune bi carekî  
Çara me nîne bi derbekî Îla ez lêxim carekî  
Li Dergeha te bi destkî Bi hêvî bi carekî

Ger vekirim bi derbekî Bi hêvî bim bi carekî  
Kî dergehê xwe ji mir vekî Feqîr û jar û dîle kî  
Çare nîne xeyrê yekî Dergehê rehma xwe vekê  
Bêçare me bi derbekî Tu bi xatirê eşrê xwe kî

Dergeha rehmê li me vekî Ev qeydên ser me tu vekî  
Ger fedla xwe ji me dûr bikî Li kê em bikin bange kî  
Haşa li mezinaya xwe kî Kesê gunehkarî bikî  
Ji dahna xwe bêbehr bikî Dan û kerem tu çê dikî

## **DIKTOR MIHEMED SEÎD REMEZAN BOTÎ BEDÎÊ ZEMAN XWE**

Xweda tu bi heqê Seîda bikî  
Gelê me ji bin destî azad bikî  
Seîdê ji Nûrsî ku derya mezin  
Cîhanê tijî kir zanîn gemîn (?)

Seîdê ji Palo Serokê Şehîd  
Ku milyonek û nîv digel bû şehîd  
Seîdê hezar bi Elçî medît  
Bi destê çepel bû şehîdê we dît

Seîdê ji Cilka bi nav Botîyan  
Ewe behra zanîn ji çol û çiyan  
Zimanê wî şûrê Selah Eyûbî  
Qelel Gurzê Ristem ku kar pê dibî

Seîdê ku bo te û bo hemî  
Şev û roj ku zanîn dibêjî demê  
Ne Botî û kî şaş dibêjin hemî  
Seîd bo te bo min bo wî ye wek gemî

Livîn û balîf û bi lêv kombikî (?)  
Dilê xwe bi rengê wekî ro bikî  
Ji Helbestêñ Mela Ebdulah Mela Reşîd

## PESNÊ SEÎAN

Şêx û melaya zanibûn îlm û îrfan wan anî bû  
Hikmet di îlm û zanibûn xeyala wan min anî ye  
Gel ihtîram û him edeb di Dîwana xwe danî ye  
Erdê tijî kirin ji nûr şewq û mihebet anî ye

Yekê wek Bedî Ulzeman ji îlmê tijî kirî ye  
Nava welatê Kurdistan di her welatî danîye  
Seîdê Botî Remezan alimê îlmê du ye  
Tertîb û taet û nîşan ji xwendinê vekirî ye

Şêx Seîdê Pîranî ew dîn û dewlet doz kirî ye  
Serdarên Şehîdên Kurdan him Îmamê rûhanî ye  
Alçî Seîd jibîr nabî xefika neyar pêteqî ye  
Pêşkêş û zana û xebatkar û şehîdê Kurdî ye

Ew dest bişkê çehv birjê çawa berek ser danî ye  
Karê Tirka bicî anî patxwurê Tûranî ye  
Hişyar divê dua ji wan çaxê nimêjan hafî ye  
Tebrîk ji Yezdanê mezin ji ehlê îlmê xwestî ye

## FÎ MINAQIB SEÎD EL NÛRSÎ BEDÎULZEMAN Wêne

Wergera wê

Nûrek ji banî hil bû ye ji alî şerqê rabî ye  
Danî li xerba Anadol fisq û ficûr lê tijî ye  
Ew nûr ji îlmê Nûrsî ye fecra kemal hatî ye  
Tevde ji îlim û me'rîfet hatî ji nis û nebî ye

Dilê paqij dagirtî ye ji salih û ji amî ye  
Kesê emel pê kirî ye Xweda hîdaye kirî ye  
Emelê wî bilind bû ye Îslam bi wî bilind bû ye  
Îmana wî kamil bû ye Yezdan ji wî razî bû ye

Ji bîhna îlmê Nûrsî ye dinya temam tijî bû ye  
Sed hezar tilabê wî ye dilê wana dagirtî ye  
Ji enwara îlmê Nûrsî li her derî belav bû ye  
Ji nisa Quran hatî ye Îslam rohnîdar bo wî ye

Ya Reb em dîkin hêvî yeji wî zatê teyî alî ye  
Bidî me rehim û qencî ye bidî Kurdan azadî ye  
Bi qedrê Resûlê wî ye bi qedrê îlmê Nûrsî ye  
Welatê Kurdistanê ye azad bikî ji zindî ye

Welatê Kurdistanê ye azad bikî ji cindî ye  
Hişyar we miletê Kurdî ser wan rakî bindestî ye

## DÎROKA JÎYANA BEDÎULZEMAN DI DESTPÊKÊ DE BI ZARÊ KURDÎ

Seîdê Nûrsî ew karibû Ji bona xwendinê rabû  
Têkilî xwendevanan bû Korfehmî ew lê peyda bû  
Çendî salan lê derbas bû Diponijî heyran dibû  
Di cîhanê nazan dibû Zanîn li wî peydan bû

Bi pirbûnî heyran dibû Zanîn jê re bi çare bû  
Baş fikirî xwulmaş dibû Enwarek lê peyda dibû  
Got ey Seîd tu rabe zû Xanî bo te dildar dibû  
Ji wê xewê şiyar dibû Bo qesta Xanî kar dibû

Merqed jê re dildar di bû Çil rojan ser derbas dibû  
Can û dil tev teslîm dikir Dana Xweda lê kar dibû  
Ji ber bereketa Xanî Îlim û merîfet lê dibû  
Dibû Seîdê Nûrsî ew Di îlmê de serdar dibû

Seîd digotî ya Xweda Hêvîdarê dana te me  
Ya ey Xwedayê Heq tu yî Dara mihebet telebê me  
Sûcê min gelek giran e Ji bonî efwê bend me  
Rehmeta te ez dixwazim Lew ger ez layiq nîne me

Îlim û merîfet jê dûrim Ez bendeê dana te me  
Ruhê Mamostayê Xanî Dibî duayê karê te me  
Ger bo min qebûl çênebî Dîsa diayê karê te me  
Wer jê bixwazin bihevre Fedil û kerem tev li cem e

Seîdê Nûrsî dibê jî Ya Reb ber rehma te me  
Bidî xatirê Pêxember Ewe Resûlê Ekrem  
Ew Xanîyê qtbê zeman Ser Merqeda wî besteme  
Ber zarê te li Merqedê Ez bendeê fedla te me

Fedla xwe tu li me bikî Ez bendeê îhsana te me  
Bidî me îlim û merîfet Gelek jê re ez hewce me  
Fedil îhsana te gelek Ey ku tu bidîyî bê xem e  
Tu bi xatirê Mihemed kî Ewê Resûlê Ekrem e

Digel Hişyarê pir hezîn Rehmê firêkî tu li me  
Hişyar gunehkarê mezin Dibê ya Reb ez hewce me  
Fedil kerem her cem te ye Rehmê bidî ez hewce me  
Xweda kerîm kir li Seîd Behirul Îlûm binavdeme

## PENDÊN MEZINAN

Mirovek zana hebû, dîndar bû, milet perwer bû. Herdem xwendin jê re hedef bû. Di jîna xwe de belengazî nedît, lê malê wî bi pirîti jî nebû. Lawek wî hebû. Lawek wî hebû, wî şand dibistana mezin, diplom stend û kete ser karê xwe. Lê mixabin serê xwe li wî bavê ku sêfilî û rebenî dît ji bona wî mezin kirgotinê sar û nepak û bê edebî di xiyaba wî de di nav civatan derheqê bavê xwede digot. Dewsa qenciyê xirabî dikir. Bav çend bîtin bi zarê Erebî jêre got: Belê ez Hişyarim min jê wergerandin kir bi zarê Kurdî.

## NÊÇÎ BAV LI SER LAW

Erê lawo delalê min Bi zarokî te go çi kir  
Min kuro hevalê min Desîpatî te xwedî kir (?)  
Di herem de tu bi hêvî bû Bi herkes re te aştî kir  
Şevek êşek li te çêbe Bi wê êşê te zarî kir

Ji ber zarî ya wê êşê Te pir hewar û gazî kir  
Xewa çehvan ji min dûr bû Ji bo te min hişyarî kir  
Bi kinc û xwarin û irav Te da xwendin te şadî kir  
Dibistana mezin de min Te da xwendin te şadî kir

Gava tu ket darê zilam Diplom li te xwiayî kir  
Darê xwendevanê mezin Ji bona te dîyarê kir  
Min goh da te qet nerazam Di heşê xwe ponijî kir  
Dawî min dî derheqê min Cengek vebû te xwarî kir

Heçî tiştê pîs û xirab Hindama min diyarî kir  
Bi rûtîrşî gotinê sar Ji bona min te carî kir  
Ji goh te her divê rê de Te hîl û pîl û fen çêkir  
Xweziya kesê li te nayê Lewra te bê edebî kir

Ger qenciyê dîyar nakî Weke cîrankî qencî kir  
Xirabî jî tu bavêje Kes nabêjî kemasî kir  
Belê çare li te nabî Stemkarî li min çêkir  
Heqê bavê tu nas nakî Hinama min kemasî kir

Guhdarî û sebrê bike Lewra te pir xirabî kir  
Xweda heye pir adil e Gelek wek te wan safî kir  
Ji vê gavê heta paşê Heqê bi heq xweda çêkir  
Stem nahêlî ew carek Ji bo qencan xwiayî kir

Dibistana mezin gava Ji xwendinê temamî kir  
Te girt diplom bi destê xwe Ji her kes re xwiayî kir  
Xweda qencî li te danî Ji wî ra jî kemasî kir  
Jê re limêj û rojîyan Nekir te dujminayî kir

Heger îmanparêz bî lê Bi zarê xwe te teresî kir  
Heger bêjî xweda nîne Te vir kir pir nerastî kir  
Tu nanêrî li vê kunê Bi ristek ew Xweda çêkir (?)  
Vê erşa ezman û roj Û heyv û exteran çêkir (stêr)

Bi ger û dem û dewranan Wekê hev bûn di ristê kir  
Me kir gerdûn bi şaşî Zerîyek çêbit neman çêkir (?)  
Cizîrî berî çarsed sal Di Dîwana xwe de çêkir  
Dibêjî Elah Elah çerxû Dewrana Xweda çêkir

Xelet naçê bi yek nuqte Di dewranê emir lêkir  
Ji behir û ber çiya ser Li ser valabûnê lêkir  
Dibêjin cazibêt girtî ye Nabêñ kî wê çêkir (?)  
Divê valabûnê maye Xweda fermanê li serê kir

Heger tu bi aqil û îman Li van pirsan guhdarî kir  
Dibî însanekî zana Jîr û him serdarî kir  
Belê bawer bikî carek Weke min got nebî têkil  
Lê dîlkul bî di her dem de Serê xwe xwelîyê lê kir  
Feyde nakî li wî carek Xwedan dilê wî tarê kir

### **GOTINA EBDULHADÎ DÊRIKÎ QEZAYA DİYARBEKIR**

Xwendevanê lawê kafir Bo min îmamê nadir e  
Nav koma şêx û caziban Şêxê min Ebdulqadir e

Wergerandina gotina Mihemed Îqbal bi zarê Kurdî:

Ew Xwedayê me dolovan Ma ne şandî bona însan  
Pêxemberê axirê zeman Li gorî Ayetê Quran  
Ferman dikir bi dil û can Li gorê Ayetên Rehman  
Ji bo menfieta însan Bigihêñî hev bi dil û can  
Hekîm û zane û rêzan Rehet dikir dilê ciwan

Ji bo miletê Misilman Biratî jê re kir nîşan  
Meshef û Qîblet Îman Ji re hedef bin ew însan  
Destê hev bigirin wek biran Li gor emrê mehrîban  
Ew Xwedayê pir dilovan Ilheq yeke her zeman

Ewe Xwedayê ìns û cîn Ewe Rehîm ewe Rehman  
Miletê Îslam êy nezan Biratîya hev berdidan  
Heskirin jî ba wan neman Wekî ewamirê Firqan  
Bin tarîyê man bê guman Êvar li wan hat negihan

Mane li bin mij û dûman Dev hev dikin wekî heywan  
Xwendekarîya her Misilman Çû ji destâ mîr û siltan  
Ji ber heqê ìnsan nedan Stemkarî dikin li wan  
Ta jan û kuştin tê ji wan Ser serê jarân bê guman

Stem we tadan her zeman Li ser miletê Misilman  
Pêxwas û Tirk û him Îran Peyva Nebî çû bîra wan  
Spî û reşî misilman Wekî hevin li rex Xwean  
Kesê rastî bikî ji wan Wekî hevbûn derheqê wan

Tî milê wî bibî sultan Wê pêkbînê emrê Xwedan (?)  
Hişyarî bê zar û zeman Mêze bike li halê wan

## GOTINEK DÎ

Siltan û milûkê Ereb  
Bêbext û bêdîn bêkezeb  
Wek wa ye Îran û Celeb  
Tirkê bê şerm û bê edeb

Evan kulan evan derdan  
Bo çi didêrî bê sebeb  
Wan dîn berdan girtin neseb  
Misilman ber wan bûne hedeb

Kurdê Misilman jarî man  
Bindestê ajanê guran  
Carek pirsê nakin li wan  
Nabêن birane ev ecêb

Hişyarê ber derbê guran  
Bese bidêre ser xwe jan  
Çendî hewar û qêr didan  
Temamê jar û misilman

Bêbextî bê dîn û îman  
Guhdarî nakin qet li wan

## HÊVÎ

Xweda hêvîya me ji te tu qebûl bike û li kêmasîya me  
bubuhure.

(Ez gelek sipas dikim bo kesê kêmasîyê di Dîwana min de  
bibîne û ji min re bişeyine.) Û silavê Xweda bi xweşî li we  
bibare.

Temam bû di roja Pêncşema di meha Şeban de,

Di Hicrî 11-10-1423

Di Zayinî de di Çirîya pêşî 17-10-2002

Ger te perwazê ji bo quesra yara min têde ye  
Ew wekî erşê Silêman dir û gewher navde ye  
Têde noşîdarên perîyan hewr û eynêbexçe ye  
Rengê wana wek gula yebihna mîskê têde ye

سپی ورشی مسلمان وکی هقن لرخ خدان  
کسی راستی بکی ژوان وکی هقبون در حقی وان  
تمله وئی بئ سلطان وئی پیئک بینی امری خدان  
هشیاری بی زار وزمان میزه بکه لحالی وان

\*\*\*

ژو منفعتا انسان بگهینى هف بدل وجان  
حکيم وزاناي وريزان راحت دكر دلى جوان  
ژو ملتى مسلمان برatisى ژيره كر نيشان  
صحف وقبلت وايمان ژيره هدف بن او انسان  
دستى هف بگرن وک بران له گوري امرى مهریان  
او خدايني انس وجان اوه رحيم اوه رحمان  
ملتى اسلام ئى نزان براتيه هف بىر ددان  
حزكرن ژى باوان نمان وکى اوامرى فرقان  
بن تارىي مان بى گمان ايشار لوان هات نه گهان  
مانه لبى مژ ودومان دف هف دكن وکى حيوان  
خوند كاريا هر مسلمان چو ژدستى مير وسلطان  
ژبر حقى انسان نه دان ستم كاري دكن لوان  
تا ژنان وگوشتن تى ژوان سرسى ژاران بى گمان  
ستم وتعدان هر زمان لسر ملتى مسلمان  
پى خواس وترك هم ايران پيچا نبى چو بيرا وان

## الختام

أختتم الديوان بترجمة بعض من الأبيات العربية للفيلسوف الكبير والعالم الجليل الشاعر "محمد إقبال" الباكستاني رحمه الله تعالى. حينما نظر "محمد إقبال" إلى حال المسلمين لم يعجبه حالمهم لقد وجدتهم متفرقين بعد وحدة وضعفاء بعد قوة أذلاء في ديارهم بعد عزة ومنعة فصالح فيهم لينهضوا وليتسلموا الراية الهدایة للعالم أجمع قائلاً:

ألم يبعث لأمتكم نبی یوحدکم على نھج الوئام  
ومصحفکم وقبلتکم جمیعا منار للاخوة والسلام  
وفوق الكل رحمان رحیم إله واحد رب الأئم  
فما لنهار ألفتکم تولی وأمسیتم حیاری في الظلام

ورگراندنا کوتنا محمد إقبال بزاری کردی:

او خدایی میی دلوقان مانه شاندی بونا إنسان  
پیغمبری آخری زمان لگوری آیاتی قرآن  
فرمان دکر بدل وجان لگوری آیاتی رحمان

وبشير ورسول وحبيب الله صاب  
لولاك عفوك إلهي حالنا حال خراب

ليت أمري لم تلدني ليتنى كنت تراب  
فأنوح من ذنوبي كالحمام والغراب

كيف أعمل في القيامة عند حشرى للحساب  
ثقل ظهري من ذنوبي كيف أن أعطى الجواب

من ذنوبي وجهي اسود ليس لي شيء صواب  
هل جوابي في الحساب استحق للعذاب

أو ألاقي من حبيب الله يشفع في الرقاب  
أملني فيه قوي يحفظني من عذاب

إني هشيار ذليل مخ عقلي في ذاب  
كيف أعمل فاقد الأفكار لم آتي الصواب

## الشيب والهرم

حياتي تمر نحو الشيب والهرم ثمانين حولا قد مضت في الجرم  
فحطت من جسمي قوة العزم لم أر بزوج ارتاحالي في القتال من العزم  
ثمانين عاما لبسني قميصها فلم أشعر فيها سوى الدهر والندم  
كفاك عجوزا عاجزا من الدهر تضييف غدا قبرا بقافلة العدم

## تضرع وابتهاج

ابتليت من ذنبي كيف احظى بالثواب  
إني عبد مذنب كيف غدا أعطى الجواب

حسن ظني فيك ربي قلت في قول الكتاب

للك بشرى يا حبيب الله في زين الخطاب

امة مذنبة رب غفور مستحاجب

لا يخيب وعدك ربي في يوم الكتاب

وعدك أمة أحمد تعفو عنها في الحساب

بشفاعة النذير فينا في يوم المآب

## سكرة القلب

أشترى الأحلام في سوق المني وأبیع العمر في سوق الهموم  
لو فرضنا أنا والقلب سكارى فاندفعنا بالأمانى نتبارى  
انطربنا إنا والقلب عشيه نملك الآمال والنجواي طيا  
قال لي القلب أحقا ما بلغنا كيفنا ما القدر زاهر عننا  
أتراهن خدعة مما ظننبا قلت من منزل الحب قو وصلنا  
قد أراح القلب من غيظه كان حينما هشيار بالهموم بان  
**الإصابة بالحب**

إذا صاب حب بالمحب ويلمع بأحشائه يشكو به يتضرع  
يخمن أن الضر فيه فيجمع بلاء بجسمه هو كيف يصنع  
يداري هوى الحب ويكتم سره يسلم للقلب الأمور ويخضع  
إذا لبت النار الفؤاد ما يدع فلم يبق صبر للفتى وهو يركع  
سلوان الفتى أمر الحبيب ليرجع يداري به الصبر وشكوته ترفع  
لباب الحبيب للحواب ليسمع قرارها أن يصدر ما يتمتع  
بخير أو إدراك الهدف يتبرع حبيته الروح وهشيار يتبع  
يضع للحبيب روحه ثم يردع بواسل منها الحسب أن تتشفع

## يقول بعض الشعراء

لقد زادني حباً ببني لاني بغيض إلى كل امرء متطاول  
وإني شقي بالشام ولن ترى شقيراً بجم إلا كريم الشمائل  
ورگراندن بزمانی کردي:

گلک بلند دبینم جانی خوه دوراً گردون  
نخوشی خوه دناسم دخسو زمان دریث بون  
ژ مر دالات پر رحتم کسی ژوانه رحته  
بنی شک قنجن دزانم جامیرو هم بلندبون

## مثلك

مات في الحرارة كلب قد خلصنا من أذاه

خلف الملعون حروا وهو أكلب من أباء

ورگراندن بزمانی کردي:

د تاریده دمر کوچك چقلس هاريو سکي به دوچك  
ژ خلاص بون امو کنك ژ تعداوي قيز ولاوك  
پشتى او مر ژى ما جورك گلک پیستريو ژ باشك  
ملعونو هاريو باف شوتك درنكى روقيي روچك

## پندیں مزنان

مرؤفک زانا هبو دینداریو ملت پروریو هر دم خوندن ژیره هدف بو د ژینا خو ده  
بلنگاڑی ندیت لئی مالی وی بپرتی ژی نبو لاوکی وی هبو وی شاند د بستانا  
مزن دیپلومه ستاند کته لسر کاری خوه لئی مخابن سری خوه لوی باقئی خوه  
سفلی ورینی دیت ژیونا وی مزنکر گوتمنی سار ونه پاک وین ادبی د غیابا ویده  
د ناف جفاتان درحقی باقئی خوه دگوت دوسا قنجیین خرابی دکر باش چند بیتین  
بزاری عربی ژیره گوت بلقی از هشیارم من ژی ورگراندن کر بزاری کردی

غدوتك مولودا وعلتك يافعا تعل بـما أدـن إـلـيـك وـتـهـلـ  
إـذـا لـيـلـةـ نـاـبـتـكـ بـالـسـقـمـ لـمـ أـبـتـ لـشـكـواـكـ إـلـاـ سـاـهـراـ أـتـلـمـلـ  
كـأـنـيـ أـنـاـ المـطـرـوقـ دـوـنـكـ بـالـذـيـ طـرـقـتـ بـهـ دـوـنـيـ فـعـيـنـيـ تـحـمـلـ  
فـلـمـاـ بـلـغـتـ السـنـ وـالـغـاـيـةـ التـيـ إـلـيـهـ مـدـىـ مـاـ كـنـتـ فـيـكـ أـوـمـلـ  
جـعـلـتـ جـزـائـيـ مـنـكـ جـبـهاـ وـغـلـظـةـ كـأـنـكـ أـنـتـ المـنـعـمـ المـتـضـلـ  
فـلـيـتـكـ إـذـ لـمـ تـرـعـ حـقـ أـبـوـتـيـ فـعـلـتـ كـمـاـ الـحـارـ الـجاـوـرـ يـفـعـلـ  
وـلـكـ مـهـلاـ سـوـفـ تـلـقـيـ بـماـ جـنـتـ يـدـاـكـ مـنـ الـحـدـ جـزـاءـ وـتـرـحـلـ  
تـنـالـ جـزاـكـ عـاجـلاـ ثـمـ آـجـلاـ لـيـثـبـتـ أـنـ الـحـقـ حـقـ لـاـ يـبـطـلـ

يَحْدِدُ إِلَهٌ بِالْفَجُورِ وَبِالْفَسْقِ  
بِلَا خَوْفٍ مِنْهُ يَوْمُ الْحُشْرِ وَالْكَرْبِ  
لَا حَوْلٌ لِلْمُظْلُومِ فِي أَيْدِيِ الْأَجْرِيَةِ  
وَأَعْوَانُ الظُّلَامِ لَمْ يَجُرِمْ مِنَ الذَّنْبِ  
فَهُشَيْارٌ افْقَهَ لَا تَمِيلُ إِلَى الذَّنْبِ  
فَسَالِمٌ مَعَ الْخَلْقِ فَتَسْلِمُ مِنَ الْكَرْبِ  
فَلَوْ كَانَ خَصْمُكَ طَاغِيًّا مَتَطَاوِلًا  
فَشَدَّدَ لَهُ عَزْمًا وَصَبَرًا عَلَى الضَّرِبِ  
كَلْمَةً لِكُرْدِسْتَانِ

فَوَاللَّهِ كُرْدِسْتَانِ لَا بِدِقِيقَةٍ خَلُوتُكَ مِنْ بَالِيٍّ وَلَا كُنْتَ رَاضِيٍّ  
فَعَزَّلَكَ مِنِي لَوْ فَدَيْتُ بِرَقْبِتِي بَلَاءَ حَسْنِ لَوْ عَمَّ فِي مَعَادِي  
خِيَالَكَ فِي بَالِيٍّ فِي نُومِيٍّ وَيَقْظَتِي كَطِيرَ الْحَمَامِ أَحْمُو حَبَا مَدَاوِي  
أَدَاوِيٍّ بِهِ قَلِيبِي وَجَسْمِي وَجَرْحِتِي وَصَبِيرِي وَسَلَوانِي أَحْقَقَ مَا بِي  
سَهْرَتُ الْلَّيَالِ وَالْخَيَالَ بِفَكْرِتِي يَدُورُ فِي ذَهْنِي وَيَجُولُ فِي عَقْلِي  
فِيَا أَسْفَا هَشَيْارٌ أَنْتَ مَقْصُرٌ فَمَا قَمْتَ مِنْ نَفْعٍ يَرُوقُ بِمَا بِي

## مِيَادِينُ الْحَيَاةِ

إِنْ مِيَادِينُ الْحَيَاةِ تُرْقَبُ      بَيْنَ الشَّرِيفِ وَالذَّلِيلِ الْأَكْحَلِ  
فَإِنْ أَكْحَلْتَ عَيْوَنَكَ بَعْزَةً      أَمْلَكْتَ مِنْ شَرْفِ الْعَلَا بِالْأَعْدَلِ  
إِنَّ الْمَنِيَّةَ فِي جَنَاحِ الْعَزَّةِ      حِينَ تَبَادَلَهَا بِالْعَزَّ الْأَكْمَلِ  
بِذَلِكَ تُحَرِّزُ مَقَامًا عَالِيًّا      يَشَهِّدُ لَكَ التَّارِيخُ حَتَّى الْأَزْلِ  
بِالْفَضْلِ وَالْإِحْسَانِ وَالْكَرَامَةِ      تَذَكَّرُ بُخْيَرٌ فِي طَيَّاتِ الْأَرْجُلِ  
قَدْ تَشْتَرِي شَرْفَ الْعَلَا بِهَنْيَةِ      لَنْ تَرْضَى بِالذَّلِيلِ مَقَامَ الْأَمْثَلِ  
مَا ذَنَبَيْ وَقَدْ خَلَقْتَ كَرْدِيَا

فَإِنْ كَانَ ذَنَبِي قدْ خَلَقْتَ مِنَ الْكَرْدِ  
فَلَا ذَنْبَ لِي قَوْمُوا الدَّعَاوَى عَلَى الرَّبِّ  
رَغْمَ نَصِّ فِي الْقُرْآنِ عَنْ طِينَةِ الْخَلْقِ  
سَوَاسِي فِي الْقَوْمِ وَاللَّوْنِ عِنْدَ الرَّبِّ  
فَأَكْرَمَهُمْ أَنْقَاهُمْ وَحَسَبَ الشَّرْعِ  
يَخَافُ مِنَ اللَّهِ بِالْقَوْلِ وَبِالْقَلْبِ

يَعَاقِبُ مِنْ خَالِفِ اللَّهِ بِالشَّرْعِ  
مِنْ ظُلْمٍ وَطَغْيَانٍ وَالْتَّعْذِيبِ وَالْضَّرْبِ

مغروزة بالطين والسبائك     بين يد الأعداء رهن واجب  
قلت على احيائنا الرحائب     ترى الرجال العلي ذو انسائب  
نكس الرؤوس مشرد الجبائب     كأس المنية احلى منه واعجب  
هشيار يوم عزائك ما اصعب     ما حل ظلما في الاسلام مصائب  
**مرض الدكتور قاسم جميل پاشا**

كان لي صديق يسمى الدكتور قاسم وقد أصيب بمرض ثقيل وإذا بأحد  
أصدقائه المحبين جائه يشتكيه من مرض به قائلاً له: ما تشير علي من دواء  
وعلاج وهو بذلك المرض الشديد ... وقد أنشدت هذه الأيات جواباً  
عن الدكتور:

حكيم لقد اعجى العلاج لنفسه     من سقم وأمراض شديد بجسمه  
فكيف يعالج المريض من سقمه     عليل بنفس الوقت مثل عليه  
فكيف ينحف علة من عليه     مريض هو يشكو دواماً من دائنه  
فرحل مشواه الأخير بحمله     لأعماله يرجو بالغفو من ربه  
فيشهد كان مؤمناً وبقلبه     يوحد رب الكائنات بعلمه  
وكان يساعد الفقير لفقره     يوفر عليه بال حاجات من نقصه  
فيري الإله يفعو عنه بعفوه     فيرجي الإله يغفو عنه بعفوه

## الوصية بالصبر

يا أهلي وخلاني نصائحي بالصبر  
لقيت جفى الهوى والود من البدر  
فنلت العذاب والكآبة بالغدر  
من حبي لسلوى كان من مطلع الفجر  
وكادت أنفاسي تنزع وانقض أمرى  
بالوديان أحجار اليمامة والقفر  
أموت جريح القلب مندمل الصدر  
فيما ليت من زار ضريحي بالقبر  
خليلاً هشيار رفيقاً مع العمر  
يصدق على الفاحشات على القبر  
**حليجه**

عند ما حصل في حليجه ما حصل... كلنا حلّت بنا الويّلات فقمت بنظم هذه الأبيات من حرق قلبي وأرسلتها إلى جريدة "خيّبات".

صبت على مناخنا مصائب ضاقت وقد تراكمت السحائب  
قد ادعتمي الكون بالذبح فخائب من يقصد الفرار والموكب

هذا النظام في جميع وقته دون خلل ولا ملل في سيره  
عجزت عقول الناس من إحصائه من مستحيل أن يحصى بعده  
غير الإله الواحد في صنعه الكل خاضعة لأمر ذاته  
نعت الحبيب وبه ووصفتة سبحان من أهدى له من هديه  
من الجمال سطع من فجره على الجميل صور بأمره  
هشيار يحمد ربه بعقله من عليه بصيرة من فضله  
ثبت بعلقي يا الهي وبه افكر في خلق السماء وارضه  
لم يخلق هذا باطلأ من شأنه فرض العبادة والخضوع لعبد  
**خدمة الناس والرحمة بهم**

خدمت الناس طرأً بالرؤاد فلم أسأل مكاناً في البلاد  
وحسنة لله بما أراد وطبع الرحمة رب العباد  
فلم أفرط من عزمي العداد عسى عزمي يسير لي الجهاد  
ولم أخر إنساناً ولا حداد إليه من سؤال بما أراد  
فأنجزه الحاجة بلا هواه فاسلب طمع نفسي والحساده  
لقد أرجو رحمة مستماده من الله الغفور ولا اعتقاد  
على أحد سوى الله مهداده رحمته لهشيار مداد


والوحى كتاباً أو صحفاً عقidi فلله أملأك السموات العالىه  
ملائكة في طاعة الله قائمه بأمر الذى لا يخفى عليه من خافيه  
كذلك جنات النعيم وجودها حقيق مع نار الجحيم تلاقيه  
للكفار والعصيان يوم القيمة يحاسب فيهم ما أتوا بالمعاصية  
لا يغنى عن المرء من غير العقيدة بالإيمان والتوحيد لله العالىه  
فتجتمع الخلق ساحات القيمة يحاسب ما أتوا ثواباً ومعصية  
أخوا المسلم العاصي لك من بشاره فيشفع فيما المصطفى متالي  
**سبحان مبدع الكون**

سبحان الله أبدع في كونه كسدرة المتهى تحت عرشه  
تشني الملائكة في حول عرشه وتحمد الله القدير بفطره  
علو السماء وعرضه وفطره من الإله الواحد في صنعه  
وجود الكون بالنهار وليله والشمس والنجم مع هلاله  
رحب الفضاء تدور الأرض بوعده فلك يدور فيه من قدرته  
هو خالق الأرض والبحر وقعره فيه مخلوق باختلاف جنسه  
علم الفلك صنع العباقة به لم يوصلوا من وضعه من خلقه

## أحبك حبا

أحبك حباً لو تحبني مثله لكان المقام بالوداد مساوياً  
سلكت طريق النار في الحب دائمًا شعرت به ذوقاً له صرت وافياً  
طلبت القاء الحبيب بلذة فهرولت قصدي للوصول مساعياً  
قسمت بحق الحب لم أرض غيره ولا بدلاً لو جزري وصالتي  
فداومت عمراً من صبائي في حبه وفي الحين لم ينقص فيه من صبائي  
قصدت مكاناً كان به حبيبي بعيد المسافة خاب ظني بما بي  
فخاطبني عقلني بأنبذ لهجة كفاك بهذا الحال وغير مرضي  
 فأصبحت مهزولاً في عين الجماعة علا صيك بين الأنام تفاهيا  
فجاويه لوم الأنام بكرهه فليس لي هم إذا هو راضي  
فلو كانت الدنيا جميعاً خصيمتي لا بأس ولا هم على بما بي  
فإنني معروف بهشيار كنيتي أفكر تقاليب الزمان بعقلني  
كذاك بأفلاك السموات والأرض وفيها من أعجائب العصائب خلقي  
فيثبت لا بد للكون من خالق هو الله وحده قدир بفطرها  
أوحد رب العرش فهي عقidi إيماني برسل الله والخشر كافيه

[www.netewe.com](http://www.netewe.com)



## WELATÊ MIN

Welat ê min çiqas rind û başî  
Wekî zêrî şûrî qelemtiraşî  
Cîhê te pir bilind e goh û kaşî  
Hemî deyşt û çiyayî tu qelaşî

Li kohêne te dijî ava heyatî  
Bi serbestî durustî ne bişaşî  
Di nav baxan bi xem xem ew diçî ş tê  
Gelo Hişyar vexwarî jê bi şasî



ISBN 605892173-3



9 786058 921733